



Weşana
ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ

Kovara Dumehane
Sal: 7 Hejmar - 37
Avrêl - Gulan 2011

Xwedî û Berpirsiyariya Nivîsaran
Mehmet Aydın ALÖKMEN

Edîtorya û Redaksiyon
Elixan LORAN

Mizanpaj û Berg:
Enstîtuya Kurdî ya Amedê

Wêneyê Bergê
Evdilxefûr HİSÊN

Şêwirmendê Hiqûqê
M. Nuri DENİZ

Çapxane: Berdan Matbaası:
Davutpaşa Cd. Güven Sanayi Sitesi
C Blok No: 239 **Topkapı/İSTANBUL**
Tlf: 0 212 613 12 11

Navnîşan
Kalem Sk. No: 32/4 Huzurevleri
Kayapınar/DİYARBAKIR

Tel & Faks: +90 412 237 43 16

E-Mail
kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com

WEB: www.kovaraw.com

ISSN: 1309-1476

Şertên Abonetiyê
Nava Welat, salek: 30 TL
Welatên Dereke, salek: 70 EURO

Nimroya Hesabê IBAN'ê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakır

TL: TR190006400000183002114889

EURO: TR420006400000283000737070

USD: TR520006400000283000737084

Nimroya Hesabê PTT'ê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
590 24 36

- Ji edîtor / 2
- Tu kî yî- **Feratê DENGİZÎ** / 3
- Ez kuncî, tu kuncî - **Xelat EHMED** / 6
- Jêbira şevê - **Mûrat OZYAŞAR** / 9
- Merdêne- **Lorîn DEMÎREL** / 11
- Bandora perwerdehiya dagirkeran - **Medenî FERHO** / 12
- Mizgînxêrk'ek'- **Xecê OMERÎ** / 17
- Şev e - **Dilşêr BÊWAR** / 17
- Paul Eluard -**Amadekar: Remezan OLÇEN** / 18
- Biyanî - **Charles BUKOWSKI** / 19
- Neynikek xeyal - **Welat DILKEN** / 19
- Emrê qeşmer- **Înan EROGLÛ** / 20
- Şopa çûyînê - **Hecî NEHSAN** / 22
- Deq - **Îlhan Samî ÇOMAK** / 23
- Toq - **Mûrat GAZİOĞLÛ** / 27
- Gundê şîrîn- **Muhamed HÎCAZÎ** / 26
- ...yan ji... - **Mihemed AFŞAR** / 29
- Ax ax - **Îlhamî OZER** / 29
- Paul Celan - **Amadekar: Tengezarê MARÎNÎ** / 30
- Dilên gemarî - **Pîroz XAN** / 29
- Dosye - **Li ba jinan wêjeya kurdî** / 34
- Ji bo hemû jinên lêgerên edalet, rastî û hezkirinê - **E. OÇALAN** / 35
- Hevnişîn bi Mizgîn Ronakê re- **Elixan LORAN** / 35
- Ji bo serbestiyê biqîre - **Asya GENİM** / 43
- Wêje û jin - **Nesrîn NAVDAR** / 48
- Jin û wêjeya kurd - **Zeynep YAŞ** / 50
- Helbest zimanê dil û derbirîna giyana xwezayê ye - **Fatma SAVCI** / 52
- Rewşa wêjeya heyî û hebûna jinan - **Dilan AYDIN** / 54
- Wêje û jin - **Mizgîn RONAK** / 55
- Hestên jinê yên veşartî - **Reyhan SARHAN** / 57
- Hevpeyvîn bi Gulgeş Deryaspî re - **Hevpeyvîn: R. SARHAN** / 58
- Jin di helbestên Cegerxwîn de - **Mehmûd BADILÎ** / 60
- Yekemîn helbest & yekemîn helbestvan - **Îkram BALEKANÎ** / 64
- Ji Semsûrê hinek gotinên pêşîyan - **Zekî AKDAG** / 66
- Ez ê rûyê te li dilê xwe bideqînim - **Xezal Meral DÊRIKÎ** / 67
- Pirtûkxaneya gund - **ar-da JANXWAR** / 68
- Pêgirî li cem Hacı Qadirê Koyî - **Nîmetulah Hamid NIHÊLÎ** / 71
- Refek çûk - **Robîn ŞERNA** / 73
- Ser-best - **Berçema M.** / 74
- Ey dilber - **Bahadîn ROBAR** / 74
- Çav - **Şengul OGUR** / 75
- Kurtetek ji jiyan û wesiyetnameya Gîw Mukiryanî - **Amadekar: Dêrsim OREMAR** / 76
- Koroya gundtewî, fitwa wê tune - **Rêdûr DÎJLE** / 77
- Xaçpîrsa Mihemed Şêxo - **Lokman AYEBE** / 80

*Nivîsên ku ji bo weşanê ji kovarê re tên şandin, li xwediyên wan nayên vegerandin.
Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji editor

T.S Eliotê ku di wêjeya cîhanê de bi taybetî jî di xeta helbestê de tovrêşê pêla îmajîzmê ye ji bo helbestê dibêje ku “Heke helbestek cara pêşîn were xwendin û bê fêmkirin, ew ne helbest e.” Ev angaşt çi qasî qure, borbore, çors û bi fors bixuye jî divê mirov guhê xwe jê re bel bike. Ji ber ku peyv û helbesta ku em bi serê wan sondan dixwin di vê cîhana kapîtalîst, dagirker, ruhmiy de heta îro kulîlk dabû lê ji îro pê ve divê em ji peyv û helbestê beran bipên. Bo nimûne heta salên 1990’î jî ji bo me kurdan “gund” tenê gund bûn. Lê piştî kavilkirin, wêrankirin, şêlandin, şewitandin û lewitandina gundan êdî em nikarin “gund”an tenê wekî “gund”an bi bîr bînin. Heke bê bibîranîn jî ew ê nehvirandineke nostaljik be. Di vê rewşa me ya kurdan de her çi qas em ê mîna Eliot ji bo vegotina “evînê” hêmaya çirayê bi kar neyînin jî, divê em gundan wekî “malzarokê” bibînin, divê em cerdevan û dagirkerên ku gundên me şewitandine wekî spermên tecawizê bibînin, divê em şewitandina gundan wekî kurtajkirinê bibînin, divê em zanibin ku şenahiya gundan bi qasî destê selpakfiroşan terikîne. Aha tenê ji bo vê yekê divê em gotinên xwe yek tebeqe ava nekin da ku birînen me kewên xwe bibînin û em ala Eliot bilindtir bikin. Ma jixwe Umberto Eco jî nedigot “Tu tişt bi qasî teksteke girtî ne vekirî ye.”

Û va ye hat roja hesabdîtînê. Va ye tê hilbijartina giştî. Va ye Pûşper tê da ku kurd, azadîxwaz, karker, cotkar, çepgir, suryan, tirk, ereb, elewî, êzîdî, sunî, ermen pûş têxin eyarê pergala har, pergala kesk, pergala ku ji niha ve avêtiye qulpa paşîn. Îro ne ew roj e ku li hemberî vê pergala ku bi qirçan dihate me em li serê gola xwe bigerin. Ji roja şîretê wêdetir ev roj, roja xîretê ye. Ji niha ve divê em li pişt Platforma Ked, Demokrasî û Azadiyê rabin da ku roj li me jî hilê.

Di vê hejmarê de me dosyeyek li ser “Li ba jinan wêjeya kurdî” amade kir da ku em guhê xwe ji van dîtînen xas re bel bikin. Ku her çi qas tê gotin ku “jin darên şikestî ne” jî em dibêjin na, jin sînorsîkên in, ji qalibîkên in, ji xewşîkênên şewşbûnê ne, ji dilşîkênên feodaliyê ne, jin destnimêşîkênên tabûyan in. Ji ber wê jî peyva jinê giyan e, dengê jinê şîyan e, newaya jinê germiyan e, lê jina ku ji bo azadî û serbestiya bi taybetî ya jinê û ya mirovahiyê hewl nede, ziyan e. Ji ber wê jî divê jina kurd beyî ku xwe marjînalîze bike divê karibe gotina xwe li ser ya mêran bixe.

Di hejmara 29’an de helbesta bi navê “Em bi tevahî zarokên mişextiyekê ne” bi şaşî li ser navê “Baran Nezan” derketiye, em diyar dikin ku helbest a “Sûat Baran” e.


Agahdariyeke me ya din jî ev e ku, êdî dê editor Elîxan Loran be.

Dosyeya me ya hejmara bê jî dê “Silîva/Farqîn” be. Çarçoveya dosyeyê dê wiha be, wêje û wêjevanên wî bajarî, wêjeya devkî û dengbêjî, muzîk û muzîkjenî, lîstîkên şanoyî, çîrokên gund û wargehan, cil û berg, mihîrcanên herêmî û hwd. Nivîskarê/a ku dixwaze beşdarî dosyeyê bibe herî dereng divê heta 15’ê Gulanê nivîsa xwe bişîne.

Dosyeya Gelawêj - Rezberê jî wê “Tu ji bo kê û ji bo çi dinivîsî” be. Ji bo beşdariya dosyeyê herî dereng divê heta 15’ê Gelawêjê nivîs bigihên ber destê me.

Em 22’ê Avrêlê Roja Rojnamegeriya Kurdî jî pîroz dikin. We deng ji Çapemeniya Azad nebile. Heta hejmareke dîtir bimîne di xweşiyê de...

Tu kî yî?



Feratê DENGİZÎ

Ji Firatê dilgêş re

Di esireke zivistanî de li ber tîrêjên rojê yên nîvmirî te xwe daye ber tavê. Dîsa bi darikê xwe tu komika zibil tevlihev dikî û te xwe radeştî xweşiya xurandina kêç û spiyan kiriye. Hûrikên dendikên zebeşan ên ku te di nav zibil de didîtin tê bi xwe re dibirin û hey dibirin. Pêşîn te rêx û bişkul ji hev vediqetandin. Ev rêxa gê, na na rêxa çêlekan e yên ku bi kaya zivistanî xwedî bûne. Ev bişkulên mî û bizinan e. Di yên miyan de kaya nîskan şop hiştibû, di yên bizinan de jî çiloyê hişk ên darên berû û her wiha giroveriya wan xweşik. Ya bişkulên keran! Pahno, pahno awir didan te. Tu yê pêşîn sergo bişewitînî. Paşê jî rahêjî van bişkulên keran yeko yeko deynî ser tehtikek rast ê şemetok, bi kevirekî pehn, bi qapanekî heta di te heye lê bixî, li gişkan yeko yeko bixî, paaaat..! Çiqas xweş dibû. Bermayiyên xwarinan para mirîşkan e, ew dabûn ber nikulan, vir de û wir de belav dikirin û her wiha ew dendika zebeşan pengizandibûn ber te. Dendika şikestî hebikî belek bû. Pembetiya qinika wê çiqas xweş û xweşik. Xweşikiya dêmên Fatê anîn bîra te.

Wexta ku we bi hev re nahtoriya bîstanan dikir, çiqas xweş bû. Zeman xweş û weke avê diherikî. Hûn çiqasî xweş dijiyan. Holika li ser darê, ya ku hûn bi mêrdewanê hildikişiyen ser, zebeşên emerkani, yên ku we sorbûna wan bi hişkbûna kulîrka binê zebeş an jî bi hişkbûna derzîdanka ber ciyê ku zebeş bi lem ve bû fêhm dikir, yên ku hûn bê sebir li bende sorbûna wan bûn û petexên tehm xweş ên mîna hungiv ku hûn ji wan têr nedibûn. Ya dema ku, şimamokên bêhn xweş ên ku bi surprîzî bi xweşezkirina zarokî wê ji te re dianîn û te ji jî nav rezan gulên mihemedî diyarî wê dikir. Lê xweşsohetên bin tava heyvê! Oxweş! Jiyan çiqasî jî xweş bû. Zêdebûna xweşgermbûna kêleka te ya çepê û coşiya ku di mejî û dilê te de diafirand. Ya dema ku te ew neditî, êşa ku diket dilê te, sanciya mehde!

Ji nedîtî ve jiyan vedigeriya camên şikestî û parçeyên caman. Mejiyê te... Te fêhm nedikir ku çî dibû, te

fêhm nekir. Te êdî tu tişt nikaribû bi hev girêbide. Te tundiya deriyên ku dihatin şikestin hîs dikir, pelaxtina gîzmeyan ên li ser nivînan jî. Toza nîsk û genimên ku dihate rijandin û dihate tevlihevkirin, qirika te dişewitand. Êşa pişt û stûyê te dijar... tew bêtaqetiya mîl û masûrê piştê, pûçiya wan... Rengê kesk ê xakî di gerîneka hişê te de gerînekine zêde afirandibûn. Her tişt qutbûyî. Jiyan, xewn û xeyalên ku hatibûn talan kirin. Xewên ku vediguheriya gabûsan û ilim jî dengê kûçikan! Talana rez û baxçeyan, bibîrxistina sawan a xweşsoriya nêreka zebeşên şikestî. Gelo ew zimanê te bû yan mejiyê te, na na dilê te! Dilê te...

Tu kî yî?

Tu kî bûyî?

Tu li ku yî..?!

Te tevlihevkirina ardînekê, ya sergo domand. Zarokên ku bera hev didan li te qelibîn, vê hebikî te aware kir. Gelo tu bi wan bixeyidiya? Na lo, Simo bi sebir û bê deng e. Ma hatiye dîtin ku Simoyê dîn heta niha belaya xwe bi zarokan daye! Ma kî dikare bi vî zarokê reşqemerî yê ku serçavê xwe bi qîlêre seyndiye û zipzindiya jiyanê ji reşika çavên wî difûre bixeyîde? Çi xweşik, çi xweşik wek ku bibêje merheba, te daye ber pihînan. Bilaqe. Ev jî dostaniyek e! Yan jî ew ê li cem, ew ê dirêj û rûsoringî ku bi fişefîşa lîçika xwe re te dehf dide dera hanê. Baş e... Wê bileyzin cî bide wan. Lîstika sikan dest pê dike û ji bo vê jî sergo, an jî çamûreke hebikî hişk û tund divê. Haydê, hêdî hêdî rêyeke bide ber xwe, berê xwe bide Şikefta Mehmo, ew der li benda te ye.

Hêdî hêdî, tu bi rê diketî. Meşeke kîsoyî.

Te sermilkên xwe bilind kirine, serê xwe veşartiyê mîna kîso. Qapûtê leşkerî yê qetiyayî yê çend parçe ku bi qutikên benan bi hev ve girêdayî te li bedena xwe pêçandiye. Lîçika te rî û simbêlên te kirine kevîrekî reşqemerî. Çavşikandinên tîrêjên rojê yên lawaz î ku agahî didan va ye êvar tê, tevli awaza zarokan dibe. Tu pêxîla xwe didî seqema tund.

Wexta ku tu xwe di ser bena erd re diavêjî, lingê

te li kevirêkî dialiqe û hildikumî û digindirî nav berfa ku li ber benê ketiye ser hev a qeşayî. Bêyî ku tu xwe dawêşînî tu erd didî ber gavan û xwe li kaş didî. Hêdî hêdî di nav deviyên firk re hildikişî û wexta ku digihêyî ber deriyê şikeftê, merhebayekê didî tariya ku ketiye erdê.

Tariyê ji berê ve bala te dikişand. Di bêhnvedankê de yan jî berî xewê ku te çavên xwe hişk didan ser hev, te hîs dikir ku ji nava tariyê gurzek tîrêjên ronahiyê, ji navendekê pêl bi pêl belav dibin û tu dima ecêbmayî. Navendê mîna lêdana dil her tim xwe nû dikir. Li gorî reştariya pêlê jî guherbar. Ev çi ye, ma tarî afirînkare ronahiyê ye! Her çi be kûr û hûrbûna te xweş e. Li qorziya herî tarî ya şikeftê, bêyî guhlêdana sar û seqemê gava ku xwe diqurnisînî û çavên xwe hişk didî ser hev, careke din te xwe berdaye pêxîla vê lîstika xweş. Guh nadî sermayê. Ligel pilingên sorsoî di dilê te de ma sar û seqem çi ye! A va ye careke din ew gurza ronî, gokronî...

Tev li hevalê xwe di deryaya gokrohnîyê de we xwe berdaye nava lîstikan. Yek e yek, hisomeyn, teqloya kevokê, kerkê berdiwêr û ilim jî darçoqîtik; şepo, çilko. Li ser bendera Mala Hemo tev li şîrîna xwêdanê tu di xweşiya lîstikan de têkçûyî yî. Fermana "Siro ol!- têkevin rêzê!" cîhana te diqerisand. Bi dorê hûn dikevin hundir. Wane. Zimanekî biyanî, cîhaneke biyanî... awîrîne tûj, simbêline sertûj û dirêj. "Çima te helbesta 'Ev welat ê kê ye' ji ber nekiriye? Bi qasî rêzên helbestê darên ku kefa destên te yên biçûk tehm dikirin. Êş û elem, êş û elem ... Tenê tiştên ku awiran vedigotin! Lê şewata dil, îşyan, asîkarî..! Paşê ji ber ku te barê êzingan ji dibistanê re neaniye, nîvrojê, bi piştixwarî di jêrzemînê de hepsîtî. Ooof û çi of! Ev jî ji ku derê derket? Lîstika ronahiyê çi qasî xweş bû. Ma rihet nahêlin ku! Di dengherikîna guhên te de cîhaneke biyanî. Ya ku ne ya te ye. Biyanî, xerîb, xerîb..! Çewîşner, zorkar, zilimkar..! A ku diesirand, cî teng dikir û dipelaxt. Rihê te di serhildanê de. Tu eks, hêrsok û bêhtengî. Te deyax nedikir. Zor li te dihat. Tu deyax nakî. "Bi min zor tê, bi min zor tê, zor tê, zor e, zor..."

Bi pengizînê serê te li ezmanê şikeftê dikeve.

Pir dereng canê te sist dibe. Tu di pêxîla şevê de yî.

Te zeman nizanibû. Jixwe hebûna te jî di xema zemên de bû! Di hefteya ku tu bi Koçerê re zewiciyî de; wefakar bû Koçerê, girêdana wê bi dostanî û mirovahî bû, lê birayên wê neazelah; birayên wê bi çekên xwe te xistin nav xelekê û berê namlûyan dan te, te nikaribû tu tiştêkî bike ji xeynî nerîna bi awirên vala, te tu tişt nekir. Te tu wate jî nedayê. Dest danibûn ser malê te û erdên te tevan. Lêdan û xeber jî zêdehiya ser kezêbê! Baş e, lê ev tev ji bo çi bûn? Çima? Gelo ev e ya ku jê re dibêjin; "mirov kurme mirov e, mirov gure mirov!"

Bistikekê di dilê te re buhurî ku tu wan bikujî, lê ma wê ev çi çareser bikira ku! Ma însan, ma mirov tiştêkî hindik e, biçûk e? Ew dil û canê ku dil afirandiye. Bêhnvedana şêrîn. Bi dilovaniya dayikan û bi coşî ber bi jiyanê ve bezîn... Ma ev mafê te bû ku tu tune bikî? Bêhndan û stendin çiqasî xweş..! Jiyan, jiyîn çiqasî xweş e di firehiya asîman de, bi firehiya asîman..! Çi zîrara hebûnê ji tu kesî re heye. Zû te kuştin avêt ji hişê xwe. Baş e, lê te tiştên ku dibûn fêhm nedikir, te nekaribû tu tiştêkî bi hev girêbide.

A rast, çiya. Te çiya ji xwe re dikir war. Meş mirovî rihet dike. Teht, lat, bereş, newal û pahnaw û lûtke. Ji lûtkeyan nêrîna li hevrezan, li hevrezên rih..! Paşê, paşê car carinan agirdadan û xweberdana nav rivînên êgir ên sor, lêhûrbûn. Paşê tevdana ariya wê heta ku pizot sar dibûn. Gewriya wê çiqasî xweş bû ya ariyê; Arî. Ar. Arîdank. Carinan dêya te digot, "arî li serê te be." Ev dihat çi wateyê? Lê te ji ariyê zêde hez dikir. Tehma wê jî xweş bû, ha! Tew tehma ariya cixareyê. Yek tehma titûnê xweş bû, yek jî ya ariyê. A ariya cixareyê jî. Zarokan cixareyên qûnsor didan te. Tu ji sorîyê ditirsîyayî, vedicinîyî. Zûzûka te ciyê sor jêdikir, diavêt, parçeyê ku dima jî hinek dikişand û hinek titûna mayî jî dixwar. Te guh nedida diqdiqandina zarokan a bi serê daran, hincirandina wan û bangkirina wan a li lîstokan. Pîrgotina wan a bi awaz û ahengdar ku digotin, "Dê no, si mo, dê no, si mo..." ji gurcika dil te dikêfand. Te digot, "hevalen min..."

Ji çiya tu dadiketî ber çem. Di şenahiya newalê de qiraxa avê, qiraxa çem çi qasî xweş bû. Baz de hey baz de. Bazdanê kêfa te dianî. Te guh nedida biecbênerîna yên ku li derdorê dixebitîn, hêhêkirina wan û keviravêtina wan a li te, te di ser guhê xwe re diavêt. Herî zêde te ji bazdana li ser rêya asfalta li tenîştê avê hez dikir, dîsa ya qiraxa avê. Bi rûbar re, bi çem re, bi avê re pêşbazî kêfek bû. Te gurzek gîha diavêt avê û dest bi pêşbaziye dikir. Bi piranî te zora avê dibir, ku giha diket gerînekê te neqeba xwe û wê vedikir tu dûr diketî. Carinan xweçengkirina masiyekî wisa xweşazad an jî koma masiyên ku bi hev re digeriyan û ji nedîtî ve bi hev re xwe li avê dadikirin û wînda dibûn te dida sekinandin û heta ku hêsirên te dibûn tavana barana biharî te xemgîn dikir.

Dawiya vê bazdanê yek sûka bajarok bû.

Newal, gir, çiya, kevîr şikeft, av, bazdan û bazdan. Ku tu dibezîyayî te hîs dikir ku tu kesekê/î bi bin dixî. An jî bangdana dengêkî. Te dida pey wî dengî; ew dengê ji dil, bi sêr û bandorker a xweş.

Xanên te, warlêdanînen te dihat zanîn, hema bi-bêje her kesî dizanibûn.

Koçerê nan, xwarin, vexwarin cil û berg datanî wan deran lê ne li ser bala te bû. Carinan hesasiyetê te di-

girt, te serî dida girî, bi hêşiran te xwe dişûşt. Te dixwest ku tu bidî xwe û bigihêyî Koçerê. Rûyê Koçerê tevli rûyê Fatê dibû. Qetqetiyên hişê te qet nedigîhan hevdu, nagihên...

Te nikaribû vebêje, na te nekaribû vebêje ku! Fêhm nedikirin ku! Wek mînaka ku Besnayê xwe avêtibû bextê şêx û tiştên ku hatibûn serî..! Mirov dîtîkor bûn, didîtîn lê kor bûn. Fêhm nedikirin ku..! Ka mirov çawa bibêje?

Tu di zorê de bûyî, pir zor li te dihat.

Tu xurt bûyî, carinan te digot qey tu fêhm dikî. Lê te nekaribû bûne cem hev, bi hev ve girêbide. Te ji mirovan, ilim ji ji zarokan pir hez dikir. Lê te wate nedida, tiştên ku te radigirtin, sedem, asteng û xitimînan. Te fêhmîkirin winda kiribû. Tu behitî bûyî, fêhm kor. te fêhm jî nedikir ya.

Evîna te bazdan e û hey bazdan.

Nixteya dawîn a bazdana di cadeyê de ber firina êzingan bû. Wek darek hewran tu li wira dihatî çandin. Bi saetan... Wek tu li yê diherin û tînin dinêrî, lê di asasê xwe de tu ne li wan deran bûyî.

Her tişt parçe parçe û belavbûyî. Te dixwest bigihîm hevdu. Nedibû. Xelqe ji hev diqetiyên. Wek her tim rewşnûkirin. Carinan tam te tiştin digîhandin hevdu, lê dîsa qet qetî... Wey nehlet! Te tu wate nedida vê gotina pêşiyên, "Kûzê Batê cebar nabe." Dîsa jî heta ji te dihat te nedixwest germiya dilê xwe, ronahiya mejiyê xwe winda bikî. Te dida pey, beradidayê, tevî bêhaliya xwe; ligel lalî û pûçiya xwe!

Bîbikên çavên te yê ku zoqî agirê firinê dibûn mezin dibûn û hey mezin dibûn. Di pirengî û xweşrengiyên reqsa rivînên êgir de te pir tişt ditî, herî dawîn tu zoqî biharê dibûyî, di biharê de tu diqefilî yî.

Demsal bi hevdana mizîlaqan dest pê dikir, dema herî xweş çêrandina berxik û karikan e; ji gangilok, sosin, qulîrqehwan û binefşan çêkirina destegulan, çêkirina tacegulan û diyarî û listikên bi Fatê re. Carinan Koçerê jî dihat binhişê te. Paşê kesaxa rezan, cot. Çiqasî xweş bû dema bazdana ber bi kesksora biharî ve û pê re pê re xweşilbûna bi barana biharê, di heriyê de man û bi kulîrkên bihîvan xwe avêtina bextê kokele û mehseran. Tew qilqileya cara pêşîn a avjeniya di çem de. Bi hesretbûna demsala tû û alûcan û gera li hêlinên kewan. Qet te hêlîna wan xera nedikir. Te dişopand, dawiyê radihişt ferxikekî û te ew mezin dikir, ev bû

kêfxweşiya te ya yekane. Çiqasî xweş bû qebeqeba kewan di sihara sibê de.

Ji nedîtî ve dîmen tevlihev dibû. Rivîn vediguherîn parçeyên caman, di gerîneka rengê xakî de gizme dadiweşyan mejiyê te. Zebeş bi her aliyî ve belav dibûn, soriya nêreka wan tev dibûn ax, her der şerpeze. Te namlûyên li ser serê xwe didîtî. Bi hêbeta simbelên tûjdirêj ên daketî dar li pê hev li nava serê te dihatin hejmartin. Mejiyê te belav dibû, masûrê piştê te dişikêst, sermilên te diketin, milên te diweşyan. Çavên te jî serê te bazdidan. Lê tu nedimirî yî. Tu dimirî û car de rih dihat te. Êş û elem. Oooof..! Of û hey of! A rast wê mirin xelasî bûna, mirin felatî bû. Wek aviyeke mezeloqî tu belawela dibûyî lê car de dijiyayî... Tu bi êşên giran dijiyayî.

Bera, ev çi bû?

Tu kî bûyî?

Tu kî yî?!

Tu li ku yî?

Zor li te dihat, zor li te dihat!

Ji nedîtî ve dihat bîra te ku yekî mehdetirş ê rûbeloqî û sistomisto, nermok, kenbigirêz û kenoke, bi biçûkdîtînekê navê te digot. Xirecira siwarbûna li erebeyekê, kêmdîtîni... Ji her dikanekê bajêr dan û sitendin ezabek, hezar derd, hezar lihevda û hezar çêr. Her tim

rûbeloqî! "Xwedê te şaş afirandiye!", "Şikefta te li ku?", "Ji kerê re gotine..!" Zor li te dihat, te deyax nedikir... Paşê, paşê tehma xwîna ku ji rûyê te diherikî ya tehmekek a tîrş bi qirika te ve dizeliqî, te nikaribû daqurtîne.

Yekî te hildiwêşand.

Dihatî ser hişê xwe.

Nanekî firnê xistin

bin çengê te. Te car de

bazdida... Bazdida, di dilê te hezar firtone... Te xwe diavêt gerînekên ku te nizanibû çi ne. Te bazdida, bazdida. Heta ku qirika te dixetimî ku te nikaribû bêhnê bistîne. Te bêhna xwe li Şikefta Mehmo berdida. Tu li ser piştê wisa dirêjbûyî yî, nan li ber serê te, tu di dema ferisîna tejhîtolê de yî.

Zeman çûbû ku..?

Çawa derbas bû, nayê zanîn.

Windabûyî, te şopa xwe winda kir demekê.

*

Paşê. Demek dirêêêêj bihurî û hat zanîn ku tu Apocî yî!





Ez kuncî, tu kuncî

Xelat EHMED



Gol di pencera min re derbas dibe
Morîka xewê ji dilê min derdixe.
Ji xwedayên di xwe de agahdar im
li taliya rê napirsim
Tîrsê ji tîrsê re dihêlim
ji neynikên xwe derdikevim
li yên agir didim: Vêkeve!

1

Ev çend roj in, dîsa bi xwe re diaxivim
Ji vê sibehê ve gulan dixwim û deriyên girtî
dibînim,
Û hîn ji min weye jîyan xewn e.
Dê vî bajarî çawa derbas bikim?
Riya min, dê çawa bi ser min ve bibe?
Deriyên girtî ji serma dilerizin, ne ji tenêbûn.
j?
Dizanim, dîsa li ber girtina deriyên xwe
didim.

Not:

1. E-maila diya min nîn e, da ez vê tayê jê re
bişînim. Ez telefonî wê jî bikim, wê bibêje, keça
min dîsa di tayê de, bi kewên mirar dinivîse.

2. Tu dizanî! Carinan ji min weye, dareke şîn
im, hema di tenga xwe re gihame. Ne gunehê te
ye; bi xwe hîn ji zû de, di xewna xwe de dişewi-
tim.

3. Carinan jî - di gel ku ez dizanim di kavi-
lên xwe de girtî me - dîsa jî destê çîrsîn yê Eştara
dayik werdigirim. Heman li cendekên xwe diher-
pilim. Serê min li hedan dikeve, dîsa jî ji min
weye kavi tenê xewn e. Careke din, nû ji nû ve,
dest bi kuştina xwe dikim.

2

Îro roj çîrsîn e
Hest û hişê min gulokek tayê şehitî ne,
û pilinga ez/min neynûkên xwe bi meha-
neyan tûj dike
Dê serê pêlê har û dîn berdim
û bijîm.
Vê sibehê,
min deriyekî qalind kuşt û xwar.
Dudiliya rê daqurtand û xwê bi ser de kir.
Xorên bi kêlîka vêketî ket
mezintir, hîn mezintir dê deriyên hilgurînim.

Not:

1. Zîqezîqa giyanê min e, di mişêna jîyanê de,
kî têrî evqas dil dike?

2. Di neynikên mêraniyê de, heman min dikir,
xwe ji bîr bikim!

3. Heyvê hîn ez ji bîr nekirime û dibe ku li
haveynê xwe bibim xwedî!

3

Hîn marek maye min ji te re negotiye...
Bihiştta min tu jê derxistî, yek bû, her şeşên
dîn, ez im.

Ewqas sêv te xwarin, yeka bi tenê jî ne
nîvê te bû:

çîrsîna vînê, bê hedan û kurtik, riyên hijêki-
rinê ji te şaş kirin.

Giya di bin dilê te de zer dibe - min dikir di
dengê te li xwe binihêrim-

tîrsa tenêbûnê ye, me li hev gêj dike;
wek avê ji destê xwe diçin.

û ji tîrsa mirinê, em bi xwe, xwe dikujin.

êş li ber dilê te asê maye
û hijêkirin li ber yê min.

Not:

1. Car heye, Xwedê, not û neh caran di giyanê min de şîn dibe. Derwêşên ez/min di zikra ronahiya hezkirinê de, min û xwe ji bîr dikin.

2. Dizanim, tu ji tîrsa hezkirinê û tiştên di jîyanê de ji hezkirinê girîngtir!?- min car li pêy carê divemirînî. Ez dê tarî bibim û tu yê di kora-hiyê de bimînî.

3. Zendên xwe dirêj vedikim, mîna xaçekê, aliyên bê dawî girover digerin; digerin; digerin.....Tu dibêji mar wê dûvê xwe gez bike, wê bazinek li ba min û te, bigihê hev?

4

‘Teyrê dewletê’ di dilê min de lîs daye. ‘Jina qurban’ latên qurbanên tîrsê derbas kirin, pêjna şahmaran ji jibîrkirinê şiyar dike.

Bi dilovaniya dayikekê, jînê didim ber singê xwe,
Ji pişt xwe ve; deriyên xwe vedikim û didim hezkirinê.

Neh kêr bûn

û destê te, çar tilîyan, di singê min de diçû xwar.
Ji aliyê din ê kuştinê ve; a niha tu bangî min dikî:
Tu nema xwe dibînî û ne jî min !

Hew qas ji xwe û hezîrînê bitîrsî!?
Ji min re bi gora min sond nexwe,
dizanim min dîsa marên xwe dan jibîrkirinê.

Di ‘jiyan ev kêlik e’ de,
ji min weye tu dayika min î
û ez birayê te me

Not:

1. Siwara sereke, tenê li hespê kihêl radiweste. Ji tîrsa xwe were xwar, dê ji te nebihurim.

2. Sê niv im: Jehr, zanîn û derman. Ji wesa asîmantir li hêviya te bûm!

3. Pencereya min hîn ronahî ye, darên şîn hîn car caran seriyekî li min didin. Ez hîn dinivîsim!

5

Zingênî ji tariyê tê.

Pêjna Xwedê bi ser biyaniyê ketiye,
berê û heval, îşev kirên in,
û ne destên min in li ber dilê te.
Navê bigirîm.

Heyvek mezin, tenê, bi çavine pîrsok, nêrdewanê ber bi navên min ên kevnar ve dirêj dike: rabe!

Not:

1: Nizanim çima ev xewn neçû serî. Belkî hîn jînên berê li ber xwe didin, belkî jî hîn paşerojê destûra min nedaye.

2. Bi Îzîsê re hînî jehr û dermanên gul û giyan bibûm. Min dermanek tenê jî ji dilovaniya xwe re nehişt.

6

Divêm ji “te” re bibêjim: kolanên vî welatî li min teng dikin.

Her ber bi xwe ve direvim,
her pişt min li min e.

Ji reş heta spî

Çavê masî ez negirtim

Û hêlîmek tenê jî, derbasî bêhna min nebû!

Çend ji xwe re dibêjim:

Ne hewqas zehmet e lê!

lê; kê wê bi serê dilê min bixe!!?

Hema pênûs ji destê min dikeve; hêdî hew bi xwe re diaxivim.

Kolanên vî welatî gelekî li min teng dikin,
û nagihê xwe da xwe veşêrim.

Not:

1. Heyva min îşev bê serûşûn e. Ne li ber pencera te ye!?

2. Di nav rêzan de qelşa giyanê min neşopîne. Pêş te ve giyanê xwe vajî dikim, bila dilê te ji min nexele.

7

Keriyek pilingên din di giyanê min de dibişkivîn.

Bi çavine çîrsîn li navê te tene hev.

Ji te pêv, her kes li vir bû.

Di baweriya te ya çarejêkirinê de, dilop dilop ji te winda dibim.

Ji te weye, dê her wisa, neynika te ya sihrebaz
bim
û bi dileke di cih de, xwe ji min bê hay dikî.
Nema li sîka xwe diherbilim,
min ronahiya xwe ya windabûyî dîsa dît
Riyên kevin û dudil dibirim,
hêjayî azadiya xwe,
aso hildidim.

Not:

1. Divê / divim.

8

Min fikir bêm: Tu ji bo helbestê yî, lê na,
helbest hêjayî hezkirinek ji wesa bixwebawertir e.
Ji siwarên Derwêşê Evdî ve, çavên min bi te
neketine.

Ji min weye, tu siwarê herî pêş î û ez çavşînkî
li ser dilê te me.

Ji min weye, tu rimê herî bilind î û ez ceger û
comerdiya te me.

Mija elenda buharê bû, dilê min girtî.
Xîza wext di navbera me de stûr,
dudilî,
gumanên nebaweriyê,
çavên hezkirinê yên mezin
û evqas ré!!!!
çi wê me bide hev ?

9

Diviyam tiliyên min ji wesa bêhtir di ziman de
gul bidin,
şimus û pa, ziman û ez, li ber hev didin!
Kêlîka helbest/hezkirin, ji dilê min bar dike,
hema, êş mîna gurekî birçî, min dixirxirîne.
Hevbenda te me, di vê serjêkirina bê sîc de.

Li xwe nabihurim.

10

Ji min weye tu yî, dilê wext ê li min dereng-
mayî

Ji min weye tu yî soza Xwedê.

Dê sêvekê deynim li ser devê şerbik

û bi şûn te ve bişkînim.

Vê carê jî, dê dilê xwe yê ji bêrikirinê nexweş,
bidim ber dilê xwe.

Bi helbestê dê li ber dilê xwe bidim.

Li ber serê jena birîndar heta sibê

avê bireşînim.

Gelek wê ji destên me here

û tîra wext ê li ber şewata me nesekine.

Not:

1. Ne tenê gunehê te ye ku ev qas ronahî li
ber serê min dize.

2. Ez vê stranê nadim, tiliyên te têrî strana
min nakin.

3. Ji Xwedayê helbestê spasdar im, pê tîm
bîra xwe.

11

Dê deriyên xwe tevan vekim li ber vê pêla bê
serî,

Dilovan dê li dilovaniya xwe guhdar bim.

Dizanim, vê carê jî tu yê derbas bibî

û piştî bahozê

belkî ez, ez bim.

Not :

1. Çîrokê çîrvanokê, ez kuncî, tu kuncî, li ser
textikê narincî, ez firîm û tu mayî li wî cihî.

Jêbira şevê

Mûrat OZYAŞAR

Wergera ji tirkî: Ozlem ZELAL

Jêbira bi bêhn

Hatin.

Ew qas pir bûn, yek bi yek hatin. Eniya wan bi xwê, çavên wan bi rik û bi piyên qirase qirase hatin. Me yek bi yek rêz kirin û destên me li hewa, berê me dan dîwêr pêşiyê. Qasek bi şûnde, diayê ku ji devê diya min rêz dibûn pekiyan dîwarê ji şêx û meşayîx, pîr û ewliyaan....

Çima derewan bikim; min hê gelekî berê çekên wan ê dirêj dirêj, reş reş dîtibû. Carekê gava di qaleyê de min golek xwaribû, ku çûbûm topê bînim, leqayî wan bûbûm. Hîna jî êşa wê şîmaqa ku avêtibûn hinarikên min, li ser rûyê min e. Min negotibû ji diya xwe re, hîna jî nizane. Zanibûya, qey wê bi-çûya serê wan bişikanda. Diya min carekê ji min re gotibû, “Ji tu kesî re qala kekê xwe neke, ew çûye Stenbolê kar bike, herê?” Herê bû. Ji xwe min jî, qet wî nedîtibû. Li dîwar, wêneyên wî yên daliqandî hebûn. Diya min lê dinêrt û dinêrt, dia ji ser lêvên wê kêmin nedibûn. Bi rastî, diya min çima her tim dia dikir? Kîngê ez wê bi bîr bînim; lahele, subhanallah û Allah û ekber...Bi hezkirin qala kekê min dikir; bi bêrikirin û bi xemgîni...Ne ku nediketîn ta-têla wî, bê ka dijî yan na. Çend caran gotin miriye; wêneyên ku li dîwêr daliqandibûn, bi xêliyên reş hatin nixumandin. Dema qala wî dibû, diya min çima her tim digiriya? Ew qas ax û wax û tizbikişandin ji bo kê bû? Dihat gotin, mala şînan e ev mal. Kekê min wêrek bûye, bi fêz bûye, dibêjin ji ber vana çûye. Der û cîranên me, min nedişibandin wî. Pênc tilî jî ne wekî hev in, lewma. Digotin em nizanin ev li kê çûye. Zora min diçû. Lê diya min, ji min hez dikir.

Cara yekem bû min didît kekê xwe. Ev cara yekem bû ku dihat cem me. Lê, ez tîm bîra wî. Min lê nihêrî, ew ji min dirêjtir e. Bi ser de jî tîra xwe bedew e. Diya min kêmin jî gotiye. Wek min, ne qop e. Yê din jî re dibêjin fermandarê min.

Kekê min bû.

Ku em vegerin, maçeke xweş em bilîzin, got yê li rex wî: “Vê carê, em ê we tîk bibin û bi ser de jî hûn ê nikaribin golan bi serê xwe biavêjin.” Diya min got, wî berê jî timî bi topê dileyîst. Birayê min got:

“Ji bo ku min tîxin tîma xwe, şer dikirin; timî min li pêş dileyîst û bi piranî jî min gol diavêtin.” Dûre ez nîşan dam û got: “Eger min wî li derve bidîta, min ê ew nas nekira.” Dayê ka lê binêr, dibe ku gotibe, ew dişibe min. Yan jî min wisa fêm kiribû. Min xwestibû wisa bigota; lê wî negot. Ez çi bikim? Dema ku min destê xwe dabû çeka wî, mehdê xwe li min tîrş kiribû. Gelo diya min hîn bêtir jê hez dikir, çi! Ew çitika reş, ku bi salan e li serê xwe girêdabû û xêliyên li ser wêneyan avêtibû, kincên rengorengo li xwe kiribû, mirov digot qey bûkeke nû hatiye malê. Çend caran ji bo ku ew çitika ji serê xwe bike giriya-bûm, min gazind kiribû û xwe li erdê xistibû. Lê dîsa jî wê ji serê xwe nekiribû.

Min di wî temenî de, ji diya xwe fedî dikir wê demê: ji çitika serê wê, ji diranên wê yên zêr, ji deqa eniya wê û herî pir herî pir jî, ji nezaniya wê ya Tirkî ew qas zêde fedî dikir. Tenê ji vê sedemê; min nedixwest diya min bê dibistanê, hevalekî xwe yê polê jî nedibir malê û bi ser de jî, min wan di nêzî kuçeya me re jî derbas nedikir. Dayikên ku mamosteyê me, di kovara ûnîteyê de nîşanî me dida, çima ji diya min cuda bûn? Diya min çima qelew û timî reş bû?

Çima ew qas pir bûn, min jimart jimart neqediyan. Got : “Dest bi saxkirinê bikin” Dengê herî hişk û yê herî mezin. Dor li ser min e. Çogên min dilerizin. Weku wazoya di menzela mêvanan de, min şikandibe. Min qet hêvî nedikir, lê li min bihurîn, li diya min jî... Li menzela belavbûn dûre, li kîler û sersokê. Lûleya qulika sobê û ardûgeh jî ji bîr nekirin. Gotin “Li jorê Xwedê, li xwarê em in.” Diya min digot, em bê kes û bê xwedî ne. Min di wê kêliyê de bawer kir. Dengêkî fetisok got “Tu kes tune.” Bêhndan û sitendina diya xwe min bihîst, dengê wê yê ku digot hemd ji Xwedê re. Zivirîm, çavên min û wî li hev ketin. Bi ewê çav şîn re. Çav li min şikand, ji bêrîka xwe şekir derxist, serê min mist da. Got, “Min ji kurê xwe re kiribû, lê qismetê te ye.” Li diya xwe zivirîm. Min got qey li min nanihêre. Min şekir girt. Min got, dema ku ez mezin bibim, ez ê jî bibim wek wî. Wê çekên min hebin; ez ê kaptanê tîmê ku timî min dixist qaleyê, bitirsînim. Ma qey tenê ya kekê min heye, wê yê min jî hebe. Wê kincên min ên xakî

hebin; min ê destê xwe yê rastê bibira eniya xwe û bigota: Merheba! Li piyên xwe yê qirase qirase fikirîm dûre. Min ê riya xwe dirêj bikira, dipîdirêj... Diya min nebihîse, dûre wê pir bixeyide. Wextekî pir berê, nebaşıya wan ji min re yek bi yek vegotibû. Gotibû ji bîr nekî, herê. Çawa bi bîr neynim...

Min ji diya xwe bihîst: Ji bo birayê min biqefêlin, wê malê bikin qereqol.

Dengê herî nas got: "Rehet bin û li min baş guhdar bikin, çûn û neçûna me di destê we de ye." Ez bi xwe ditirsîyam ji vî dengî. Çavên min fireh dibûn û dibûn wisa min lê dinêrî. Gotin diyar e, hîn em ê li vê derê pir bimînin. Min bi dawa diya xwe girt. Bi diayên xwe yê nediqediyan diya min, weku min ji bîr kiribû. Ji nav wan yekî din gotibû: "Netirse, dema ku tu mezîn bû, tu yê ji bîr bikî."

Min ji bîr nekir.

Perde hatin kişandin. Diya min bê rawestan dengê xwe birî. Got: "Nexwe em ê fêr nebin bê ka bi ku derê ve çûne," dengê herî pir jê ditirsîyam. Ew qas li bendê man. Diya min weku lalan e. Diyar e, di dilê xwe de diayan dixwîne, çavên wê li jor, destên wê bi tizbiyê ve. Dîsa çavê me li hev ket. Dîsa çav li min şikand ew ê çav şîn. Ji min pirsî "Tu kîjan tîmî digirî"

Min got:

- Galatasaray

Got:

- Ez jî

Herê herê, ez ê bibim wek wî; wê çekên min hebin, kincên min ên xakî, piyên min ên pê li erdê dikin yê qirase qirase... Destê xwe li stûyê min gerand û hinarkên min mist da. Dûre dûre min ê fêhm bikira, ez di ew azmûna ku wê xwê di canê min re biavêta derbas dibûm û ew pirsî dirêj ji min kir:

- Kekê te wan li ku derê.....

-

Weku yê heta îro, nedixwest neynûka min li kevir bikeve û ji bo ku ez razê çogên wê li oxira

min bû ne ew bû. Min ew çav, carekê be jî qet wisa nedîtibûn. Weku bi salan nijandibû û nijandibû, dûre pirsibû:

- Ma min kurê xwe, ji bo şekirekî mezin kiribû?

Lenûska Venêrînê

- Ogûz!

"Ez li vê derê me, hûn li ku derê ne?"

- Yûsûf!

"Piştî peyarê û sînemayan; herê herê, ez li vê derê me."

- Sevîm!

"We ez nedîtîm; binêrin, ez jî li vê derê me."

- Ferit!

"Li wê derê me. Di xeyalan de bûm. Li vê derê me."

- O!

"Çûm cem Dost, li malê bûn. Li vê derê me."

- Onat!

"Li qehwexaneê li yê çarem digeriyan. Çûm, lê ez negirtim. Li vê derê me."

- Saît!

"Wek yekî got hişt hişt. Her tim li vê derê me."

- Hamdî!

"Car caran li vê derê me."

- Ziya!

"Çûbûm wêneyê xwe bigirim, hîn nû hatim, li min biborin. Li vê derê me."

- Haldûn!

"Ez ji ber tîqtîqa saetê ji xwe çûbûm, dereng mam. Lê li vê derê me."

- Hasan Alî!



"Hûn kîjan wextî bibêjin, ez çawa be jî li vê derê me."

- Kahraman!

-

- Kahraman!

"Mamoste wî tune binivîse. Gotin, ew ji berdêla kekê xwe çûye."





Merdêne

Lorîn DEMÎREL

Asme zê sînîya zern asme de beleqîya,
dewe de cînîyan kinca şayê kerdene pay.
Dewe koyan ser de bî.
Cînîyan kut rayê la şewe ra şîyene.
Şewe cînîyan zerê xo de dardene we,
cînîyan zerê şewe de zê zerê maya xo de bî.
Hen mesûd,
biomid,
bixoy bî cînîyan şewe de.
Rayê la zê Pirda Sirat bî.
Tekbitek cînîyan ser ra verd ra,
melîkeyî pirsger peyê pirde de bî.
Melîkeyî pers kerd:
to cînîya serba xo ti se kerd?
Cînî bersiv da:
mi serê xo hard ra we nêdard.
Melîkeyî bînan ra pers kerd:
ma ti se kerd?
Cînî bersiv da:
mi gon virit ra labêle rojê ax! nêkerd.

Cînîyan pird ser ra tekbitok verd ra şî hetê bîn.
Binê new taxte de qesey kerdene cînîyan,
vengê berzî ra qesey kerd.

Yewî va:
na veng vengê mi yo!
Ez ecayîb mendîne.
Mi hata nika vengê xo nîya nêhesna.


Bînî va:
mi hata nika serê xo hard ra nê dard we,
hata nika.
Nika serê xo dan we.

Bînî va vinderî,
vengê cînîyan êno.
Amey.
Vengê cînîyan êno.
Berbenî.

Yewbîn va:
hey hey...
şîma hesnenî no veng,
vengê Wakile ya.
Wakile dakila Dêrsimî ya.

Wakilê ame cînîyan ser
hem xo re berba
hem cînîyan re.

Tîje koyanê Dêrsim ser de vejîya.
Cînîyan binê hard de
vengê xo da we, serê xo da we.
Cînîyan tene merdene ser de vengê xo da we.
Şaran tene merdene de vengê cînîyan hen
berz hesna.



Medenî FERHO

Bandora perwerdehiya dagirkeran

Mirovê ku aligiriyê neke, kesayetiya wî felc bûye. Kesek bê aligir nîn e; sosyolojî û dîrok jî aligir in. Her du zanist, dîrok û sosyolojî hevparên gunehkariyên li dijî mirovahiyê ne. Siyaset jî, edebiyat jî têkildarî dîrok û sosyolojî ne. Hevparên gunehkariya canlîdarê ku hîna neynûk û diranên wî nehatine jêkirin e.

Sîstema dewletên dagirker û siyaseta fermî ya perwerdehiya ku di xwîn, mêjî, ra û tarîşkên bedena nivîskar û rewşenbîrên kurd de xwe honaye, bandorê li mêjiyê wan dike. Di demeke ku li Kurdistanê, mirov têne kuştin, dar û devî, lawir û çûk û tûtak, kêzik û kurmik têne kuştin û şewitandin de, buxza tofanî ji erd û ezman bi serê serê Kurdistanê de dibare, hejmareke zêde nivîskar û rewşenbîr û siyasetmedar dibin “paçîkê pîso” û gotinên bi maskeyan barkirî bi kar tînin. TRT 6 bûye ayîngeha rewşenbîrên kurd. Mîna keke bi vê ecebê li cîhanê nîn e.

Wek mînak:

Di dema ku hêzên faşîstên Naziyan ketin Fransayê, ketin Polonyayê û heta bi qeraxên Stalîngradê dirêj bûn, nivîskar, rewşenbîr û gelê Fransayê, Polonyayê û Rûsyayê ligel hev şerê li dijî hêzên dagirker kirin. Li Belçîkayê zarokên 13 salî li dijî Naziyan şer kirin. Gelo cûdatiya Naziyan Elmanyayê û hovên tirkên Tirkîyê ji hev çî ye? Naziyan Elmanyayê, Fransî, Polonî û Rûs di kuştin, lê zimanê wan, kultura wan, toreyan wan qedexeyê nedikirin û neteweya wan înkare nedikirin. Tirk ne tenê kurdan dikujin, ji arêna dîrokê radikirin, li nava çavên kurdan dinîhêrin û dibêjin; hûn nîn in, hûn pûç in, hûn bê nav in, bê binyat in, bê nav in, bê nasname ne. Ev zilmkarî ji faşîzmê jî diwartir e.

Îcar: nivîskarê Polonyayê Romain Gray, di pirtûka “Partîzan Nadejda” de dibêje:

“Kî naye jîbîrkirin, ew jî weke evîne ye... Ez baş dizanim kî çî ye... Elmanan kî bi min dane fêrkirin. Dema ku bavê min û dayika min kuştin, ez ti û birçî mam, di binê axê de, di xêşman de jiyam, hingê min kî nas kir...”

Ev siyaseta e û Romain Gray li dijî kujerîya faşîzma Naziyan kîna xwe vedirîşe, şerê gotinê dike.

Nivîskarê Emerîkanî Ernest Hemîngway, di pirtûka “Nakos Ji Bo Kê Lêdidin” de dibêje:

“Kî dixwaze di artêşê de bimîne? Em ne ji bo ku di artêşê de bimînin şoreşê dikin. Ez ji bo şer heme, lê ji bo artêşê nîn im. Şerê me yê niha li dijî dagirkeran e.”

Ernest Hemîngway di heman pirtûkê de dîsa, dibêje:

“Ew hatine ku me bikujin, balafirên wan jî, ji bo vê di ser me re dirêsin. Ji bo ku em di şer de serbikevin, divê ku em wan bikujin. Ev rastiya şer e.”

Ernest Hemîngway, di şerê navxweyî yê Îspanyayê de siyaseta dike û destê komargeran digire.

Nivîskarê Rus Şolohov, di pirtûka “Dona Rawestiyayî” de niyazên Qezaqan, ya li dijî şer, ya ji bo şer û ya ji bo êrîşê gotin bi gotin dinivîse û di rûpelekê de dibêje:

“Rûsya dikeliya, ji şahdamarê Rûsyayê, xetên hesinî yê trêne, ber bi rojava, xwîna bi qapûtê gewr zerk dikir... (...) û cengawerîya Qezaqan wek destaneke şer dihat gotin.”

Şolohov jî, Qezaqan wek rûmet û hêza Rûsyayê dibîne. Ji ber ku welatê Şolohov û azadiya Şolohov bi destê wan Qezaqan hatiye parastin. Li vî nirxî xwedî derdikeve.

Balzac... Weke nivîskarê ku çarenûsa romana cîhanê guhertiye û kesê ku sosyolojî kiriye romanê tê hesibandin. Di dawîya romana “Gulşîra li Gelî” de dibêje:

“Lîstikvanên mezin û helbestvan, ne tenê ji bo xwe çîlêyê dikişînin, hêz û tixûbê hêrsa xwe û hişmendiya xwe fireh dikin, ji bo welatê xwe, ji bo dahatûya gelê xwe dijîn û xwe dikin mahkûmê/a tenêtiyê. Pêdiviya wan bi evîneke fedakar û paqij heye.”

Ligel Balzacê ku di her romana xwe de, otopsiya jiyana û tevgerên civakî dike, evîna paqij û fedakar, Fransa û gelê Fransayê ye.

Çernîşewskî... Romana “Divê Em Çawa Bikin”, di girtîgehê de û di 4 mehan de nivîsî, lê romana

wî, ji bo ciwanên wê demê bû manifestoya siyasî. Çernîşewskî dibêje:

“Îro, ji bo mirovêkî nû, bi dehan mirovên kevnepe-rest û paşverû dikevin. Lê çi ji destên me tê; li cîhana paşverû û berjewendîperest, mirov jî wê paşverû bin.”

Ev têkoşîna li dijî sîstemê ye û bi gotinê siyaseta herî vekirî û zelal dike.

Bê guman li cîhanê jî, heman pîrsgirêk derketine holê. Nexasim di heyama zimanên neteweyî de, ev pîrsgirêk bûye sedema diwariyên mezin.

Îvan Popov, di pirtûka “Sîbeha Şer” de, dibêje: “Heta niha, min nizanibû ku hûn serbaz jî, qebûl dikin ku kesên ne esîlzade jî, ji bo jiyaneke bi rûmet têdikoşin. Gelo bi rastî hûn pêşerojan diparêzin? Hûn li paşerojên welatê me qet nafikirin? Naxwe hûn ji bo kîjan dahatûyê têdikoşin?”

Ev gotin, siyaseta e û şerê li dijî hêzên esker, ku tenê mîrzadeyan û sîstema serdestan diparêzin e. Berdevkiya cemawer e û bi serbilindî gotina “kesên ne esîlzade” jî dikarin ji bo jiyana bi rûmet têkoşînê bikin, dike.

Li Îtalyayê li dijî serdestiya zimanê împaratoriya Romaya Latînî, 350 salan şer hatiye kirin. Bê guman şerê zimanê gelê îtalî, ji aliyê nivîskar, rewşenbîr û siyasatmedarên îtalî ve hatiye kirin. Nivîskar û rewşenbîrên îtalî di bin sîwana “Academia della Crusca” de, kom bûn û îtalî kirin zimanê edebiyatê. Li Fransayê, ji bo zimanê Fransî, li her navçe û bajaran bi dehan akademi hatin damezrandin. Kombûn û civatên ku wek akademi hatine binavkirin jî, li malan pêk hatine û çend nivîskar û rewşenbîr hatine cem hev; li ser ziman û kulturê guftûgo dane destpêkirin. Akademiyên Fransa û Îngiltereyê, pêşîn wek salonên jîmnastîkê derketin holê. Li Fransayê Akademiya herî kevn, di sala 1629’an de, ji aliyê sekterê Kral, Conrad ve û li malê hatiye saz kirin. Conrad hevalên xwe, heftê du rojan li mala xwe kom dikirin, li ser kar, kultur, siyaseta û edebiyatê nîqaş dikirin. Piştî, ji aliyê Kral Louisê XII ve hatine erêkirin û rêbaza 50 xalî hatiye amade kirin. Balkêş e ku parlamena hingê ya Fransayê, ev rewşenbîr û nivîskarên ku hejmara wan 10, 12 kes bûn wek rakîb dîtine. Bêguman parlamento, ne ji hêza 10, 12 kesan, ji hêza gotina wan ditirsîyan. Yanî, erka siyasî û edebiyatê dibû yek. Hinek lêkolîner û zanyar jî dibêjin, Lousî XIII, li hemberî siyasatmedarên ku nikaribû lixaba wan bişidîne, hêza edebiyatê bi kar anî.

Balkêş e ku, 10, 12 nivîskar û rewşenbîran nizanibûn çi bikin; piştî ku hejmara wan bû nêzikî 40 kesî, Akademiya Rewşenbîran sazkar kirin û Akademiya Fransayê derxistin holê. Di Akademiya Fransayê de, pêşî xîtabet, pexşanên axaftinê hatin amade kirin. Piştî li ser pêşxistina fransî nivîs hatin nivîsandin û di

encamê de Akademiya Fransayê biryar da ku fransî bikin zimanê hemberî Latînî û Yewnanî. 40 kesî, dest bi amadekariya Ferhengê kirin. Piştî jî grammar, piştî jî retorîk û poetîk amade kirin. Bi van kar û xebatan serdestiya sloganên a li ser zimanê Fransî hate berterefkirin.

40 nivîskar û rewşenbîrên fransî di Akademiya Fransayê de, destîniya fransî guherandin. Pêwîst e were zanîn ku di pêşketina îtalî û fransî de, hêza edebiyat û siyasî her dem ligel hev kar kir. Lê edebiyata Fransayê û Îtalyayê terbiyekirina siyaseta ji destên xwe berneda.

Di Şoreşa Fransayê de jî, edebiyat û siyaseta ligel hev kar kirin. Edebiyatê bi nivîsên ku slogana: “Serketin, giyanê lewaz radizîne, giyanê bi hêz şiyar dike” kar û xebat kir; siyasatmedarên ku pêşengiya şoreşê dikirin jî, bi slogana: “Pêşî rêbazên rêvebirîya şoreşger amade bikin. Lê kontrola gel jî ji bîr nekin” kar û xebat kirin. Pêşengên Şoreşa Fransayê, digotin: “Pêwîst e di amadekirina destûra bingeşin de, welatparêz werin parastin.” Rewşenbîr û nivîskarên Fransayê, mecbûr kirin ku, welatparêzan biparêzin. Ji ber ku her welatparêz, bi qasî rewşenbîran, bi qasî siyasatmedaran, sûdgirtina ji dewletê “heq” kiriye.

Ya rastî ev gotin manîdar in û ji bo nivîskar û rewşenbîrên kurd jî mînakên balkêş in. Nivîskar û rewşenbîrên cîhanê li mala xwe ranewestiyane û tenê pirtûk nenivîsîne.

Rewşa doh û cudatiya îro

Gelê kurd doh, di îro de dijî, di îro de jî, ji bo sibehê têdikoşe.

Gelê kurd, neçarî, bêzarî, êş û azarên doh, îro jî dijî. Gelê kurd, di pêr û doh de, ji bilî kirasê ku dijmin jê re qaz kiribû, wî jî gelek tişt li wî kirasî zêde kirin û li xwe kiribû. Vê rewşê, prototîpek derxist holê. Ev prototîp, ji demê, ji dewranan û ji dîrokê, ji tevgerên civakî qut bûbû. Di cîhana gewrik de dijî, kilîmatên demjiyanên salê dijîn, roj û şev û meh û sal û demsal didîtin, lê bi her qevastin û çûna demê re gaveke din ji nîrxê xwe dûr diket û li paş dima. Wek emanet û mêvanekî/ê li ser cografyaya xwe dijî. Li ser erda xwe û di dîrok û kultura xwe ya qedîm de, derwêşî dikir. Kesayetiyeke ku nema dikare bersivê bide netewetiya civaka xwe. Bedeneke ku seriyê li ser wê bedenê, tenê ji bo kar û xebatên rojane, ji bo feodalîteya ketî kar dike, mabû.

Dijmin di bedena kurd de rûniştibû û tîrsa xwe di çav û dilê kurd de bi cih kiribû. Ev sîstema ku bi îdeolojiya “solîdarîst” hatiye honandin, ji hevsenga civakî bêhtir, faşîzma veşartî bi hêz kir. Ev qalibê ku bandor li her eniyên civakê dikir, pêşî rewşenbîr, entelektuel û nivîskar pelixandin. Ev çîna ku her dem ligel pêşengên

şoreşan cih girtiye û di şerê azadiyê de ligel gelê xwe, roleke erênî lîstîye, ji eyarê wî derxist, di eyarê îdeolojiya fermî ya dewletê de rûnand. Helbet entelektuel û rewşenbîriya kurd jî, bi zêdeyî para xwe ji vê îdeolojiyê stand. Înkare jî, dûrkişîneke ku tenê derfetên pêşbazîya xizmeta dagirkeran dida afirand. Siyaseta înkare, bi gelek cûreyên helandin, fetisandin, ferfitandin û mirina bi saxî xwedî kir. Êdî dûrketina ji nasnameyê û ji kesayetiye dest pê kir.

Abdullah Ocalan ji bo vê rewşê dibêje: “Erê kurd dijîn, lê jiyanêke çawa? Hebû lê hebûneke li ber tunekirin û têkçûnê.. Li hemberî rewşeke wiha, yek rê dima, ew jî şer bû.”

Tenê şer dikaribû kurdan ji vê bextreşiyê xelas bike. Lê na, ji bo kurdên ku tenê bedeneke rizî û birîndar mabe, tenê şer ne bes bû. Eger şer têra guhertin û ji nû de sax kirinê kiribûya, Serokê Hareketa Kurd Abdullah Ocalan, gotina “Şoreşa me, ne tenê şoreşa siyasî ye, lewma me tenê rîya eskerî ne bijart. Me humanîzm, nêzîkbûna insanî bijart. Me ji însên dest pê kir. Mînaka vê jî, di nîrxê ku me daye jinê de xuya dike. Ji bo me azadiya jinê, azadiya civakê ye.” nedigot.

Abdullah Ocalan, bi gotina: “Kurd heye, biqasî dîroka mirovahiyê kevn e. Dîroka ji destpêkê, hatina heya bi îro ye. Di vê çarçoveyê de, kurdîti, çirokeke girîng a mirovahiyê ye” bingeha netewîyet, îradeya siyasî û xwedîderketina li nîrx û pîroziyan jî ava kir. Pîrozî li ser pîroziyan, nîrxê herî mezin e.

Abdullah Ocalan nikaribû bibe Gandhî û Gandhiyekî jî nikaribû, li hemberî faşîzma veşartî ku şerîateke tirkîti sazkar kir tîbîkoşe û bigihê encamê. Mînaka Mûsa Anter li meydana ye. Mûsa Anter, dipişkiya digirtin, dibawîşkî digirtin, dikuxiya digirtin, dikeniya digirtin, digirîya digirtin. Gelo Mûsa Anter, ji bilî feylesofîyeke civaka kurd, rîyeke din bijartibû? Mînaka duyemîn, Faîk Bûcak e. Parêzer bû û di sekreterîya PDKê de jî, mirovekî wek Gandhî bû. Ne çekdar bû, ne jî hêza wî ya eskerî hebû. Lê kuştin. Bûyera 49’an ku tev xwendekar bûn û hatin girtin jî mînaka sêyemîn e.

Mînakeke din: Şêx Maşoqê Xiznewî! Ji sedema ku, di axaftina li hemberî gel de, xwest ku gelê kurd li nasnameya xwe xwedî derbikeve, ji aliyê dewleta Sûriyeyê

ve hate kuştin. Şêx Maşoqê Xiznewî, ji Gandhi Gandhitir bû û bawerî bi “rastîya rastî ya îslamiyetê” anîbû û jiyana bi rûmet û bi nasnameya xwe û di nava biratî û hevkarîya parvekirineke bi rûmet de diparast. Lê olîgarşîya faşîst a Sûriyeyê, piştî du axaftinên li pêşberî gel, ew bi êşkencê kuştin.

Mebesta min ji van gotinan ew e ku li Kurdistanê, di nava hoy û mercên kujerîya îdeolojiya fermî ya sîstema faşîst, ku bingeha wê ji aliyê Îttîhad û Terakî ve hate danîn de, têkoşîna Gandhîwarî, nikaribû îradeyeke siyasî û civaka li ber têkçûnê ji nû de biafirîne û zindî bike.

Di qonaxêke wiha de, şerekî ku bi çek dest pê kir, hêdî hêdî ber bi têkoşîna siyasî herikî; piştîre bi têkoşîna civakî qonaxêke din bi dest xist; piştîre têkoşîna medyayê da destpêkirin û di encamê de, şerê kulturî kire pratîkê. Ev qonaxên ku bûne xelên dagirtina valahiyên demên cuda yên dîrokê; bû nasnameya şoreşê.

Di şoreşa ku qonax bi qonax û hiş û ramanê parzinandina ji deh hezar salan felsefeyek hate derxistin; ji wê felsefeyê jî sîstemek hat afirandin û di

nava demê de kesayetiya Kurd, mêjiyê kurd kir nava guhertinê. Di vê guhertina bedenî û mêji de, dibistanêke giştî, li qadên çiyê û li qadên gund û bajaran, li kolanan, li meydana hate avakirin. Her Newroz bû Akademiyeke Eflatûn. Li Qendîlê, di axaftina min û Mûrat Karayilan de, Karayilan, di nava axaftinên xwe de got: “Tevgera me, her qada jiyanê, her tevger wek perwerdehiyekê derxist pêş. Di xeta Serokatîyê de, me jî, her tevger nîrxand û şîrove kir. Vê yekê û nîrxandin û şîroveyên felsefîk yên Serokatîyê, di hiş û ramanê gelê kurd de têgihiştinek çekir. Di nava demê de jî, civaka kurd ji apolîtîkiyê xelas kir.” Dema ku min ev gotin di deftera xwe de nivîsîn, Murat Karayilan got, “Ev karê rewşenbîran e, pêwîst e rewşenbîr gel ronî bikin.” Ev gotin jî gazin bûn. Ez jî vê gazinê dubare dikim.

Di yek şoreşa cihanê de, mijara wekheviya jin û mîr nehatiye rojevê û di nava herka guhertinan civakî de, li ser nasnameya her du nîfşan, perwerdekirin nehatiye kirin. Ji bilî şoreşa kurdan.



Helbet, vê perwerdehiya giştî, bandor li rewşenbîrî û entelektueliya kurd jî kir. Weke her tiştî, pêşketina rewşenbîrî pêşî di aliyê siyasî de derkete holê. Li Ewropa yê hejmarek derketibe holê jî. Nasnameya hemû gruban siyasî bû. Lê di nava demê de û piranî piştî medyaya alternatîf derkete holê, rewşenbîrî û entelektueliya kurd derket pêş û di aliyê sazîbûnê de tevgerê dest pê kir. Ev dihat wateya ku siyasîyê pêşengiya rewşenbîrî û entelektueliya kurd dikir. Ev jî, bû doqîkê ser serê rewşenbîriyê.

Mîrateyeke rêkûpêk ya rewşenbîriya kurd jî nebû. Valahiya di edebiyata kurdî de, nakokîya di navbera siyasî û edebiyatê, rev û nexweşiya di bin navê “bealîtiyê” de jî, berhema tunebûna vê mîrateyê ye. Îdeolojiya fermî ya zilmkaran ev valahî dagirt.

Ew texrîbat û şikestîkên di beden, kesayetî û mîjîyê rewşenbîriya kurd de, îro jî rola xwe dilîze. Gotinek heye, dibêjin, “Bi navika xwe bi wan ve girêdayî ye”. Ev nasnameya rewşenbîrî û entelektueliya kurd e. Rewşenbîr û nivîskarên Kurd, ji % çend bi kurdî dinivîsin? Pîvan ev e. Ji % ... çend nivîskar û rewşenbîr di dawa dewleta dagirker de rûniştine? Pîvan ev e. Ev bêbextiya li bextê gelê kurd e. Ev bêbextiya li bextê xwe ye. Ev “ferageta” jî bîr û bawerî û têkoşînê ye. Helbet ez gelek kesan ji vê gotinê tenzîh dikim, lê nivîskarî ne tenê nivîsandin e.

Bêalîtiya bedcanî, bandor li edebiyata kurd, li weşangeriya kurd jî kir. Û her du baskan xwîna reş mîstin.

Gotineke ku pirr tê bikaranîn heye, dibêjin: “Civaka kurd, li pêşiya rewşenbîr û entelektuelên xwe ye.” Ev navê tecrîdkirinê ye.

Encam û wijdanê şiyar

Berî her tiştî, rewşenbîr û nivîskar, li hemberî bûyeran, wijdanekî şiyar e û normên xwe ew bi xwe ava dike. Bê guman normên rewşenbîriya total a cihanê hene. Lê rewşenbîr, her dem ne mecbûr e, li gorî normên giştî tevbigere. Ji ber ku rewşenbîr, nivîskar qaliban dişikîne û tara bêjîngê red dike. Edward Shîls dibêje: “Rewşenbîr, nivîskar mecbûr e, kultureke bilind sazkar bike û belav bike.” Mann Heim jî dibêje: “Nivîskar û rewşenbîr mecbûr e li nîrx û pîrozîyên civakê xwedî derkeve. Ji ber ku ew nîrx û pîrozî malê mirovahiyê ne. Pêwîst e rewşenbîr û nivîskar paydeyeke ku ji bo dahatûya civaka wan û mirovahiyê sûdewar be jî biafirîne.”

Dewletên dagirker, rewşenbîr û nivîskar, wek memûrên ku îdeolojiya fermî pêş bixin, bi hêz bikin û belav bikin dibîne û xwest ku “edebîke” wiha jî bidê wan. Reva Ibn-î Xaldûn ya jî “atêş-î suzan” jî ber vê ye.

Mirov, xisletên Ibn-î Xaldûn, di rewşenbîr û ni-

vîskarên Rojhilata Navîn de kêmbûne. Ji ber ku, bandora Îslamî û rejîmên olîgarşîk yê netewedewletê ew fetisandine.

Em li mînakên Tirkîyeyê binêrin:

Nazim Hikmet, qurbanê îdeolojiya 6 tîrên CHP'ê ye. Baş tê zanîn ku piştî 6 tîrên CHP'ê di destûra bîngêhî de hatin bicihkirin, kanûna Takrîr-î Sûkûn hat derxistin û rewşenbîr, nivîskarên Tirkîyeyê bûne kêlika desthilatdariyan. Di darbeya faşîst a sala 1980'yî de jî, bi sedan hunermendên weke Yılmaz Guney, piştî şerê 30 salî ya Tevgera Azadiya Kurd ku gelek tabû û dîwar hatin hêrifandin, rayedarên dewleta Tirkîyeyê; wezîr, serokên partîyan, dema diçin Fransayê, gorên van hunermendan ziyaret dikin; yê ku diçine Rûsyayê jî, gora Nazim Hikmet ziyaret dikin. Balkêş e ku ev wezîr, serokên partîyan, ji bo guhertina “Kanûna Têkoşîna li Dijî Terorê” ku di dewsa “Takrîr-î Sûkûn” de hatiye erêkirin tu hewldanan nakin. Ev, ji bo xapandina ‘efkar-i umumiye’ ye.

Min li jor, li gelek cihan behsa bexlî û bextreşîya siyaseta li hemberî edebiyatê kir. Siyaset her dem dixwaze ku edebiyatê û hêza gotinê bi kar bîne. Ji ber ku edebiyat giyanê xaka nivîskar radigire û hêza herî baş a gihiştina civakê diparêze.

Siyaset hunerek e û di roja me de wek zanistekê jî derketiye pêş. Lê di pratîka siyasîmedarên dewletên dagirkerên Kurdistanê de, siyasî aşûfte bûye; siyasîmedar jî melaqî û şeqlubaniyê dikin. Lewma siyasîmedar, dixwaze ku nivîskar û edebiyatê bike mertalê xwe. Gelek caran jî, siyasîmedarên weke serokwezîrê Tirkîyeyê Tayyip Erdoganê demagog, şîretên psîkolojîk li nivîskar û rewşenbîran dike. Freûd dibêje; “Ji bo nîrx û birêziya windakirî, ji bo kesayetiya şikestî, ber bi nivîskar diçin û dixwazin bikin mertal ji xwe re” Dîsa Freûd dibêje; “Li hemberî serketina nivîskar têk diçin û çog berdidin erdê.” Dîsa dibêje; “Amûrên amade yê nivîskar bi kar tîne..” Bêguman Freûd van gotinan ne tenê ji bo siyasîmedaran dibêje; lê di nîrxandina roman û qehremanên romanivîsan de, “halet-î ruhiye” ya xwendekar û kesên li dora nivîskar (siyasîmedar, burokrat, bazîrgan û hwd.) dibêje. Li welatekî ku disîplînekirina nivîskar bi kanûnan hatibe pêkanîn, dirûtiya siyaseta li dijî edebiyatê jî wê di vî rengî de be.

Eger nivîskar, “bîhaqqin” çavdêriya heyama xwe bike, li hemberî bûyer û pêhatîyan, li hemberî pêşketînan “laqayd” nemîne, li hemberî kuştina gelê xwe, zarokeyên gelê xwe bîxem nemîne, hingî wê wek dibistana “edebîkirina siyasîyê derbikeve pêş.

Albert Camus, endamê partiya komunist bû û bi milîtanên frans re li dijî naziyan şer kir. Lê hêza pê-

nûsa xwe wek “wijdan-î hibriye” ji bîr nekir. Keza dî-rokzan û feylesofê Îngilîz George Thomson, endamê partiya komunîst bû, lê heza hişmendiya xwe ji bo “edeb”kirina siyasetmedaran ji bîr nekir. Divê ku em siyasetkirina nivîskar di endametiya partiyekê de ji ne-bînin û nenirxînin. Siyaset ne cihgirtina di partiyekê de ye. Siyaset parastina nîrxên civakê û cografayê ye. Siyaseta rewşenbîr û entelektulên kurd, a nivîskarên kurd; parastina dar û deviyên Kurdistanê ne, parastina ax û av, darmêwe, sewal û dewarên Kurdistanê ne, parastina zarokên Kurdistanê ne. Kes ji nivîskaran, ji rewşenbîran naxwaze ku rahêjin çekê; lê her kes ji wan dixwaze ku pê nûsa xwe, qelema xwe ji bo nîrx û pîrozîyên civaka xwe û cografyaya xwe bi kar bîne. Eger, nivîskar vê rastiye di bin navên cuda de red bike; xwe erzan dike û xwe dûrî elaq û “wijdan-î hibriye” dike.

Helbet, nivîskar ne mecbûr e bibe endamê/a partiyekê, lê mecbûr e ku siyasetê ji siyasetmedaran re ji nehêle. Yanî siyasetê bike. Romanên G. Sand, ji aliyê Marks ve, di pirtûka “Sefaleta felsefeyê” de têne pesinandin. G. Sand, di sala 1948’an de, dibe berdevkê desthilatdariya dema xwe. Lê, di romanên xwe de, tevahiya hişmendiya dema xwe di romanên xwe de bi kar tîne. Naûm Chomsky, ne endamê partiyên siyasî ye, lê li Stenbolê dewleta Tirkîyeyê û kiryarên li dijî gelê kurd bi tundî rexne kirin; li Emerîkayê, bikaranîna hêzên bazirgan ên li Afganîstanê, yên li Iraqê bi tundî rexne kirin. Keza Edwar Saîd... Hemberî ku dibêjin, bi zarokên filîstîniyan re kevîr neavêtine, fotografê wî li ser bergê pirtûka wî heye û bi zarokên Filîstînî re kevîr diavêje hêzên çekdar ên Îsraîlê. Guman tê de nîn e ku Vîktor Hûgo, zarok û xizanên dora Parîsê nenivîsiya, nedibû Vîktor Hûgo. Yan jî Balzac, eger ji bûyerên rojane û guhertinên civakî derneketiba rê; wek bavê romana cîhanê, wek nivîskarê ku sosyolojiya çinan û psîkolojiya civakan afirandiye dernediket holê. Balzac wek zaroka civaka xwe hatiye binavkirin. Ev payeberziyeke mezin e û tê wateya ku çavdêrî û berdevkiya dema xwe kiriye. Û bûye navê çarenûsa cografyaya xwe.

Romana Rûsyayê, bi giştî Tewrata gelê Rûsyayê ye. Bûyerên dramatîk û li dijî çerxa feodalî ya çarîtiyê şerekî dijwar dide meşandin. Hemberî ku civakek nexweş derxistine holê jî... Lê civaka nexweş a gelê Rûsyayê, nexweşiya di bedena çar, feodalîzm û monarşiyê de ye. Maksîm Gorkî, di Şoreşa Oktobirê de cih digire. Piştî serketinê, nabe amûrê “hîkmet-î hukûmet”. Bi salan sergorkîrî dimîne.

Ev tev didin xuyanî ku aktorê dîrokê, hiş û ramanê mirov e û nivîskar jî ew hiş û raman e.

Byron, bi Goethe û Hûgo re, dengê nû yê Ewropayê ye. Byron li dijî dagirkeriya Osmaniyan şer

kiriye û hatiye kuştin.

Van nivîskarên ku siyaset, ji siyasetmedaran re nehiştina, li dijî zindana cîhanşûmûliya cîhanê, magazîna edebiyata welatê xwe û di vê çarçoveyê de ya cîhanê jî sazkar kirine.

Şaşîtiya nivîskarên kurd di vir de ye. Ji ber vê jî, pîvan û çarçoveya edebiyat û siyasetê wînda kirine û her tiştî tevlihev dikin. Qet bîr nabin ku, hevsenga Kurdistanê, hevsenga civaka Kurdistanê û hevsenga edebiyata Kurdî, teva tevlihev bûye. Dijminên dagirker, kevîrên avaniya pîramîda hevsenga cografayê, civaka kurd û kultura Kurd, bi berê tankan, bi berê topên hewan û obusan ji hev de bedidandine. Xuya dike ku nivîskarên kurd, hem dîroka kurd baş nizanin, hem jî bûyerên rojane yên li Kurdistanê naşopînin. Mîrov naxwaze bêje ku, tîkiliya organîk a nivîskarên kurd bi rastiya kurd û Kurdistanê re nîn e. Ev tewanbarîyeke giran e û ez tevan “Tenzîh” dikim. Pîrs: Gelo çima hewqasî ji siyasetê ditirsin û ji siyasetmedarên kurd direvin? Siyaset ne îdeolojî ye û kes nabêje, bila teslîmî îdeolojiyan bibin.

Divê ku em ji bîr nekin, Barres, li Fransayê bi romanên xwe dixwaze ku neteweparêziyê bi hêz bike. Ji sedema ku îdeolojî û rûmeta mirov tevlihev dike sernameve. Lê A. France, li dijî îdeolojiyan, rûmeta mirov diparêze. Lê her du jî sosyalist in. Tevli siyaseta rojane nabin, lê wek bavê hiş û ramanê dema xwe ne. Proûst, bûyerên rojane, roj bi roj dinivîse. Piştî Camus û Sartre, romanên îdeolojîk dinivîsin. Lê yek ji van romanivîsan, ji “magazîna edebiyata cîhanê” bêpar namîne û her yek ji wan, çarenûsa cografyaya xwe û gelê xwe bi çarenûsa xwe ve girêdane.

Ev deryaya ku têra her cure hişmendî û hewngîriya nivîskarên cîhanê kiriye; guman tê de nîn e ku, wê hişmendî û hewngîriya nivîskarên kurd jî, di nava xwe de ragire.

1. *Bîrdoza Dojehî: Di zanista aborî de wek bîrdozekê tê xwendin. Gel, ji pîşe û hêza afirgeriya aborî tê dûr kirin û mecbûrî karkirina rojane tê kirin. Pîşesazî û karbidestiya malbatî tê kuştin. Dema ku pîşe û huner ji destê endamên malbatê hate standin, lewaz û feqîr dibin û dikevin tara bêjîngê. Nikarin zarokên xwe jî bidin xwendin û wek çavkaniya artêşa karkeran li holê dimînin. Zarokên wan jî karkerên pêşerojan dimînin.*

2. *Bîrdoza Tevnepîrkê: Di heman çarçoveyê de li dijî civakan tê bikaranîn.*

3. *Necîb Fazîl Kisakurek, helbestvan, romanivîs, çîroknivîs, teatronivîsekî tirk e û wek pêşengê hişmendiya nijadperestiya tirk jî tê naskirin.*

4. *St. Beuve (Charles Augustin Sainte-Beuve) : (1871-1922), nivîskar û feylesofê Fransî ye.*



Mizgînxêrk 'ek'




Xecê OMERÎ

Miçiqî man çav li dû çûyînên stûxwar de
 Êdî xencerên kevzgirtî ne mijgul
 Li hingurên rojhilat
 Zêmaran dibilîne ziman
 Bi hebûneke nepen
 Ji xatirxwestinên xwesî di ber de mayî re
 Lêê keskesora min!
 Lêê derengmayiya min!
 Tu yê piştî çend barînen biharî
 Biçirise li asîmanê min?
 Wê çi wextî bi mizgînxêrkên tavên nîsanê
 Bizinge guhên min?



Şev e



Dilşêr BÊWAR

Îşev
 kuştîyekî newala Hişkiyan bûm
 di valahiya çavên te şevemerê de.
 şanikeke di dilqê bavê xwe de bûm
 li ser kurşeyên singê te

bavê lalo, zû terikand govend
 bîst û du kanî herikin
 tîna qiriktehliyê neşikiya

lorîna min
 çirayên xemgîniyê vemirîne
 porê xwe yê ji tariya şevê derçûye
 ji mij û toza salan dawêşîne
 dengê xwe yê mîrate yê bêkirasane
 ji kalanê rizyayî werîne der
 bi newaya xunava berbîskan re
 li ser termê kedera min, de bilorîne yar....

Kurtejiyana Eluard

Eugène Grindel ango Paul Eluard ê fransî di 14'ê kanûna 1895'an de li St. Denîs'ê hatiye dinê û di 18'ê Mijdara 1952'yan de li Parîsê çûye ser dîlovanîya xwe. Eluard ji aliyê rexnegirên wêjenas ve ji ekola dada û surrealîst tê nîrxandin.

Di Şerê yekemîn ê cihanê de di eniya şer de bû û bîrînên xwe yê der barê şer de di pirtûka xwe ya bi navê "Le Devoir / Peywir" de kite bi kite vegot. Piştî şerî pêşî di nav ekola dadayan de dûre ji di nav ekola surrealîzmê de ji xwe re cih çêkir. Di şerê duymîn ê cihanê de wekî helbestkarê berxwedêran hate

nasîn. Di nav trajedî û gengeşîya şer de helbesta xwe ya herî navdar 'Libération- Azadî' di 1942'yan de nivîsand û ev helbest di nav çeperên berxwedanan de çeper bi çeper hate xwendin û bû raz û sembola berxwedanê. Di heman salê de pirtûka xwe ya bi navê 'Poésie et Vérité- Helbest û Rastî' di bin destan de bi dizî belav kir. Piştî ku Fransa gihîşt azadiya xwe ango di şerê li hemberî naziyan de bi ser ket navê Eluard ji pê re pê re belav bû. Helbestkarê evîn û azadiyê Paul Eluard di sala 1952'yan de di encama krîza dil de jiyana xwe ji dest da.



Helbest

Delala min ev li pey bişîrîna te;
Gotinên evînê bi tevahî şîfîta zî ne
Bi serê pêsîrên te digrin û dertînin gerdena te,
Navtenga te û bibikên çavên te
Dûre li ser navê mizdanê çi hebin
Ewan tevan dibînin û dertînin der
Dema ku te ji çavên te diramîsim
Tenê ji bo ku tu bibînî
Ev peyvên mişt evîn lê barkirî

Gel

Gel im ez,
Ewên ku nayên jimartin,
Ew gelê ku ji pîr pirtir e.
Hêz û qeweteke hilma min heye ku
Diqelêşim vedîçîrînim bêdengiyê, guh nadimê
Aj didim, bejn didim,
Qet nabêjim ripîreş e şev.
Zilm, êş, mirin, ew, ev

Tarîkirin

Derî û dergê li te hatibin hev
Ku di hundir de mabî tu yê çi bikî
Rê hatibîn girtin
Bajar ketibe destê neyaran
Bîrçîbûne ku dest pê kiribe
Di destan de çek nemabin
Ku şev daketibe
Bi yara xwe re şa ji nebî tu yê çi bikî

Ku veşêrin ji tovê jiyanê,
Wekî miriyan ji xuya bike gel,
Dê roj bizivire û bê meha nîsanê,
Û ax bigihîje bihara xwe,
Destên bi hêrs û kedkar belawela dike hewayaya giran.
Di nav mirinê de şîn dibe û şax dide jiyan.

Werger ji fransewî: Remezan OLÇEN



Biyani

Dibe ku hûn jê bawer nekin
 Lê mirovine ku jiyane
 Bê qeza û bê bela derbas dikin hene.
 Cil û bergên xweş li xwe dikin, baş dixwin,
 Xweş radikevin.
 Ji jiyana malbata xwe razî ne.
 Hin kêliyan xemgîn in
 Lê bi giştî ne aciz in û
 Dilê wan şad e.
 Ê gava ku dimirin jî
 Bi mirineke hêsan,

Bi gelemperî di xewê de...
 Belkî hûn jê bawer nekin
 Lê mirovên ku wisa dijîn hene.
 Lê ez ne yekî ji wan im.
 Na na, ez ne yekî ji wan im,
 Hema bêje ez,
 Dûrî bûyîna yekî ji wan im jî.
 Lê ew li wir in
 Ê ez jî li vir.

Charles Bukowski
Werger: Hesenîkê LELÊ


Neynikê xeyal



Şevê, piştî êvarekê ye wext
 Dem, a jixwegerîne
 Ya xwedîtina min e
 Rûniştîme li quncikê ku heyat
 Mîna ku neynikekê de be
 Xwe bi min dinimîne

Ez li wê dinihêrim ew li min

Di nava wê de dibînim cihê xwe
 Tikîtenê, rûniştîme li quncikekî, piştî min li
 dîwarekî tarî
 Li banê neynikê hilatiye, rûyê wê mîna şew-
 lek hîvê
 Li dorê ezmanekî porê reş
 Di nav de diçirûsin, stêr stêr xweşiyên li dûr



İnan EROGLU

Emrê qeşmer

*“Min meke qeşmerê stêrkan stêrk”
-Rênas Jiyan-*

I

Piştî hevdeh salên xerîbiyê gava biryar da ku wê vegere welêt, ji xwe dipirsî: “Ev hevdeh sal in weke mişextan ji vir diçim wir û ji wir tîm vir. Min ne xeberek ji wan wergirt ne ji xeberek ji wan re şand.”

Na, nedibû! Diya wî hatibû bîra wî. Dilê wî êşiyabû. Ji bo ku tîhna êşa xwe hinekî daxîne, dixwest mistek xwê li çarîka diya xwe biedilîne û bi wê çarîka diya xwe ya ku bi nexşên rengîn xemilandibû li dilê xwe bipêçe. Ew dê bû ku; her roj bi şêhê bavê wî, porê wî yê zerîkî hûr hûr ji hev vedikir û şêh dikir. Gava wê biçûya dibistanê nizanibû berbanek li xwe bikira. Her roja xwedê ew berbaneka reş li ser bû. Beriya ku wê biçûya dibistanê diya wî berbaneka wî bi baldarî lê dikir, destê xwe di serê wî dida û duaya ku her roj beriya ku dest bi karekî bike dikir. Wexta ku wê biçûya dibistanê ji çavên wî yên pisîkane diramûsî, destê xwe li piştê wî dixist, miz dida û wiha lê dianî: “Ş’evdîlqadirê Geylanî bi te re be.” Di berîka wî de her tim çend serî şekirê çayê hebû. Ew û hevalên xwe bi van şekiran dikitin angaş û pêşbazîyan. Gelek hevalên wî, ji ber ku fen dikir pê re nedilîstin. Lê wî li wan danetanî û pozê xwe di nav her gûyî re dikir.

Şevên zivistanê dirêj bûn. Xewa xwîşk û birayên wî zû dihat. Xwîşk û birayên wî ji xwe re vedikişîyan menzelên xwe û radizan. Lê wî ji xwe re kiribû cir, her şev xwe di bin lihêfa dê û bavê xwe re dikir. Her çiqas bavîkê wî berdayê jî, wî li xwe danetanî û bi wan re weke ku bi hevalên xwe re bi şekirên çayê bilîze, dilîst. Lê dê deng nedikir. Ew ber bi xwe ve dikişand, piyê wî dixist nav çîpên xwe, serê wî datanî ser singê xwe û wisa radîza. Bavê wî dikir ku biteqe. Li aliyê din jî dibû hirehira kenê dê û zarokê wê. Gava bavê wî destê xwe biavêta ser zîkê dê, leqayî destê wî dihat. Wê çaxê dibû barebara bavê wî û ji nav lihêfê dipengizî.

“Lê jiyana vir. Xeml û rewşa vir. Min erd û ezman li

xwe hejand. Meriv ji xwe xeyidandin. Hevdeh salan li bendê mam. Hevdeh sal ji bo vê bû?” Li xwe heyirî mabû. Hevdeh sal jê re bûbû hevdeh war. Biçûya ku, bûyerepêk dihat. Ev bûyer dibûn kul û keserên wî. Li kesî nedikir. Li tu deverê nediqedand. Rojên wî bi qeşmerî û berdûşî derbas dibûn. Mîna esrarkêşan her tim çavên wî şil bûn. Mirov ditirsîyan destê xwe pê bikin. Têketa karekî, yan ew û karkeran wê tîketina qirîka hev, yan jî ew û rêvebiran. Gelek kardaran ji tîrsa xwe û malbata xwe kar didanê. Hevdeh salan Ewropa serobino kiribû. Vê neqlê jî Holanda. Holanda jî jê re bûbû derd, wê vegeriya.

Hevdeh sal berê gava piştê xwe dabû welêt û li ber siya sînoran çavgiştîkê dilîst, li pêşeroja xwe nefikîribû. Û bêyî haya malbata xwe pê bixe, berê xwe dabû biyaniyê. Meta wî Rihanê tim û dayîm digot, “Nehêlin ev tîfal mezin bibe” û “Çavên wî, çavên kalîkê wî Mistîkê Etar in.” Li gor ku bihîstibû kalîkê wî yekî serhişk, sersar, cîrnexweş, yê ku her tim bi ya xwe dike û yekî wekî wî ji xelqê direviya bû. Ne ku etar bû, jê re digotin Mistîkê Etar. Ji ber ku di biçûkantiya xwe de ji malê tiştên buha dikirin, didizî, li erebokê bar dikir û bi erebokê diçû gund bi gund digeriya, ev nav lê kiribûn. Diket koxikên xelkê û hêk tê de nedihîştin. Gava ku gundî pê hesiyar ku Mistê hêkan didize, ew li ereboka wî girêdabûn, çûbûn gund bi gund gerandibûn. Dawiyê jî ew li gundekî hiştibûn û vegeriyabûn gund. Malbata wî pê nikaribû, heta ku şevêkê ji çend kesên nenas lêdan xwar, hişê wî hat serê wî. Gava zewicî, te digot qey ew û jina xwe ji heman hêkê derketine. Ne ku wechê wan yek bû. Fihêlên Mistê vê carê jî di jina wî de derketibûn.

Lê wî, çi cara ku diçû ber neynîkê li xwe mêze dikir, tu dera xwe nedîşiband kalîkê xwe. Lê bi vê jî kar safî nedikir, diçû ji kalîkê xwe re digot: “Yabo Misto, hela şalê xwe ji xwe bike, bê qûna me jî dişibe hev.” Dibû hirehira kalîkê wî, zikopiştê dibû û ji xwe ve diçû.

Ew niha li Holandayê, li mala hevalekî xwe yê ji welêt dima. Wê şevê zû xatir ji hevalê xwe xwestibû û

çûbû menzela xwe. Di cihê xwe de nedisekinî. Her li ser çûyîna xwe difikirî. Li ser linga, pala xwe dabû dîwêr û destên xwe xistibû paş serê xwe. Ji ber dîwar leqiya çû ber livîna xwe û weke ku xwe ji ser zinarekî biavêje çem, destê xwe vekir û xwe serserkî çeng kir ser livînê. Weke zarokan bû teperepa wî. Hevalê wî li ser vî dengî hat, li deriyê wî xist û jê pirsî ku ka ev çi teperep e. Wî deng nedikir. Hevalê wî hêdika derî vekir, pirsî çûyî dîsa pirsibû. Lê wî deng her ji xwe nedibir. Jê re werê bû ku razaye. Hevalê wî hat lempeya ber serê wî temirand û çû ser livînên xwe.

Jê re bûbû eqs. Lempeya ber serê xwe dîsa vexist û li wan difikirî. Bûbû himûhima wî. Li emrê çûyî, li xeyala xwe ya ku pênc qirûş nedikir, li wî mamosteyê ku digot, "Min tu afirandiyî. Tu şaheserê min î", li wî bavê ku ji xwe jî bêhtir ji wî hez dikir, li wî emrê ku bi tire-dînî derbas bûbû, li wê yara ku çavê wê li rêya wî xwe xwaribû, dipirsî...

II

"..."

"Kî ye?"

Ev deng ji min re xerîb dihat. Çi fêde ku îro kes li malê tune bû. Gelo, wê kî ew qas bi gurmegurm li derî bixe. Ketibûm nav gumanan. Dilê min ketibû nav tirs û xofan. Di hêlekê de jî dilê min digot veke, ma wê çi pê bê. Gurmegurma derî nedisekinî. Ew kesê hanê bi navê min diqirîya ku ez derî vekim. Niyeta wî tune bû ku ji ber derî veqete. Digot:

"Derî veke, ma te çi zû ez ji bîra kirim."

Ew kî bû. Min ê ew ji ku nas bikira, jibîrkirina çi?! Dilê min digupgupî û hişê min tevlihev û serobino bûbû. Min dua dikir ku bila ne yekî xerîb be. Min bi dudilî destê xwe avêt qufleya derî vekir û bi baldarî qolê derî bada. Rebî, çiqas guherîbû! Por û riha wî ketibûn nava hev. Lê berevajî vêya cil û girêdana wî li serê bû. Bi çavine melûl li min dinihêrî. Roniya tavê ji xwe pê re dadida eywanê. Zor dida xwe ku li ser piyan bisekine. Hal di çokên wî de nemabûn. Jinxala min ew bidîta wê pir li ber xwe biketa. Wê bigota: "Şêrê diya xwe zû ji ser xwe ve çû. Şêr bû çû şer, jê re nehiştin tu der û ber." Weke ku bi tayê ketibe direxilî, diricifî, dile-rizî. Min jê fehm kir ku dixwaze ez wî vexwînim hundir. Tu tişteke nedigot. Meriv digot qey kuliyan zimanê wî xwariye. Wiha ji piya sekinî bû. Ez li pêşberî wî, lê ruhê min li cihêkî din sekinibû. Piştî hevdeh salan min ê çawa ew vexwenda hundir. Min digot, "Ew qas sal ji bo vêya bû. Ji bo rojeke were, ez ew qas sal li bendê mam. An ji bo vê vexwendinê bû?" Di dilê xwe de.

Ketim çepilê wî, min ew anî eywanê, li ser sendeliyekê da rûniştandin. Min jî pala xwe da sendeliyeke din. Em qedera saetekê wiha man. Dawiyê dest bi axaftinê kir. Wê gavê min xwest rahêjim wî şemşaqê

avê, yê li ser maseyê, di serê wî yê gundorî de bipelixînim. Min rahişt şemşaqa, lê ne ji bo wî tiştî. Ji bo ku tasek ava cemidî bi ser xwe de bikim.

Ji min re behsa rojên berê kir: Çima bê hay û xeber ji me reviya û tu xeber ji me nestend. Ez dizanim, poşman bûbû. Lê li xwe danetanî ku bibêje. Min ê ew roj çawa ji bîra bikirina? Em bûbûn benîştê devê xelkê. Di nav cîranan de navno bûbûn. Xalê min pîr bûbû. Jixwe jinxala min piştî wê ketibû berê, nikaribû ji erdê rabe. Kî diçû û dihat gotin dikir. Em di hundir de bi rojan nîvbirî diman. Ji ber gotegotên taxê em nikaribûn herin malekê. Çavê têrxwar û xêrnexwazan li ser me bû. Wan dixwest em xwe tevnedin. Me xwe tevvida diçû ji me. Ez ê çawa...

Xalê min pir li ber vê rewşa xwe diket. Rojekê rabû, got, "Ez ê herim destmêja xwe bigirim." Gava ku ketim binçengê wî, çavên wî şil bûbûn. Li vê rewşa xwe mikur nedihat û alîkariya me nedipejirand. Digot, "Ez hîna ew xortê nû simbêlxwêdandayî me." Lê wî dilê paqij têra wî nekiribû, gotibû "tep" û li erdê ripîrast bûbû. Mirina xalê min, kiribû ku jinxala min ji Xwedê re bike gilî û gazin. Heyf bû ku tişteke ji destê wê nedihat. Piştî mirina xalê min bi hefteyekê jinxala min di nav livînan de, destê wê li ser singê wê...

Min digot, ew digiriya. Min digot, em bi hev re digirîn. Carekê derî lê ket. Piştî wê jî xatir ji min xwest û çû. Ji wê rojê pê de, hew çavê min bi wî ket.

III

Gava ku got, "Ev mîrê min e" ez di cihê xwe de mat mam. Li ber xwe ketim. Li ber wê ketim. Min xwe weke kêzikekê, weke cirdonekî didît. Li ser meytê min qijik û reşêleyan baskên xwe vekiribûn. Kûçik û pisîk bûbûn destbirakên hev, xwe çeng dikirin min. Har bûbûn. Dikenîyan. Ez diricifim. Min digot, bînin. Bînin, çiqas ardûyê vê dinê hebe. Çiqas lihêf hebin, bînin. Teşteke ava kelandî, destek sabûn... Bala min li wî bû. Şêrek tune bû ku bigihîje hawara min. Melayketek nexuyabû ku bi çepilê min bigire û min ji nav lepên wan xilas bike. Çokên min dişikyan. Digiriyan.

Min xwe weke bixaltiyê wê da naskirin. Devê wî li ken bû. Kêfa wî hatibû. Lê tiştê hişê wî serobino dikir: Çima heta niha jina wî qala vî bixaltiyê xwe nekiribû û qet çavê wî pê neketibû. Tiştin di serê wî de diçûn û dihatin lê, ditirsiya ku bibêje. Min jê re îzah kir ku; ev hevdeh sal bûn li Ewropa'yê bûm û piştî ew qas sal, min xwestibû vegerim welat. Ji min xwest ku ez çend rojan bibim mêvanê wan. Min pêşniyaza wan nepejirand û wê kêliyê ji wan xatir xwest. Ji malê derketim. Wê kêlikê weke ku pisîkek li ser çar lingê xwe bikeve, ez wiha li ser çokên xwe disekinîm. Hişê min hatibû serê min, bêhna min fireh bûbû. Tu dera laşê min ne-

diêşîya. Bi çokên şidandî, çavên vekirî, dengê qalind, piştî xûz rastbûyî, gav û tevgerên sivik û bi hêrs min xwe avêt derve.

Ez ê bireviyama. Ez ê çawa li cihekî ku ez hevdeh salan jê reviyabûm bisekinîyama. Di wan hevdeh salan de, dê û bavê min ji kerban koçî dinyaya din kirin. Ez ê çawa li cihekî ku yara ku belaheq li bendê maye bisekinîyama! Wê êdî diya min di zivistanan de hew li ber sobeya germ serê min bişûşt. Wê bi her şûştinê re çu carî negota, "Rehme li dê û bavê Fatimayê, şûştin anî dinyayê."

Ez ê dîsa berê xwe bidim xerîbiyê. Ez ê di oxira dê û bavê xwe de, li welatekî biyanî bimirim. Dibe ku bi guleyên sakûlan bêm kuştin. Sakûl hatibûm, ez ê sakûl biçûma. Lê bila kuştina min li perê deryayekê be. Bila kêrê li ser singê min bixin û meytê min li wir veşêrin. Ji bo ku têr bi ava deryayê werim helalkirin.

Gava ez ji malê derketim û bi kolanan ketim, kal û pîrê wan bi sosretî li min dinihêrîn. Dibe ku ez nas dîkirim. Min ji ew nas dîkirin. Hevalên min ên zarokatîyê. Cîranên min. Silav li min kirin. Ez çûm cem wan.

Ji min re qala wan hevdeh salên çûyî dîkirin. Ji min dipirsîn: Ka gelo, ew qas sal min çi dîkir. Çi tişteki nexweş. Ez ê dîsa li ber biketima. Dilê min digot dev ji wan berde here. Lê min nikaribû. Di bin çavan re li min dinihêrîn. Min digot, ew dîsa dinihêrîn. Ez ê biçûma, wan ê dîsa binihêriya. Wê qofeyên avê li dû min bireşandina, ji bo ku weke avê biçûma û weke avê bihatima. Wê çûyîn di destê vê qofeyê de bûya. Weke avê herikok.

Dengê zarokan ji ber guhê min nedîçû. Dengên listikên wan. Dengên listikên min, ku her tim li kolanan barebara min bû. Lîstina şekirên çayê, weke îro dihat bîra min. Gogê, heftok, xar... Cihekî taybet ê şevên ser-salan li ba min hebû. Şerê ku me li ser sergo dîkir. Şerê bi demançeyan, şerê bi şûrê textîn... Ew çeqlastîkên ku me ji darê tûyan çêdîkirin û em li nav goristanan diçûn seyda çûkan... Çeqlastîkên ku pê pace diderizîn.

Piştî min li welêt, berê min li xerîbiyê. Li ber siya sînoran bêhna xwe vedidim. Dîreqisim. Di destekî min de bombe, di destekî din de mayîn, destê din jî li eniya min, wêneyên guleyan xêz dike.

Şopa çûyînê

Hecî NEHSAN

Jehrava kesera xwe bi ser arana can de dirîjînim. Kilamên rêwîtiyên jandarî di şopa destana xortên rêwî de diherikînim. Ez ê mişextiyên xwe berhev bikim di vê sawgura zerdemî de û biavêjim ber gergeha hibrê.

Rê

Riya ku diçe xwedîtîne.

Hinekî ber bi xwe ve diçim, lê hemû rê tên ber lingên te. Di vê riyê de bi hezar û yek çîrokên xwedîtîne dimeşin. Fêr dibim ku bi gelek awayan heme. Windahiyên xwe di şahênîrînê te de dicivînim. Min ji xwe neparêze û bi keserzuhayî li navlênêkirinên xwe nenihêre. Min ji xwe bipirse, xwe jî ji min bipirse.

Şop

Berf çima dibare? Da ku çûyîn li şûn bimînin? An jî da ku peyv bicemidin di bin lingên egîdiyê de?

Dixwînim, rûpelan tevdidim, peyvan bermeqlûb dikim, hevokan diparîzînim da ku şopên te di dilê xwe de rast bikim.

Dawiya dawîn hîn bûm ku aza jîyanê di hemû jîyan de ye. Bi ku ve diçim li şopên xwe rast tîm.

Nexwe, xwe bi xwe re dibim.

Dem

Nêrînan tewl bike. Peyvan bişo. Hevokan dawerivîne. Wateyan vehûne. Û dûrî xatîrxwestîne biçê. Xêza bêrîkirinê. Dûkela gundên şewitî Û toza rewrewkên xwe daweşîne.

Dûrahî

Berê gotine, "Dûrî korî ye" kîngê raza peyvê li keviya kurmanciya min rawestîya, min korîtiya xwe dit! Jiyînên me li pêş me diçûn, bi wateyên qedexe. Jiyînên min û te hemwate ne. Wekî du kevokên bejî, wekî du kevokên rijî!

Ha, min ji bîr ku bibêjim, bi kurdî negirî, qedexe ye!

Azadî

Tu çavkaniya her peyvê yî, tu behreke navxweyî, kûr û hênîk î. Tu di bin ezmanekî ku timî stêr jê diwerin de dimeşî. Tu rengê rastîn ê lixwe-rasthatînê yî.

Tu li şûna keserekê henaseyeke rewan î. Hezar wateyên rûyê te hene. Lê hatînen te yekwate ne: Xweşjîyan

Deq

Îlhan Samî ÇOMAK

Çardeh roj e li ber valahiya dinê tiliyên xwe diqirçînim. Vajî. Ev bédengiya çilmisîna gulan e. Olana bayê layî velerzînek li peyareyan dialiqe. Toz û dûmana ku radibe ji hîskehîska min e. Sar e. Sar e û artêşên ku dê xwîna min bikelandina dereng mane ji halanan re, ji berberojkên ezmûna çîrûska çavên min re.

Diranên min sîsikên berfê ne.

Diramim, ditewim, difetisim.

Gezikên kulma min deqên gewez dineqîşîne li ser rûyê Hîndistaniyan. Jinên kordunde bê kil in li wê. Li wê Xweda û Xwedawend ji çeman dihesidin

Dengek difetise di bin giraniya bédengiyê de. Masûlkeyên min gefê dixwî, divê ne tenê çiya bila siya wî jî bitewe. Divê di laliyên we yên sifir de navên min bê qelakirin. Û her ku we li wênayên min nihêrt bila ezmanê we bibiriqe.

Av di kefa xwe de gewimiye.

Ez xwe dixapînim. Di kenê min de siwarê Bozê Rewan demsalên yara min geş dike. Ez xwe dixapînim. Bi destê xewnê digirim, di bêrîka min de kevir, diçim baxçeyên kenên zaroktiya xwe. Gemar: Di xeyalên min de ev tam dikemile (Li pêveka 1'ê binihêre)

Siya min hêz û baristana çiyayan e

Deq: Di pişta destê dapîra min de mîna rojekê hatiye neqîşandin.

/Pertavên rojê reşiyaye dest û çavên min jî

Eniya min warê rastî û rasteqîniyê ye.

Ger ku hêrsa min rabe çîrûskên çavê min sonda bav û kalan û hestiyên tebata min ku dane ber kêrê. (Kêr jî ne şûr e.) Dûriya yarê ku dilê min hingaftiye dê bide ber rîman/

Deqên ku li bedena jinên me ne robara jiyane ye û ji wê dengê amûrên muzîkê difire. Ribab, çartar, ney... Delala min! Strana stûyê te, hembêz û gavên te, dawîya bihara te ji min re nav e. Pensê te mijara Xwedê ye. Di eniya te de rojek vedide. Hespên bê

zîn û bê nal dibezin. Xuya ye afirîneriya min ji xuşîna rondikên te ne. Xuya ye gotinên te dirêj e û min werz û avhewa xapand û noqî roja eniya te bûm û ...

Deq: Ez tîpeke bêkes im di romana neçapkirî de Dibe ku xwe bidêrim û cudahiyekê peyda bikim Dibe ku li ser bêderan dest bi stranê bikim “Hey dêran dêran dêran...”

Ez tîpeke bêkes im, M me

Werdigerim dibim Sosin

Di her rûpelekê de dêmên yarê dipestim û bi bêkesiya xwe tayên porê xwe spî dikim

Dibêjim werin em velerzîna mûman

Werin em bisk û keziyên rindan

Berê hez bikin paşê bikerixin

Ez tîpeke bêkes im

Min navê xwe paqij kir

Ji vir heta heyvê êdî ez Ferat im

(Li pêveka 2'yemîn binihêre)

Deq: 1- Divê her kes bangewaziya pêşeroja xwe bibe.

/Min bi pêşa dayikê digirt û jiyan diceriband.

Roja min kin û bê tîn bû./

2- Di perwaza daçekên hevedudanî de em ê rengê payîzan reş bikin.

3- Hîrehîra hespan e. Peşkên baranê li çardaxa min golek çekiriye. Îskana min diderize. Bayê reş kenê min dikoje.

4- Min got divê te maçî bikim, te got di taldeyê de, di taldeyê de...

5- Tenêti zengeke spî ye lê ku bête parastin

6- Di xesîmiya min de xofa çivîkan veşartîye.

/Bi perên dîniyê xwe tazî dikim.

Wey pêêê dibê mirin

Jiyan di deştên xwe de dibê wey pêê

Rûyê xwe diqusînim û kela xwe di serê dilopek av de vala dikim/

7- Yezdan îro mirovatî xuluqand

Hirmijînek ji min dertê!

Deq: Bilûra berxvanan e.

Lê divê di serî de bi kêrê bê kunkirin. Piştî vê divê hilceniqîna rojên sayî bête jiberkirin. Ger pelên titûnê û henaseyek boş jî hebe, bilûr jî hemû stran jî dimirin.

/Ez zarokêkî xweşik bûm. Di bêrîka min de sîsi-

kên petîxan bi hurmegurm dimeşiyam. Kulma min qasî hêka mirîşkê bû. Di nav dehlan de hînî tenê-tiyê dibûm. Di bêrika min de kendal hebûn. Balindeyên serayan ji bo ceribandina firîne bi derenceyan hildikişiyên bêrikê... Min diranên hemûyan kişand, per û baskên wan dan payîzê.

Di dilê min de gir û rika serdestan ji wê demê ve ye rabûye./

Pêvek -1-
Min dilê baranê rakir baranê dilê daran.
Av rabûye buxzek difire. Dengê mijê tê.
Cihûyek şiyar dibe, dest bi zûrîne dike wawîkek.
Di bin guhê min de li daholê dixê bîjîyê bîjî
Ji ezmanê devê min xwîn diçilke, tameke xav gîj dibe li ser zimanê min.

Agirê kurtêpistê tehtên dilê min dişewitîne
Gedeno!
Bihuşt min hîn nezayî ye
Gedeno!
Bihuşt min sêdara kefa destê yarê ye
Ka ez ji we re encama şikestina parxaneyên xwe vebêjim.

Di hiş û hinavê min de dem vezeliya
Di hiş û nêrînên yarê de dem perçivî
Gerçî peyrevên gerdana min ji maçên delala
min peritiye û zengelorka min hildikişê qatê gulan
A rast ez westiyame lê betlaneya evîne tune.

Pêvek -2-
Tî bûme
Pendên min ji kevirên temenê min ji tî bûne
Rengên gencîneyan û şûr di kalanan de tî bûne
Nav û nalîna min hinceta hebûna min şîrê diya min tî bûne.

Pişta bayê deqên rojê tîrên naletê tî bûne
Devê biharê nimêja sibê cema şevê tî bûne
Hestiyê miriyan giriye zarokan hevşabûnên dereng tî bûne

Para min naza yarê û gorşêlînkê tî bûne
Çemê Dicleyê, hêmiya hewayê zebeşê tî bûne
Pexşana min şanika yarê jiberkirina we tî bûne
Têbînî: Tola min tî bûye

NABIM

Tîrêjên rasteqîniyê dundeyên xwe neqîşand
kenê devê min.

Diçim.

Diçim ku divê bi hênika hiya bedena min devê masiyan bête şilkirin.

Radibihîsim.

Pêlên çeman li benda xeyidîna min in.

Ez gorî li bendê nemînim, zarokên min dîrokê de xeniqîne, nema tîm.

Ez gorî xwe rabigirin, newqa min di ava şêlû de ye

Belkî şerma min dipişke we

Hene;

Hespên bê nal avjênîyê dizanin, hene.

Hene, ji mirina min re çepikan lêdixin, hene

Zeman xofa zanîna min e

Radibim û devê xwe didûrim. Giriye min ziha bûne, hene...

Nabim!

Ji ber ku niftikên min şil bûne û çîrokên ku çavnebariyê vedibêjin ji bîr bûne. Pêlekana ezman winda bûye, ez nabim. Herikîna avê dengê xwe winda kiriye, nabim. Êdî vexwendina şalûlan bi kêrî tiştek nayê, nabim. Sêdarên tunebûnê dibe mêvanê ciwaniya me, nabim... Henaseyên we vedîçirin, kulîlk dizên, nabim. Kilamên miriyan mîna kûçikan birîna min alastin û laşê min li ber mêtîya jîyanê kirasê mêraniyê li xwe kir.

Bê hemdî hildipeke navê min ji devê berbûkên çiyayan: Hîwa

..... Baş e.

Asîman:

Di nameyên min de rapêçîna avên ku di kulan de winda dibin in. Şopa rika min her ku ewrekî spî ye û tîbûna min ê bi tîna havînê hatiye ganekirin. Wekî pirsek li asoyên dilê min e û daxa dudilîyan dike.

Pîrs, şaristaniya min e.

Çarşî, nehsbûna zarokan e.

Asîman: Min got û peyda bû.

Hevsera min bi guliyên xwe ez dikirim qurbana xwe. Demekê di bihara çavê wê de min got "Bibe!" Berê kûrahî çêbû, piştî di wê kûrahiyê de alema her tiştan.

Stêrkino!

Gul girîng e.

Tol bi ramûsanên jî tê hildayîn

Me wer kir

Lêvê kevîran derizî.

Toq

Mûrat GAZÎOĞLU

Keçikên gund, wê rojê li mala Sebrê civiyabûn û xwe dixemilandin. Hinekan ji wan eniya xwe, hinekan birûyên xwe û hinekan ji wan jî porê xwe bi hev didan çêkirin.

Dengê ken û laqirdiyên wan li derveyê xanî jî dihat bihîstin. Dema li gund yek bizewiciya, keçikên gund çend rojan dev ji kar û barên gund berdidan û xwe dixemilandin.

Bihar hatibû, xwîn dikeliya xwîn...

Bi sehera sibê re gundiyan jî amedekariya rojê nû dikirin. Diya Nazdarê weke ku nexweşekî xayîs bîne ser hiş, giran giran meşka dew dikuland, haya wê ji bayê felekê tune bû.

Şivanê gund keriyên gundiyan dida hev û ji nava gund dikişand û ew ber bi merayê ve dibirin. Zarok, Quranên wan di stûyê wan de, ber bi mizgeftê ve dikişyan û kundekî kor jî li dara ber mala melê danîbû. Mîrat bimîne, bê çawa weke defa hawarê dixwend.

Dengê kund û zarokên ku Quranên wan li ser çokên wan rêz bûbûn û dixwendin, weke şûrê du şervanan li hev diqelibîn. Xêr û şer weke du hespên rewan dabûn berhev.

Diya Nazdarê destê xwe sist kir danî ser dilê xwe. Wê dizanibû ku kundê kor ne ji xêrê re dixwîne. Berê xwe hevraz kir duayek xwend, kund jî nişka ve ker bû.

Mele û zarok ketibûn qayîşê, dengê kundê kor daxistibûn. Elif, dizber-en, duzêr-în, dipêş-ûn. Melê digot û zarokan lê vedigerand.

Keçikên ku ji sibehê ve xwe di mala Sebrê de dixemilandin, deriyê odeyê li Nazdarê venedikirin. Nazdar, xwîşka Sebrê ya biçûk bû.

Keçeke kej û bilind bû, temenê wê di derdora şazdehan de bû. Hemû keçikên odeyê jê dihesidîn. Ji ber hesidînê bû ku nedihîştin têkeve odeyê û xwe bixemilîne.

Jixwe ji ber vê delaliyê bû ku çavê hemû xortên gund li ser wê bû. Ji delaliya wê dihesidîn. Lê digotin tu hîna biçûk î, şerm e ku tu xwe bixemilînî. Çavê xortên gund li ser Nazdarê bû.

Lê Nazdarê jî dil dabû Berhem. Dilekî paqij û bi dizî bû. Dil bû dil...

Porê Nazdarê bela wela bû. Li malê tenê eynikek hebû, ew jî ya cihêzê diya wê bû, ku di odeyê de xwîşka wê Sebrê û keçikên din ji sibê ve xwe dixemilandin.

Nazdarê careke din li derî da.

Got: "Derî vekin."

Sebrê bi hêrs: "Here, careke din tu li derî nedî û me ji karê me nekî ha! Jixwe em ji dawetê dereng mane!"

Nazdar li ber derî qerimîbû êdî, jîvana wê hebû. Wê gaveke din wêd û Berhem hev bidîtina. Dixwest serçavê xwe, porê xwe bide hev, lê eynikek jî tune bû.

Bîra li nav baxçe hat hişê wê. Gelek caran porê xwe li ser bîrê, di şewqa avê de şeh kiribû. Bi kelecaneke dilikî bazda.

Dema li koşê xanî fetilî, dît ku di nava baxçe de, zarokên ku Quranên wan berevajî di stûyê wan de, li ber şibakeyê li keçikan temaşe dikin û keçik jî bi wan zarokan henekên xwe dikin. Henekên ku ji cîwanan re di dilên xwe de veşartibûn. Rûyê wê sor bû, lezand.

Nazdarê gihîşt ser bîrê, xwe tewand, aveke zalal û paqij ku sûretê wê weke eyneyeke paqij nişan dida dît. Çok da, li ser bîrê destê xwe avêt keziyên porê xwe, toqa ku Berhem jê re kiribû diyarî derxist li avê da, xiste nav diranên xwe, şehê xwe derxist, porê xwe da ber şeh.

Ji dûr ve dengê bilûr û erbaneyê dihat. Nazdarê li ber dengê bilûr û erbaneyê porê xwe şeh dikir.

Di wê ava bîrê de, dema li xwe dinihêrî ji delaliya xwe hez dikir, vedibîşirî. Dema keniya, toq ji nav diranên wê yên weke mircanan filitî û ket bîrê...

Nazdarê destê xwe dirêjî toqê kir, lingê wê şemitî, ket. Nazdara ku bi soberiyê nizanibû careke din xwe dirêj kirê, lê zevt nekir. Cardin... cardin... car... Nazdar û toq êdî du rêwiyên binê bîrê bûn. Di binê bîrê de toq ket ser ritamê, ritama ku bi dehan sal e dest lê neketibû.

Destê wê yê çepê heta girmilkê di ritamê de çikiya. Bi destê rastê toqa ku şeveke havînê li ber stêrkên ezmanan bi temborîka wê ve danîbû, hişk zev kir. Nazdar gihîşt toqê, lê dengê bilûr û erbaneyê, kenê keçik û zarokên li ber şibakê hêdî hêdî jê dûr diketin.

Gundê şîrîn

Muhammed HÎCAZÎ

Wergera ji farisî; Cewad PALE

Hevalekî min ku nû li Mazenderanê bûbû xwedî milk, gelek caran, ji bo ku em çend rojan herin gund israr dikir. Digot: em herin, em ê bêhna xwe berdin. Ger sibehê em zû bi rê bikevin em ê nîvroyê bighên gundê Şîrîn Gela. Piştî nîvroyê, roja din û roja dûre em ê li wir wexteke xweş derbas bikin. Tu çi wextî bixwazî em ê vergerin. Hevalê min heta jê dihat behsa xweşiya hewayê wan deran dikir û soza tuwîk dida. Van rojan ez ji rêwîtiyê direvim û tu derê bi xaniyê xwe nadim. Lê çi bikim, hevalê min dixwest ku pêlistoka xwe bi min tesdîq bike. Heqê wî hebû lewre ez jî hemû nivîsên xwe ji wî re dixwînim û ew jî tehemul dike.

Em çûn lê maşîna me di rê de xera bû, nêzî mexrebê em gihîştin. Ji ber ku em westiyabûn, em zû razan. Roja din serê sibehê hê tu şopa rojê tune bû û em li keviya çem sekinîbûn. Em çavxewn bûn, lê ji kêfan çargoşe bûn. Hêdî hêdî û bi coş tarîtiya ezman diçû. Stêrkan ji me re çav dişikandin, diçûn serê çiyayan, bilind dibûn û xwe nîşan didan. Perdeya tarî ya ku ser rûyê avê girtibû, herikandina avê tirsnahtir dikir. Lê hino hino ev perde zirav bû. Zirav bû û qetiya. Ew hemû hût û cinawarên Mazenderanê yên ku di Şahnameyê de min xwendibûn di suretên çiyayên biezamet, darên bilind û deştên kûr de xuya dibûn. Ji bo derbeke vê tabloya bi sêhr ji çav wînda nekim min nedixest çavên xwe bişikînim û min bi heyranî li vê tabloyê dinihêrt, li vê ahenga rengan. Min dixwest wek yekî di nav bahoza xeyalan de wînda, di nav vê tabloyê de wînda bibim.

Wexta ku roj derket, rûyê dinyayê yê paqij û beriqî xuya bû, serê çiyayan wekî qedîfeyekî kesk û tarî bi çiziya bayê ji xew şiyar bû. Darên di dawa çiyayan de, wîsa ketîbûn nava hev ku dixwestin sirên şevê dewam bikin. Her du rexên çem, heta cihê ku çavên min didît bi xaliyên ji hezar kulîlkî li ser cihên nîzm û bilind hatibû raxistin. Di nîvê sehneyeke ku gulên sor ji tîrsa bayê hevdu hembêz dikirin de, min guleke wekî agir dît. Bayê serê dawa wê gulê dikişan xwarê.

Ji ber ku pir dûr bû, min nikaribû wê keçîka şelwar sor, ku serê vê şevqê di nav vê şînayî û kulîlkan de ye bibînim.

Hevalê min hema diaxivî, behsa karê çêrê, çiltukê û karê hinguv dikir. Nedihişt ez pîrsekê jê bikim. Min jî li wî nehisand û bi temaşeya xwe mijûl bûm. Bi nepenî

ez hewcedarî hevalekî ji dil bûm. Dilê min ji bo helbest û axaftineke ji dil diheliya. Bi carekê re dengêkî xembar, dengê gayekî fetisî û dengvedana wî ya dirêj li çiyayan û deştan belav bû. Ew deng veguherî dengên zirav û tûj. Wekî ku di mabeda ezman de zengil lêxin. Ji kêf û hestiyariyê sermest bûm. Ji bo careke din van melodyên dilgeş his bikim, min çavên xwe girtin. Vê carê deng xurtir bû. Deng bi awayekî melodîk ji rexê din hat. Wekî ku bersiva pîrsekê bê dayîn. Van dengên melodîk ji her du rexan dom kirin.

Bêyî hemdê xwe min got: Ev çi dibêjin? Hevalê min bi şaşwazî got: Bi rastî tu nizanî! Mîmkun e ku bi gelek awayî bê şîrovêkirin, lê ez dixwazim rastiyê bizanibim.

Hevalê min ji bo bersivê bide, devê xwe vekir, lê hê tişteke negotibû ku tiliya xwe danî ser lêva xwe û got: Hiş be, bihişîne!

Min dengêkî xweş ê ku bi vizîna bayê re kêş û zêde dibû his kir. Min ew peyv (deng) fêhm nedikir. Lê ji bişîrîn û serhejandina hevalê min aşkere bû ku ew wî dengî nas dike. Hevalê min hêdîka ew keçîka şelwar sor nîşan da û got: Leyla straneke evîni dibêje. Bihevşabûna çêlekan evîna wê aniye bîra wê. Ez bi vê stranê dizanim. Wexta Leyla strana xwe qedand, dengêkî nerm rûyê erdê girt. Hevalê min got: Ê ku bersivê dide dildarê Leylayê Mûrad e.

Min got: Hiş be, neaxive, ez bi hisînim!

Mûrad distrand û çêlekan jî dor bi dor, carna bi hev re distrandin. Çiya û deşt û belkî jî kulîlk û pelan jî bersiv didan van stranan. Leyla jî bédeng nedima. Min wê rojê ji pîrs û bersiva saz û orkestrayan fêhm kir. Hiş û aqilê min, dilê min bi dilgermiya evîne, vekiribû. Min sond xwar ku ji îro pêde wexta orkestrayan guhdar bikim ez ê yeko yeko û rast li her enstrumanê bibihîzim. Her enstrumanê û her dengî yeko yeko ez ê fêhm bikim û heta ji enstrumanekê fêhm nekim derbasî yeke din nabim.

Wexta ku stran bi dawî bû, min got: Ji min re behsa Leyla û Mûrad bike. Hevalê min got: Ew her du ji hev hez dikin û her du jî dikarin ji bo hevdu can bidin. Min got: Temam! Ji bo Xwedê pîrsgirêka wan çi ye? Her çi astengiya wan hebe divê tu îro ji holê rakî û divê tu vê pîrsgirêkê çareser bikî.

Got: Mixabin evîna wa ew qas ne hêsan e, di nav vê evîne de kesekî din jî heye.

Min got: çawa? Wî got: Mûrad û Rustem du xortên kurapê hevdu ne û her du jî hez ji Leylayê dikin. Leyla jî hez ji her duyan dike. Nikare yekî bi yê din tercîh bike. Heta niha tu kesî ev pirsgrîkê çareser nekir. Her sê jî ji agirê vê evînê him dişewitin him jî li ber xwe didin. Her du kurap bûn dijmînê hev. Çend caran ji bo hev bikujin, bi hev re şer kirin û hevdu bi derbên giran birîndar kirin. Du meh berê soz dan hev û bavên xwe, ku careke din şer nekin. Leyla jî Rustem û Mûrad jî kurd in û koç kirine Mazenderan ê.

Min got: Gazî Leylayê bike, em biaxivin. Dibe ku em karibin fêm bikin ka ji her du kurapan bêhtir an jî hindiktir ji Kîjanî hez dike. Bi vî awayî her çiqas li hemberî yekî hisa şewatê bêhtir be jî, zehftir hez ji kê bike divê bi wî re bizewice. Divê ev her sê ciwan jî êşa ku canê mirov diêşînê xilas bibin. Leyla hat, ji xwe ewle û bi şanazî li hemberî min sekinî. Gerdena wê, gewdeyê wê û laşê wê wekî ku bi salan spor kiribe, wekî ku bi pênêşê hatibê resimkirin: Rûyê wê gilover, çavên wê yên reş û mezin, bevilê wê xweşik, cilên wê, soriya hinarikên wê, wekî ku xwîn ji wan dipijikî. Porê wê yê zehf, bi desmaleke hevrîşimî hatibû pêçandin, kirasê wê şîn bû û wekî ku bi laşê wê ve zelikîbû, bû.

Min ji Leylayê re got: Ez ê di demeke kin de vî gundî bikirim û ez dixwazim Mûrad an jî Rustem ji bo muxtariyê hilbijêrim. Li gor te kî bibe muxtar baş e? Wekî ku hîleya min fêm bike, kenîya û got: Ez heman hez ji her duyan jî dikim.

Min got: Kîjan biqewetir e? Got: Her du jî bi qewet in. Min got: Kîjan baştir û diloventir e? got: Her yek ji wan bi cureyekî dilovan e.

Min got: Kîjan bedewtir e? Got: Çavên te jî hene, tu binihêrê, ji bo min tu cihêti tune ye.

Min got: Kîjan zehftir hez ji te dike? Got: Ez ne di nav dilê wan de me ku bizanibim, lê bi eynî awayî hez ji her duyan dikim. Em ji zaroktiya xwe ve, bi hev re mezin bûn. Ew zarokên xaltika min in. Ez dev ji her duyan jî bernadim. Ez naxwazim xirabiyekê bi wan bikim, naxwazim her du jî bikesirin.

Min got: Axir! Encam wê çawa bibe? Divê ev ciwan bizewicin, divê tu yekî ji wan jî bo mêrîtiyê hilbijêrî, ji bilî vê tu çare tune ye. Got: Bila ew jinekê ji xwe re bînin. Ez mêr naxwazim, ez naxwazim bizewicim. Ez ê bê mêr bimirim. Bêyî guherîna îfadeya rûyê wê ji ser hinarikên wê dilopên hêstiran gindirîn. Ew xwîn, xwîna dilê wê bû ku ji çavên wê diherikî.

Min got: Min henek kir, ew jî, tu jinan naxwazin. Lê hingî ku halê min xera bûbû, min nikaribû sohbetê dewam bikim û vegeriyam malê.

Muxtar hat û got: Îro em ê ji bo xatirê Xan Malîk guleşa boxeyan bikin. Ez qeherîm û min got "divê em dev ji van tiştên gunehkar, van şahiyên tirsê berdin."

Ma ne heyf e em wan ajalên bêguneh berdin hev! Ew ne mirov in; dilê wan bi hêrs, hesûdî, rik û xeyalên pûç tijî bûye. Bêyî xwe û bê armanc canê hev distînin. Ev heywan ji me bîaqiltir in, zanin ku têra hemû kesî av û giya heye. Ji ber vê şikir dikin. Bi hev re di nav aşî û kêfê de dijîn. Çima em bi şeytaniyên xwe wan diherimîn? (Çima ji dilê xwe yê şeytanî em pif bikin wan?) Ez destûrê nadim vî tiştî.

Muxtar kenîya û got: "camêr! Xuya ye ku tu ji şer ditirsî lê Xan Malîk bêtirs e. Ji van tiştan natirse.

Xan Malîk got: Hevalê min henekan dike, misoger boxeyan berdin hev. Em ê cenga wan temaşê bikin. Ez ê ji vê temaşeyê pir kêfxweş bibim. Xan Malîk destê min girt û ez birim odeyê.

Got: "ez ji te bêhtir ji vê hovîtiyê nefret dikim, lê çareya min tûne ye. Divê li vir bîm û temaşê bikim, nexwe şênîyên gund û bi teybetî ev muxtar, eger bêjin Xan Malîk tirsonek e, ev ê bibe mirina min."

Pişt re min got: "ez dixwazim Mûrad û Rustem bibînim ka heybeta wan çawan e." Piştî çend deqîqeyan Rustem hat, riha wî ne wek riha Rustemê di Şehnameyê de duqetkirî bû, kumê bi qilôç jî li serê wî tune bû, lê ew jî wek Rustemê di Şehnameyê de karibû filekî hov tîk bibe û ji keleka spî derbas bibe. Eynî wekî ku xelkê behs dikir, bû; qama wî dirêj, sîngê wî fireh bû, lê nîzanim Rustem ê di Şehnamê de jî wek wî bedew bû. Ev çav, birh, lêv, hinarik û şîrînî bi wî re jî hebû gelo? Simbêlên wî nû derketîbûn, bîst salî bû Rustem.

Piştî gotinên beredayî min ji wî re got; mebesta te çi ye, tu yê çi wextê bizewicî, emrê te derbas bûye, çima tu lez nakî? Rustem got; ger bi min bûya min ê du sal berê Leyla bixwesta, lê ez çî bikim Leyla bêhtir hez ji Mûrad dike. Min got; ne wilo ye, ez zanim ku eger bi qasî wî hez ji te neke jî, bi qasî wî te dixwaze. Got; îro ez ê vê pirsgrîkê çareser bikim! Min got; Xwedê neke, di hişê te de çi heye? Got; îro ez û Mûrad em ê boxeyên xwe berdin hev. Me biryar da ku eger boxeyê kê tîk here wê dev ji Leylayê berde. Ez ewle me ku wê boxeyê min bi ser bikeve û wê boxeyê Mûrad tîk biçe.

Xeber hat ku Mûrad hatiye, me Rustem şiyand û me bang kir Mûrad. Lê wekî ku Rustem cilên xwe guhertibe û dîsa ew hatibe, bû. Mûrad eynî wek Rustem bû. Erê Mûrad jî Rustem bû. Mûrad mehek an jî du meh berî Rustem hatibû dinyayê. Dayîkên wan xwîşk û bavên wan jî birayên hev bûn. Her du jî zehf dişibîyan hev û her du jî wek hev baş bûn. Her çiqas min xwest bi çavê Leylayê li wan binihêrim, ji bo ku cudatiyekê bibînim û yekî ji wan hilbijêrim jî, min nihêrt ev tişt wê bibe bêînsafî.

Mûrad jî hêvî dikir ku boxeyê wî wê boxeyê Rus-

tem t êk bibe. Min pêşiyê ji hevalê xwe re digot; ez li hemberî temaşekirina cengê me, lê niha ji bo pevcûn zû dest pê bike dilezînim. Li gor min boxeyan zanibû ku ew ê di rêya evînê de canbaziye bikin.

Du saetan piştî nîvroyê gotin ku qada cengê amade ye. Li ba xaniyê muxtar erdeke rast hebû, nêzî heftê metroyî fireh bû, li rexekî çem, li rexê din jî girekî kesk û biçûk hebû. Ehlê gund li ser gir û li her du rexên qadê kom bûbûn.

Me li ser gir li ciyekî ji erdê du mitroyî bilind cihê xwe girt. Hê çend deqîqe derbas nebûbûn hengameyek bilind bû. Rustem, li pêş boxeyekî xurt, hat qadê. Keriyeke çêlek jî li pişt wan bû. Rustem jî sisêyan yekê qade girt û kêliyêkê rû û stûyê boxeyê xwe mistda, boxe jî li wir mexelî û pişt re çêlek jî yeko yeko rûniştin.

Ehlê gund li rexê din ê qadê dinêrt, ji bo hatina boxeyê Mûrad bibînin, stûyê xwe dirêj dikirin. Lê pêjna Mûrad nedihat. Dengê pitepita gundiyan her diçû zêde dibû. Di nav peyvên ku min fêm nedikir de, peyva welat bi awayekî gotina Mazenderanî di guhên min de diçizand. Min guman nedikir ku kes bibêje welat, ji xwe çavên min û hemû hisên min li ser Leylayê bûn. Ew bi qama xwe di nav hemû jinan de wek pêykerekê bû. Ji hemû jinan bilindtir bû. Bi hemû hêza xwe ji bo ew bahozên di dilê wê de xuya nekin, dixwest veşêre. Min wateya peyva welat nepirsî. Sedama ku gundî ji ber çî dibêjin welat min nepirsî.

Bi carekê ve serê Mûrad ji kaş ve xuya bû. Dûre singê wî û hemû laşê wî xuya bû. Li pişt wî boxeyê wî, li pişt boxe çêlekên wî hebûn. Boxeyê Rustem û çêlekên wî rabûn ji piya û kirin oreor. Boxeyê Mûrad jî hinekî pêşve çû, oreoreke dirêj kir. Paqên xwe vekir û serê xwe hinekî tewand. Boxeyê Rustem bi hamleyekê gihîşt dijberê xwe û êrîş kir. Serê xwe li hev xistin dengê ecêb derket min got qey mejiyên wan belav bû. Pişt re disa ji hev veqetiyên û careke din êrîş kirin lê wê carê ji hev veneqetiyên û hevdu dehf dan. Carna ev carna yê din di her dehfê de gavek an jî zêdetir paşve diçû. Mêr, jin zar û zêç di nav hêcanê de bûn. Ji dest, pê û rûyên wan ev hêcan dihat dîtin. Geh radi-bûn piya, geh rûdiniştin. Tenê Leyla di nav bêdengiyekê de wekî pêykerekê qet nedilebitî. Boxeyan serê xwe li hev dixistin û hev dehf didan. Di nav van dehfan de boxeyê Rustem xwe paş ve kişand û bi carekê re êrîş kir ser boxeyê Mûrad, boxe xirxirand û ji kaş avêt xwarê. Min fêm nekir çima boxeyê Mûrad ket xwarê. Ji zikê boxe xwîn herikî. Ji temaşevanan dengê xirecirê û feryadê bilind bû û dengê peyva “welat”, “welat” hat. Mûrad hat nîvê qadê berê xwe da Leylayê, hevokek dirêj got. Çend caran peyva “welat” anî ziman û çû.

Dê û bavê Mûrad xwe avêtin dest û piyên wî. Mûrad her du jî dehf dan û çû. Di nav ehlê gund de hengameyek çêbû. Peyva “welat” dubare dikirin. Li ser hev digotin; “welat”, “welat”, “welat”! Mirov digot qey bi hev re peyman çêkirine. Bi hev re digotin “welat”. Dixwestin ku Mûrad disa bînin lê tu çare tune bû. Mûrad biryar dabû ku ji gundê xwe, ji mala xwe, ji ba dê û bavê xwe, ji Mazenderanê here.

Bi carekê re dengê ku ji hêrsan kelogirî bûbû hat, got “Mûrad!” û Leylayê bazda Mûrad hembez kir. Xuya bû ku ji dil digiriya. Piştî çend deqîqeyên ku wilo derbas bûn, Leyla û Mûrad hatin û li hemberî me sekinîn. Mûrad ji muxtar re tiştê got. Muxtar jî bersiv da. Ji bo em jî fêm bikin, bi farsîyeke kîtabî got ku tu mafdar î, îxanet li te bû lê li hember vê îxanetê Leyla bû ya te. Leyla jî sed boxeyî qîmetdartir e!

Qarîn û feryadên kamraniyê ji Mûrad bilind bûn. Min ji muxtar re got “zû ji me re bibêje çî bû, em jî fêm bikin.” Got ku Rustem an bi zanebûn an jî bi nezani ji bo Leyla bibe ya wî îxanet li Leylayê kir. Divê boxe bi çêlekan re di heman demê de ji her du aliyên qadê hatibûna lê boxeyên Rustem nîv saetî zûtir hatine û li qadê cih girtine.

Wexta ku boxeyek li cihekî mexelê wê derê wek welatê xwe dibîne, li wir dimîne û ji wir ranabe. Ji bo wir biparêze qeweta wî dehf qat zêde dibe û tu boxe nikarin wî t êk bibin. Ew boxe wir wek welat dihesibîne. Sedema qareqara gel ji ber vî tiştî bû. Mûrad jî ji ber vê îxaneta ku lê bûye dixwest ji Mazenderanê here. Belê eger boxeyê Rustem li wir bi cih nebûya, boxeyê Mûrad bi wê derba peşîn karibû boxeyê Rustem t êk bibe. Rustem di rêya rast de neçû. Xweda jî dilê Leylayê bir ser Mûrad.

Di heman şevê de li ser israra min me dest bi dawetê kir. Heta şevêqê govend girtin, reqisîn. Ez jî ji kêfan sermest bûbûm. Di nav wê kêf û şahiya ku min his dikir û didît de, min didît ku hemû heyv û stêrk, ferîşteyên li ezmanan, afirînde û hemû zereyên cihanê bi hezkirina welatê xwe stranan dibêjin û govendê digirin. Wekî ew tarîtiya di jiyana min de ronî bûbû, wekî ku ji dudilî û gumanan rizgar bûbûm. Niha ez fêm dikim bê çima hez ji axa xwe, welatê xwe dikim. Zanim ku dayîka jiyanê şîrê xwe tevli vê hezkirinê kirîye. Her çiqas min xwendibe jî, min bi çavên xwe dît ku hezkirina welat mirovan, bi hêlîna xwe, mala xwe, stara xwe û bi berfirehî tax, bajar, welatê xwe ve gire-dide, ev hez kirin e.

Min baş fêm kir ku çima Eflatûn gotiye “tiştê ku mirov herî zêde bi jiyanê ve girêdide, hezkirina welat e” min fêm kir ji bo çî mirovên dinyayê canê xwe ji bo ax û welatê xwe feda dikin.

...yan jî...

Mihemed AFŞAR

Ji xemsariya te ji rûpelên dîrokê tîp diweşin
Her êvar bi hêviya bihareke nû dixapim
Avjenekî deryayên mezin bûm.
Li ber perava reşika çavên te
Di dilopek av de li ber xeniqandinê me îro
Navekî bi makezagonan hatiye qedexekirin ji
zindana dil nabore
Di cenga pênuşan de qelemşorên herî mezin
ji te direvin
Lê hevokên herî xweşik berê xwe dane çiya-
yên te
Bajar ji dengê xwe şuştine, xwe bi rengê te


pêçane rêwî ne ber bi te ve tên
Evîn jî kerba xwe avis maye, şîrê xwe dirijîne
ser goristana bêkesan, sêwî ye
Di gemara xwîna xwe de tê şuştîn
Helbestên xweşik rêwî ne, çîrokên zaroktiya me
rêwî ne, kilamên govend û dîlanên me rêwî ne
Ziman lal kirine, xwe li şevê pêçane rêwî ne
Di baraneke payîzê de dîsa destê te li dora
serê min, di xeyala bihareke nû de ye
Lê avjen im, divê di gêrên mezin de bihêrim
baweriyên xwe, ev azmûna min e
Yan ez ê bixeniqim yan jî...

Ax ax

xwezî
ez di jiyana xwe de carekê
Ji bo babet û mijarekê
bihatima diziya nava du lêvên te

xwezî
ew cih û warên nepen û dizî
bibûna cil û bergên zimanê min
ê şîlf û tazî
ku wan şerm nekirina ji nava du
lêvên te

xwezî
evîna min bibûya derziyeke agirîn




İlhamî OZER

hêviya min ta
û zimanê min bi wê hinceta bi
birîn
xwe bidirûta di nava du lêvên te
de

xwezî
tu bibûya heyveke bi kofî û te-
mezî
ez jî şevên te
ku min hemû stêrkên bi ramû-
san hatibûn niximandin
veşartina di nava du lêvên te de

Kurtejiyana Paul Celan



Di 23 çiriya paşîn a 1920'î de Paul Antschel li Romaniya Czernowitzê hat dinê, kurekî bi tenê bû. Bav û dayîka wî cihuyên elman bûn, lewma xwendin û pîşkariya xwe bi zimanê elmanî û îbrî xwendibû.

Paul Celan, bi helbestên ji bo stranan dest bi nivîsîna helbestê kir, lê ew nivîs bi xwe ji ketibûn bin kartêkirina surealîzmê. Di sala 1959'an de, berhema xwe a pê bi nav û deng bû "Sprachgitter, Zimanê hesinî" weşand.

Paul Celan, wek wergêr ji dihate naskirin, her ji destpêkê ve, dema li Bukharistê bû û di salên navbera 1960 û 1970'yî de, gelek berhem ji rûsî û frensî wergerand zimanê elmanî.

Di hin makderan de, nivîsiye, ko di şeva 19/20.04.1970'yî de xwe kuştîye, û di hinên din de, tê nivîsîn, ko di 26.04.1970'yî de li li Parisê xwe kuştîye.

1. Dara hejhejok

Dara hejhejok, xîfika te, di tariyê de, sipî diçirise.
Pora dayikê qet ne spî bû.

Diranê şêr, wilo Ûkrayna kesk e
Dayika min a boz nehatibû malê

Ewrên baranê, wilo li bîr e, tu jê dimînî?
Dayika min a hêmin, bo hemiyan digirî

Stran gilover e, tu qeytana zêrîn li hev badidî.
Dilê dayika min, birîndar bibû ji xurşînê

Deriyê ji dara mazî, kî tu ji çengal derxistibûyî
Dayika min a milahîm, nikare were.

2. Mandûbûn

Her ronî, cîhana kêzikan,
têwer dibe destê min
hevalên min, xewarên min,
welatê min ê sor, ê dadikeve kîjan deverê?

Tu, binketina
Daneheviyên di denekî mezin de yî.
Temaşe meke, ka çawa ez ji hev dikevim,

Wê kûrahiyê ez hilgirtibûm.

Di vê cîhana serxweş û mêwan de,
Ew a min xizmet kir û nema gerek e
Pirça te ya qehweyî, jiyîna min e,
Û mirina min çavê te yê kesk e.

3. Xatirxwestin

Şivîl, bê çav di dilê te de çikiyabû,
Xunçe hişk bûn, koratî wergirtibû.
Weha ji dilê te nema dikare weke kovikê ji
min re pêdivî be.
Weha min ji te re tarî bi tiliyan kire gustîl.

O herçî zor bi şaşî li yariyeke şevan, kiribû
Ji şûrê stêrka min, ew a xewna te narevîne..
Cara dawî, guhlêgirtin, hingava min bo te
çingînî pê ketibû.
Û ne bêhtir ji dengê av û bê tingênî pê ketibû.

Geşbûn ew e, stiriyên êvarê di rê de:
Bo min ji lempeyeke biçûçik, a ko dilê te
Belê min nema mamiz (şivir) di çeperan de
sist kiribûn
Û nema min bangî kevokê kiribû: were!

4. Behîvan bihejmêre

Bihejmêre,
tiştê tehl bû
û tu hişyar dihiştî,
min bi wan re bihejmêre

Li çavên te digeriyam,
dema te ew bel kiribû
û kesekî li te nedinerî,
min her deziyeke nihênî
ê di werîs de,
şidandibû,
êdî te bawer kiribû,
ku xwe berdabû nav,
a peyvek,
a ko dilê kesekî jê re nebibû cih,
parastibû.

Li wir tu cara yekem derbasî
wî navî bûyî,
ku ê te ye
te bi bawerî lingê xwe bi ser xwe ve kêşa,
çakûç bi azadî dihejyan
di zingilê kursiyê nedengiya te de,
guhdarîkirin ber bi te ve hatibû,
mirin danabû ser mil û derdorên te jî,
û hûn her sê çûbûn ber bi êvarê ve.
Min tehl bike.
Min digel behîvan bihijmêre.

5. Ji bo Eric

Ronî dide
wijdan dikole
li vir û wir
berambereyek ta
Piştî berahîkê: hîn berâtir
demê ber bijêr ve
terazîyeke dijrabê radiwestand.
Weke ku tu, kur,
a min ligel te
destên tûrane



Dilên gemarî

Pîroz XAN

Ez im kulîlka li ser dara hêviyê,
Bi şiv û gopalên kesî venaweşim.
Zilamên wekî te xwelî li serî ye,
Mirovên bêfirazwer re nameşim.

Naxêr, ez nabim hewî li ser dê û xwişkan,
Dilê te wekî pisîka gemarî, li kuçan.
Tu bimirî jî ji vî evîna bê wate,
Ez nabim yar ji mirovên bi çend dilan.

Keçên pazdehîn divên xortên hevdeh salî;
Nedin dilqirêjên çil, pêncî, heftê salî,
Ji me re pir xayîn digere çerxa felek,
Dilên gemarî tu car nabin gul û çiçek.

Nemaye şewq û şemala te ya xortanî,
Tu êdî kalekî dest bi gopal û xopan î,
Neviyên xwe kom bike ji der û doranî,
Rûne li mala xwe, bibe wekî sultanî.

Toreyên xirab di bin lingan de dipelêxim.
Dilê min ê ter û teze dest nabe lêxim.
Dev û dil bûye yek, kî dikare bişikîne?
Kes nikare êdî keçên kurdan bixapîne.

Li ser çavên reşbelek wer nakim xêliya reş.
Li bendê me wê bê rojek mizgîniya xweş.
Ger bibêjin tu miriyî, jinên te bûne bî,
Lotikan bidim ez ê li ser mêrg û kanî.



Amadekar: **Elîxan LORAN**

✌ Ji bo hemû jinên lêgerên edalet, rastî û hezkirinê - **E. OÇALAN**

✌ Hevnivîsîn bi Mizgîn Ronakê re
Elîxan LORAN

✌ Ji bo serbestiyê biqîre - **Asya GENIM**

✌ Wêje û jin - **Nesrîn NAVDAR**

✌ Jin û wêjeya kurd - **Zeynep YAŞ**

✌ Helbest zimanê dil û derbirîna giyana xwezayê ye - **Fatma SAVCI**

✌ Rewşa wêjeya heyî û hebûna jinan
Dîlan AYDIN

✌ Wêje û jin - **Mizgîn RONAK**

✌ Hestên jinê yên veşartî - **Reyhan SARHAN**

✌ Hevpeyvîn bi Gulgeş Deryaspî re
Hevpeyvîn: R. SARHAN

Ne tenê wêjeya kurdî em dikarin bibêjin ku hema hema wêjeya hemû welatan “wêjeyeke bi simbêl, wêjeyeke bi masûlke, wêjeyeke mêrane” ye.

Di vê dosyeya bi navê “Li ba jinan wêjeya kurdî” de me xwest em bi çavên nivîskaran jin wêjeya kurdî û wêjeya jinan nîqaş bikin. Di dosyeyê de me û beşdarên dosyeyê hewl dan ku; Bi çavên nivîskarên jin wêjeya kurdî çawa dixuye, jin çima bêtir dixwazin helbestê binivîsin, çima çîroknûs û romanûsên jin hindik in, jin dikarin çi li wêjeya kurdî zêde bikin ku mebesta me ya ji vir ev e ku nivîskarên mêr ku tiştên nikarin bibînin û dema ku dibînin jî nikarin binivîsin, hesta zayînê, hesta dayîktiyê, hesta serê mehê, hesta kubariyê, mirov dikare di wêjeya kurdî de qala “wêjeyeke femînen” bike, ferqa zimanê avakirinê yê jinan û yê mêran çi ye, “nivîskara jin” û “jina nivîskar” ji hev çawa tê veçirandin û gelo kîjan rast e, wekî ku dîtî sansûreke civakî ya eşkere û nepen li ser jinê heye û em ji dezavantaja zêdetir gelo dikarin qala avantaja vê yekê bikin, ji ber ku jin gotina dilê xwe nikare rasterast bibêje, serî li sîmge, hêma, wêneyan didî. Ev sîmge, hêma û wêne ji bo avakirina hevoksaziyê ne avantaj in gelo, em nifiran jî wekî beşeke wêjeyê qebûl bikin –ji ber ku ew jî hunerek e- û têkiliya nifir û jinan bînin ba hev dê çi derkevin holê, mêr çêran diafirîne lê jin jî nifiran diafirîne ku em dikarin vê rewşê çawa şîrove bikin, dema ku berhemek were rexnekirin, divê zayenda nivîskar jî tevî mekanîzmaya rexneyê bibe, rexnegirek gelo dikare bibêje ku “ji ber ku nivîskara vê berhemê jinek e, divê mirov gelek qelsî û kêmasiyên wê nebînin, ji bo ku jin bêtir beşdarî qonaxa wêjeyê bibin, gelo pêşniyarên te çi ne, û ji ber ku jin heta niha hindikî beşdarî wêjeyê bûne, tu rexneyan li kê digirî da ku ev mijar li ser kulavê rojevê bibe mêvan.

Ji bo hemû jinên lêgerên edalet, rastî û hezkirinê

E. OÇALAN

Ji bîr nekin, hûn ji min zêdetir di çarmîxê de ne. Jinîti bûye îşkenceya manewî, bûye mijara durûti, zordarî û komkujiya herî mezin. Ji bo vê dibêjim şoreşa jinê, jiyani ye.

Ji bo we hestên min ên mezin hene, dixwazim bibêjim ku ez ji bo we tiştê herî xweşik difikirim. Ez nikarim hestên xwe bi zimanekî helbestî û hevokên felsefîk binim ziman.

Ji bo azadiya we, min şerekî mezin da ber çavên xwe. Ez ê heta dawiyê jî vê helwesta xwe berdewam bikim. Ez li vir jî hewl didim ku hêzê bidim û tekoşîna bi rûmet û xwedî bingeh.

Pir girîng bû ku jin di rastiya me ya şênber de bibe xwedî nasnameya xwe û xwedî îradeyê. Ji bo vê min meşa jiyana azad da destpêkirin. Min xwest û cewherê jinê derînim holê. Vê yekê jî min xwest li gor hêza jinan a cewherî bi pêş bixim. Min mêrê ku di civaka desthilatdariya mêr de bûbû zalim, qeşmer û kedxwar baş nas kir. Bersiva ku ez ji bo lêgerîna azadiya jinê bidim ew e ku ez vî mêrî bigirim, analîz bikim û bikujim.

Ger jiyani ji bo jinê îfadeya îxanetê, şermê û rastiya bi lanet be; ya divê were kirin derxistina holê ya vî yekê ye. Ji bo vê me pêşî got; azadiya jinê, me jina ku şaristaniyê çanda îxanet û înkare li ser ferz kiribû; şiyar kir. Me jina ku di nava vî çandê de şewitibû, hatibû şewitandin; bi hezkirin û azadiyê rakir ser piyan. Me pir bi prensîb hewl da ku em têkiliya ku tim pê

dide windakirin; veguherînin têkiliya ku dide karkirin. Hê nû navê tekoşînê hatiye danîn, hêviya pêşveçûnê dide. Peywireke we yê rojevî ew e ku hûn bername, stratejî, rêxistinbûyîn, awayên çalakiyan çêkin û bixin rojevê. Divê hûn diroka zordariyê, şer, bînpêkirin û derewan a ku bi civaka çînî re dest pê kiriye; bi tekoşîna xwe, wek diroka azadî, aşti, wekhevî û rastiye jî nû ve binivîsin. Divê hûn li ber xwe bidin û tekoşîna xwe kûrtir bikin. Ji bîr nekin hûn ji min zêdetir di çarmîxê de ne. Jinîti bûye îşkenceya manewî, bûye mijara komkujiyeke mezin. Hem jî ev yek li ser navê hezkirinê hatiye kirin. Jixwe xayînî, îxanet di vir de ye. Gelo hezkirinê mezin dibin sedema komkuji û zordariyê? Ger hûn baş li ser bisekinin, hûr û kûr bifikirin hûn ê bibînin ku pirsgrêk bîrdozî ye. Ji ber vî yekê ez dibêjim şoreşa jinê jiyani ye. Divê hûn kûrbûna vî yekê fam bikin.

Divê hûn di sedsala 21'ê de, nûnertiya jina şiyar bûye, rabûye ser piyan û azad û bihêz bûye bikin û xwedî îdîa bin. Hûn tenê bi baweriyeke mezin dikarin lanetê analîz bikin. Li ser vî bingehê jî xwedayên mêr re, ji çanda mêr re bibêjin na. Çanda xwedawendiyê biafirînin. Çanda îxanetê ya ku şaristaniyê li ser jinê ferz kiriye, tenê bi vî yekê dikare were têkbirin. Bêyî hûn bibin amûra lanet û nexweşîkbûnê, di mijara azadiyê de xwe biparêzin, li ser bingeha xwe jinûveafirandinê; bikevin lêgerîna hemû tiştên ku hatine windakirin û wînda bûne. Divê bingeha tekoşîna we ev be. Divê hûn hemû têkiliyên xwe baş bipîvin, bizanibin ka çi ji we dibe, çi bi we dide karkirin. Baweriya xwe bi tu têkiliyên li ser hîmayeyê neynin.

Ez bawer dikim ku dê jin di sedsala 21'ê de bibe hêza aşti û azadiyê, civakê biguherîne û bibe hêza herî şoreşger. Divê hûn hêza xwe ya fedakariya mezin û xebatê li hemû qadên jiyane bixin pratîkê. Divê hûn di jiyana nû de bibin jina hezkirin, xweşîkbûn û aştiyê.

Divê hûn bizanibin ku ez ji bo we xwedî ramanên wek baranê me û ji bo we tiştên herî xweşik difikirim. Ez pir nirxê



didim girêdana we ya bi hezkirin û hestiyar.

Projeya min a jiyana azad a ez dixwazim bi pêş bixim; dê bi têkoşîna we ya bi bingeş bigihîje serkeftinê. Di tekoşîna demokrasiyê de, di tekoşîna aştîyê de rola we ya pêşengiyê heye. Divê hûn li hemberî qirêjî, paşverûtî, zordarî û zextên ku girêdayî desthilatdariya mêr in; ronesansa jinê biafirînin û bersivê bidin. Bawerîya min heye ku hûn ê bi ser bikevin.


Baş li ser têgehên edalet û hezkirinê bisekinin, dil û giyanê xwe vekirî bihêlin. Perwerdehiya ji bo jinên azad û afirandkar ji bo we jiyânî ye. Pêdiviya we bi rêxistinbûyîneke lezgînî heye. Dema jin enerjiya xwe bi rêxistin bike û veguherîne enerjîyên nû dê enerjiya ku ji vê yekê biafire bibe hêza guherînê. Divê di kesayetiya we de teqînên şexsî çêbibin. Her dem û roj hûn li ser xwe bisekinin û bikaribin xwe nas bikin, bigihîjin cewherê xwe. Divê hûn bizanibin ku tolhildana herî mezin pêşxistina raman û aqilê we ye. Îradeya xwe sewqî karên mezin bikin. Li ser bingeha mezinbûnê, divê hûn di refên şoreşê de bibin dengê herî bilind ê yekîtiyê, azadî û cesaretê.

Hemû tiştên ez li Îmraliyê dikim, ji bo we ye. Hûn dikarin di tekoşîna xwe de pêk bînin. Ez tengasî û zoriyên ku hûn dijîn baş dizanim, lê ne girîng e. Hûn ê bi vana rastî, bêrî û xeyalên xwe yên ku we

winda kîrîne bibînin. Hûn ê bi vê yekê hêzdar bibin. Bi hêza xwe ya xweser bawer bin, hûn di riyeke rast de ne, hûn ê bi ser bikevin.

Dixwazim ji bo dayîkên me jî vana bibêjim; min ew jî bîr nekirine. Ez êş û hawara wan dizanim. Girêdana wan kûr û cuda ye. Min di serî de dayîk esas girt û hewl da ku nîrxê bidim hemû jinên bê şans. Ji ber hurmeta min a ji bo wan, ji bo êşên nû neyên jiyîn, ez ji bo aştîyê têkoşîneke bê eman dimeşînim. Hêza ku min li vira li ser piyan dihêle ev e. Ez hêvîdar im ku dayîkên me, min fam bikin. Ez hemû jinan bi van hestên germ, silav dikim û dixwazim bibêjim ku em ê di mijara azadiyê de bi ser bikevin. Ez her dem bi we re me û ji we re serkeftinê dixwazim.

Bi rêz û hezkirin



Hevnivîsîn bi Mizgîn RONAKê re: Elîxan LORAN

**Ma kê em nekuştin! Bi destê her kujerî hatin
kuştin em, li jêr asîmanê şîn û dilşikên. Windakirina
mehsûmîyet, dadwerî, dostanî û mirovatîyê, em kuştin**

✓ “Sêv jî me dikuştin”, gelo ji xeynî sêvan kê em kuştin û kî me dikuştin?

Ma kê em nekuştin! Bi destê her kujerî hatin kuştin em, li jêr asîmanê şîn û dilşikên. Windakirina mehsûmîyet, dadwerî, dostanî û mirovatîyê, em kuştin. Di dawiyê jî em jî bûn kujerê xwe. Çi qas em parçe bûn û ji hev revîyan, çi qas me pê li yekîtiyê kir û pelçiqand, ewqas bûn kujerê xwe em. Çi qas em di çavên hev de ji xwe revîyan, çi qas me dît ku em heman kujer, belengaz û pûçperest in. Me ew qas hev kuşt, Kurdistan kuşt! Ma ku me bi tevî kujerîya xwe çav, guh, dev, derî û şibakên xwe ji dagirkirinên her tewreyî re vekirî nehiştê dê karibûna bi bêhna sêvan jî em bikuştina?

Nietzsche dibêje: “Yên ku bi cinawiran re şer bikin, dibin cinawir.” Ji ber ku “Xweşikbûna Kurdistanê bûbû belaya serê me” hemû cinawir li dor me bûbûn yek, ji bo ku em zarokên xweşikbûneke ku bûbû belaya serê Kurdistanê me û me bûn. Em jî bûn bela; ma zarokên belayên xweşikîyê dikaribûn nebin bela? Bi kurtasî, Kurdistan bernavê serhildan û berxwedanê bû; serhildan û berxwedan jî bernavê me yê ku li eniya me hatibû nivisandin, bi destê periyên payîzeke bêdawî... Lewma jî di saniyeyek demjimêra cîhanê de 360 salîse hene, lê di ya me Kurdan de 360 jan û xwekuştin hene. Çawa ku saniyeyên me, ne wek ên xelkê ne, xwekuştinên me jî wisa ne. Nêzî nivsedsalekê ye ku em hewl didin xwe jî kuştin û xwekuştinê rizgar bikin, birînen xwe dipêçin bi serhildan û berxwedaneke bê hempa. Lê çi qas em birînan dipêçin, ew qas xwîn diherike ji rehên me yên ku bi xwekujerîyê hatine birîn... Carinan dibêjim; çawa em tev wek kes û civak, xwîna ku diherike nabînin û di ser re derbas dibin, nabînin ku binê solên me tev bi xwîn e? Em xwe dikuştin hê jî û ev xwekuştin ne wek a Yese-nîn helbestî ye, ne wek a Mayakovskî romantîk û serhildêr e û ne jî wek a Virgînia Woolf dinyaderbas û avhez e. Tewre em hay jê nîn in ku em çawa û bi çi awayî xwe dikuştin; berxikan diavêjin ber guran, çêlê-çivîkan teslîmî maran dikin... Me hay jê nîn e Loran, me hay jê nîn e ku xwekujerî çawa baxçeyên me tar û mar dike û şekirêkî tehl diavêje berîka me...

*Xelata tenêtiyê / Tenêti boxçika xwe tevlê hev dike
/ şekirêkî eydê ya sedsalê / sê dilop hubr/ û ferek gore*

derdixîne/ lê me hê jî du ling hene...

Ev ne teseliyek û xwexapîn e Loran. Hê jî her du lingên me hene û roj were em ê bibêjin; “Seriyo bi qurbana lingan” û tevî sînor, birîn û xwekuştinan li pey xwe bihêlin û dê ew li peyxwehiştinê bibe dermanekî şêrîn (ma derman neçar in ku timî tehl bin?) ku me ew divê di qiyameta Kurdistanê ya bêdawî de jî winda nekiribe, êdî tu hêz û cinawir nikare wan ji me bistîne.

Giraniya bi qasî keserê

Bê hemdê xwe nexwîne wiha

Wek heheçîkeke xurîfî...

Hişkelîng neseke

Li navbeyna gulên û axînan...

Hespên avê derbas bûn ji şeva te

Êdî dereng e!

Her kes bi qasî xema xwe ye

Her kes bi qasî kesera xwe

Lê xem nîn e; çiya bi çiya hildikişin asîman em, beza mirinê, dagirkerî û xwekuştin dişikê. Dilê me tije zarokên Geve û Şemzînanê dibe. Kurdistan dibêje; Xem nîn e:

Ji bo çivîktiya me ya hatî

baskan çêdikin em ji hevrîşim û şîrê

jî mûma bawerîyê

Helbesteke min a din jî wiha dibêje:

Xerîbî

Nexweş bikeve

Bibe nexweşê min...

Ez ê bi Bozê xwe yê rewan

Herim Heleba sedsal berê

Ji te re bînim rihan û nêrgizan

Çavên xwe bi wan veke

Nexweş bikeve

Bibe nexweşê min...

Ez ê ji te re baxçeyekî bînim

Zû baş be, ji her kesî baştir be

Nexweş bikeve

Xew bi şaîran nakeve...

✓ **Beriya ku ez werim ser narincokên ku bêhna sêvan ji wan dihatin û li Helepçeyê li ser serê me bariyan, dixwazim qala sêva Hz. Adem û Hz. Hewa bikim. Di perspektîfa vê çîrokê de gelo tê heye ku sêv ji bo kurdan azadî ye û piştî ku kurdan ew sêv xwarin - azadî xwestin- êdî sirgunî dinyayê bûn û ketin şerekî hebûn û nebûnê?**

Pirsa te vê çarîna min anî bîra min:
Yekbûna gunehan
guneh û guneh bûn yek
Hinarikên Hewayê sor bûn
xwedê SÊVEK da dinyayê...

Di destpêkê vê bibêjim ku, ez wek jineke şoreşger û nêzî femînîzmê, Hewayê napejirînim! Lewre mîtos ji li gorî pergala jînsîkên û mîrperest hatine honandin. Ji bo vê ji Hewa jineke şikestî ye; “Ji parsûyê Adem çêbûye” ku qaşo sêv bi Adem dabe xwarin ji ev yek naguhere. Jixwe Hewa neyara jina azad ango Lîlîtê ye ji. Ya din; ji bo ku hê ji di kûrahiya hişmendiya me ya civakî de bandora bawerîya me ya rastî, Zerdeştîyê heye û di felsefeya wê de ji wekhevî heye; ez nikarim vê “bûyera mîtosî” ya ku ji rastiya me ya civakî û dîrokî dûr e, bi lêanînekê şîrove bikim. Ango dixwaze bila gerdûnî be ji, lê cihê vêya di cîhana min de nîn e. Lewre ez têkoşera doza azadiya jinê û Kurdistanê me. Ligel van, sêva ku di mîtosê Yewnanan de heye ji ne bi dilê jineke azadîxwaz e. Lewre di wir de ji “Sêveke zêr” heye, li ser “Ji ya delaltirîn re” nivisandîye, ji ber vê yekê dibe sedema pevçûneke mezin, di navbeyna xwedawend, Hera, Afrodît û Athenayê de. Ango sêvê, ew xwedawendên ku her çûne bûne dîl û rebenên Zeûs biçûktir û lawaztir kiriye. Lewma ji bi xwendîneke jinane, wek semboleke dijberî jinê hatiye bikaranîn. Lê em dizanin ku ew sêv ji mehsûm in wek sêvên Helepçeyê! Bersûc, serdestî ye ango.

Min li çend ferhengên me mêze kir. Di der barê sêvê de tiştekî awarte nîn e! Ji biwêjan ji ev her du hene: Sêva ber devan (qey filankes bûye sêva ber devan ku her kes dev diavêje, pê re digere) û sêva sor şandin (qey min jê re sêva sor şandîye ku lîxistiye hatiye...) Lê di ferhenga îngilîzî de sêv 24, 25 caran derbas dibe ku nivê wan biwêjî ne. Jixwe wek ku tê zanîn sêv di çanda me ya dengbêjî de wek hêmayeke ji bo estetîzma bedena jinê tê bikaranîn, lê belkî ji ber ku erdnîgariya Kurdistanê warê sêvan bûye bal nekişandîye, wek hebûnekê ji hebûnên asayî hatine dîtin, an ji ji ber dîroka ku bi dorpêç û dagirkeriyê derbas bûye, derfet nebûye ku wateyeke cudatir ji sêve re ji bibînin. Minak: “Heft meseleyên hirçê hene, her heft li ser hir-

mîyê ne” ne li ser sêvê ne û hwd.

Sêv di Quranê de ji wiha derbas dibe: Hz. Meyrem sêva ku Melayket jê re dibe dixwe û ducanî dibe, paşê Îsa tê dinê. Lê di çand û hişmendiya me de cihekî sêvê ya wiha nîn e. Ango di vê mînakê de ji, sêv ji sêva ku Hewa û Adem dixwin û “ji rê derdikevin” cuda dibe. Belkî di vê mijarê de ji bersiv, çiyayên me ne. Ma yên ku çiyayên wan û agirvedana li serê wan hebe çima qîma xwe bi xwarina sêvê binin, ne wisa?

Ango belkî “hin kes” bi avê ji serxweş bûne, an ji bi xwarina sêvê “ji rê derketine.” Lê Kurd wisa çiyayî û Zerdeştî bûne ku, di binê hişê xwe de cih nedane zanîn û îsyana ku bi xwarinê hatiye! Lewre rê hilkişiyane çiyayan çav û dilan bi pey xwe xistine û ev ji şanaziya xwerûtiya hebûna me ye. Bila ev helbest ji spasdariya bo vê rastiye be:

Rijandin

Bêrîkên te kun bûn
Rijîyan tevê helbestên te
Çentê te kun bû
Rijîyan tevî bîranînên te
Deftera te qetiyabû
Rijîyan tevî çîrokên te
Pirtûkên te qetiyabûn
Rijîyan tevê lehengên te
Dilê te kevn bû
Rijîya tevî hevokên te yên zîvîn...
Tu mayî vîngîvala
Ji şikeftan valatir î niha

✓ **Di Tîrmeha 2010'an de li Dortyola Hatayê xanî û dikanên kurdan şewitandin. Kesê ku dikana wî hatibû şewitandin di rojnameya Gunlukê ya roja 31'ê Tîrmehê de ev gotibû: “Ez vê bêhnê nas dikim, ev cara sisiyan e ku mala min dişewitînin. Dermanekî li diwaran dixin û ev ji dike ku agir gur bibe.” Pirseke deresayî ji te bikim: Te dîsa helbestek li ser bêhna sêvan, bêhna çekên kîmyewî, bêhna dermanê ku li diwaran dixin, bêhna daristanên şewitandî binivîsanda te yê qala çî bikira? Gelo van bêhnên qirker sola karakterê romana “Bêhn” a Patrick Suskind ji taqê neavêtiye?**

Belê ew pirtûka Suskind ango “Bêhn” gerdûn, xweza, awaz, aheng, nasname û cureyên bêhnê bi awayekî bê hempa derdixwe pêşberî me. Jixwe bi tevlibûna karakterê wî Jan Baptîste Grenovîlleyê “jiyana me”, ji qewlên pêşiyên me ve “guhên me dirêj dibin!” Lewre kesekî ku me ew bi tu awayî ji ber nekiriye derdikeve pêşberî me. Lê tevî ku nêçîrvanê bêhna qîzan e û tevî

ku wê bê bêhnê li hemberî mirovan/mexdûran bi kar tîne ji, bêhna wê bi qasî ya sêvên Helebçeyê û ya li gundên Kurdistanê ne kujer e. Ji ber ku ew, bi bêhna xwe nakuje. Ez bawer im ku Patrîck Suskînd wan bêhnên kujer ên ku li Kurdistanê bi destên zordestan hatine bikaranîn bizanibûya dê pirtûkeke din binivîsand; durûtî, mirovxurî û kujerîya bêhnê şanî me bida. Lê pêwîst e ku em bi xwe jî vê rastiye bi wêje, felsefe, derûnînasî û civaknasiyê bihonin.

“Xweştirîn Kurdistan rûyê te ye / jantirîn Kurdistan Helepçe” Min dû sal berê di helbesteke xwe de wiha gotiye, di yeka di heman dîrokê de jî wiha:

*Nexweşekî/e ku dermanê wî/wê
Sêveke sor a Helepçeyê bû Mir!
Hûn dereng man
Û negîhîştin çîrokeke din
Nexweşê ku dermanê wî
Tenê sêveke sor bû
Mir, li Helepçeyê...
Hûn dîsa dereng man
Wek dawîya çîrokan
Bê hal vegeriyan mal*

Van nûçe û gotinan gelekî bala min jî kişandin û bi awayên xwe yên sê biwarî hatin qeydkirin li bîra min, tevli “Bîra qederê bûn!” Bûn bînebehnên din, li hebûna min. Erjeng e ku zanist gihîştin vê encamê. Bêhn jî di gel bîranînan di heman beşa mêjî de tên parastin; lewma jî bêhn, hin bîranînan jî wêneyan jî zelal tînin bîra mirov, zindî jî dike. Ji ber vêya ye ku ew kurdê li Dortyolê 16, 17 sal paşê; li dem û dereke cuda wê behnê dinase û têdigihîje ku zengil, ji bo mirinê lê dixin! Her wiha li (ji qewlê Dîlan Aydinê ve) “Helepjanê” av! Li Helepçeyê jî, dema ku EM MIRIN, AX! DEMA KU EM MIRIN; sêv hatin ber çavên me! Lewre bêhna sêvan hatibû, ma dê çawa sêv zindî nebûna di hişê me de? Û çî xerîb e ku niha jî bêhna sêvan; dibe Helepçe li bîra me; dil û hinavan dişewitîne, sêvan tehl dike. Ji ber ku, piştî Helepçeyê pêwendîya me ya bi sêvan re guherî, piştî Helepçeyê ne sêv, sêvên berê ne, ne jî em, em ên berê ne! Ango piştî ku faşîstên Baas, em bi bêhna sêvê jî kuştin, sêv şîbiyan mirinê, şîbiyan narîncokan, şîbiyan xapandinê, çûn ba çivîkên şivanxapînok; bûn kurdxapînok, biharxapînok! Û em dereng man, negîhîştin ser wî nexweşê ku dermanê wî tenê, sêveke sor a Helepçeyê bû... Her wiha balkêş e ku zanist dibêjin: dema mirina mirov nêzik dibe, êdî behre û zerengiya xwe ya behnstendine jî winda dike, li ber mirinê. Nema kare bêhnan ji hev derxe. Min jî xwe pirsî; gelo Helepçeyî jî wiha bûn? Bersiv, na! Lewre ew ne li ber mirinê, li

ber jîyanê li ber Newrozê bûn, têra xwe sêv bêhn kirin, sêvên sor, zer, kesk gihîştin li şaxên darên baxçên bîrên wan, lê paşê ji nişka ve mirin!

Dîlso e ku straneke gelêrî ya Helepçeyê wiha dibêje; “Lence giyan be lence / Oxey be lar û lence / Barek sêv barî kir / bo şarekey Helepçe” û hêja Kejal Ehmed di helbesteke xwe de wiha gul avêtiye vê stranê; “Ez û tu wek ew barê sêva ne ku nehatine bar- kirin bo Helepçeyê ne.” Ma dê çawa riya kulîlkên sêvên Helepçeyê me ber bi Helepçeyê ve nebe?

Dixwazim vê jî bibêjim, em wek kurd li birîna xwe ya Helepçeyê, li mirina xwe, hêj xwedî derneketine. Ev yek ji bo Başûr pirtir derbasdar e; em bala xwe didinê salê carekê bi bir tînin û hew! Ma Helebçe wiha tê hembêzîkirin, wiha tê dermankirin? Ma Helepçe dikare wiha aş bibe, lêvên xwe tevli kulîlkên sêvan bike? Me qet jî xwe pirsîye; ka Helepçe kî ye, ka em kî ne, çî ne li Helepçeyê, çawa ne? Ma birîn tenê bi ax û ofan, bi bir-darî, bibîranîn û belavokan baş dibin?

Helebçe birîn e, mirin e... Birîna kûrtirîn e Helepçe û dişixule; birînen ku dişuxulin jî, bijîjkên sexte nas nakin. Vê bike ku ew jî nexweş bikevin û birîndar bibin.

Em tev deyndar û birîndarên Helebçeyê ne. Lazim e, em rojekê xwe bigihîninê û darên sêvan lê biçînin. Lazim e, em Helepçeyê bikin Helepsêv! Da ku erd û asîman bibin sêv! Tevli ax û avê bibin, tevli mirinê... Ji ber ku diyarekî herî zêde liyaqê sêvan e, Helepçe ye. Ji bo ku sêv bigihîjin wateya sêvîtiya xwe jî ev yek pêwîst e. Lewre li der û demekî ku tu; bi bêhna sêvan hatibî kuştin, êdî nema karî wek berê li awênayan binihêrî û bêhnan bikişîni nava xwe. Ji ber ku êdî kişandina bêhnan; bi xwe re şikestina bîranînan tîne; ji nû ve ji kevin ve; dişikê her bîranîn çizîn ji kezebê tîne! Dema zengil lê dixin ji dêvila “rojbaş”an dibêjin “janbaş”, jan... Baş..! Wek ku niha hestiyên me yên li gorên tomerî ne, li gorên bîrkoriya me û ji malzaroka axê hildikşin jor û dibêjin, “Em li vir in, em hatin,” “ey welato em heliyan, ceger li erdê riziyan” ew heval û hogirên delaltirîn, piştî ew qas salên bê newa, bê stran, ji çal û colan hildikşin û tên. Bi çîrokên xwe yên xwînbûyî, stranên xwe yên şewitî, bi serên xwe yên jêkirî, xeyalên xwe yên koçberkirî, tên! Lê em, bi hebûna xwe ya ku şîbiyaye, ya peyrew û xeyaletan çî dikin wan çawa pêşwazî dikin? Em kî ne li ba wan? Ku em wiha peyrew bimî-nin li pêşberî wan, dilê me dilîtiya xwe winda neke?

✓ **“Bişkivîna risteyên şikestî”. Risteyên te kîngê û çawa şikestin? Û ev şikestin çawa bûn vîn û bişkivîn?**

Dema ku min wek gelek kurdên serhildêr sing û berê xwe da pêşberî bahoze û bageran; şikestin risteyên

min, lewre bahoz û bager risteşikên in... Her wiha; ji ber ku dinya ji gundekî şewitandî valatir bû, ji ber ku mirov tu caran tiştê ku lê digere nabîne, ji ber ku em di her 360 salîseyên saniyê de dimrin, ji ber ku peyrewên pisîkên zaroktiya me jî terka me dikin, ji ber ku em wek welat çar parçe lê wek kes parçe parçe ne, ji ber ku lekeyên ji ava gul û hinaran ên li cilên me dibin xwîn piştî mezinbûnê, ji ber ku baxçeyê yarê timî "tar û mar e", ji ber ku wate bê sekn diguhere lê peyv hişkelîng li cihê xwe disekin, dişikên riste. Lê ev jî hene; ji ber ku Melayê Cizîrî dibêje; "Newaya mitribê cengê / Fîxan avête xerçengê / Were saqî heta kengê / Neşûyîn dil ji vê jengê," Don Kîşot dibêje; "Xwezî rastiya ku xeyalê xwe tê wer kir, ewqas hişk û diwar û aşên bayê ew qas jandardar nebûna", ji ber ku Ece Ayhan dibêje; "Ey bêbaskî, tu yê qet neyê fêmkirin", ji ber ku "însan teyrê bê per e", ji ber ku Lîza Xanimê gotiye; "Ku berf aviyan, ku berf aviyan / Dê bihar were ku berf aviyan" bihara me kurdan nehatiye, ji ber ku Gelale Xanimê Loristanî gotiye; "Ez ew gul bûm, hatim ber derê te / Ez ê bêhna xwe bidim, derî veke", ji ber ku Yeats gotiye; "Mirin niqutî dilê firokevanekî Îrlandî", ji ber ku Vînos Fayiq dibêje; "Min dîroka gunehên xwe yê xweşik / Ji birîqîna çavên stêrkan re dixwend" ji ber ku Selwa Gulî dibêje; "Her mirinê gazî dikir were govendê! / Li ber şîniya çavê min bû"

Ji ber ku Şêrko Bêkes dibêje: "Li ser kelê çivîkek ji tayekî giya re / Ev digot: Otonomî nake qiliçka dareke Rehîmawa / Lê me bejna hezar daristanan / Li ser wê şewitand". Ji ber ku Bau-dellard dibêje: "Bahara ku di hate perestîna bêhna xwe winda kir".

Ji ber ku Ehmed Huseynî dibêje: "Dûmana sibe-han/ ji toza / Biyanîyan / Bibêjin!"


Ji ber ku min gotiye:

*Îhtîmala wek hatina ewrekî qasid
Ku hesta: "Lez ke dereng e!" çêke
Hatî tu! Me dagirt çîrokên xwe
Bi ihtîmala şoreşên bextewar*

*Yezdanên Mîsrî kenîyan bi me
Bi qasî bêhna baranê jî
Neman em, li vê dinê
Tu ewrekî qasid bûyî
Te hesta lez ke dereng e!
Bera rihê me da.*

Ma dê riste çawa karibin neşikên Elîxan Loran!
Ji ber ku ev riste tev dizimzimîn di bîra dilê min de.
Û dûre xwe li dûvelên qirîstal a bîra min wer dikin û her tiştî dişikînin, min got Risteyên şikestî. Ma jixwe di rajena hebûnê de jî timî şikestinek nîn e? An na dê

çima wiha sal dozdeh me şinge-şinga cam, qirîstal û cêrên hebûna me bûna? A niha Loran, a niha jî dişikên riste, di qirîstalên bûneweriyê de. Ji ber ku şikestin rewşeke bûnewer e, rîya xwe bi "vîn û bişkivîna" pîrsa te naxe. Lê XWE ye. Lewma jî carinan li zerya giyanê me yê qeşagirtî, dibe mizgîniya biharê; qeşayan diderizîne û av û avgiyanan dilgeş dike. Carna dike ku çivîkên biharê xewnên xwe, li hêlînên xwe biterikînin û bi nemir Aramê Tîgran re bixwînin. "Merd im merd im, gelek merd im, hem dengbêj im hem sazband im, kul û xeman ez ê berdim, ji niha û pê de bê derd im", û bireqisîn li asîmanê çûyîne. Carinan jî digel hebûna wî şekirê li berîka me, dilê me jî tehl dikin û cinên çîrokên pîrejînan, kevîrên tehl diavêjin binê bîra me ya tije gulên hişkbûyî, digel tîqetiqên nivê şevan.



✓ **Dêyên kurd ji zarokên xwe re dibêjin "berxê min" lê bavên kurd dibêjin "şêrê min / pi-lingê min". Ji vê derê ez dixwazim werim ser zimanê jinan. Di helbestê de zimanê jinan ji bo te tê çî wateyê? Tu dikarî mînakên jî bidî?**

Rast e, zimanê jin û mêran, dê û bavên jî hev cuda ye. Lê min "şêrê min" qet nebihibû, tevî ku "berxa min, berxê min" pîr tê bikaranîn, ji ber ku şêr wek sembola şer cih girtiye di derûniya me ya civakî de. Le ev heye; zimanê jinê jî hatiye dagirkirin bi erk û zordestiyê, lewma jî xwebûnî û xwerûtiya xwe winda kiriye. Ji ber vê rastiye yê ku berxan dikin "şêr" jin in jî mixabin... Lewre bindest jî dibin hevparê sûc û ser-

destî û bindestiyê mezin dikan. Lewma jî, mesela ku em îro jê re dibêjin “zimanê jinê” zêde ne diyar e. Rast e, heye, di gelek kesayetiyên de vîndar bûye. Lê dîsa jî wek peyrewêkê ye. Belkî dûr were, lê niha ew hevoka Marx hate bîra min; “Li Ewropê peyrewêk digere, ew peyrew komînizm e” ku em jî bo mijara xwe bibêjin li Kurdistan û cîhanê peyrewêk digere, ew peyrew zîmanê jinê ye”. Lê jî bo ku peyrew bê nav û nîşan, bê mal û rêbaz û rêzik e; meriv zû bi zû nikare bigihîjê û bi destên wê yên narîn bigire. Ji ber ku jî bo meriv bikaribe bigihîje wan, gerek ew bibin kesên rastîn, da ku tevli demsalên me, tevli şevbuhêrk, çîrok, xem û hêviyên me bibin. Lewre bi dirûşmeyan, civîn û pêşnûmayan tenê baxçeyê jiyanê şîn nabin...

Lê dîsa jî wek xwendevaneke jin, bi serbilindî û şanazî li pirtûkên nivîskarên jin ên li pirtûkxaneyan mîze dikim û em jî hev re çavên xwe dikirpînin; gul vedibin di navbeyna me de. Dizanim ku ez çî qas xwendevaneke çê bim, em ê jî ew qas nivîskarên çê bin. Dizanim ku dê tarîtiya me tarîtiya hev, ronahiya me ronahiya hev gurtir bike. Ji ber vê yekê; berhemên hemzayendên min, bi şikestiyariyên xwe, bi pirên xwe yên hilweşandî, bi hêrs û hêviyên xwe, bi jan, koçberî û ajdariyên xwe gelek nas tên ji min re, li kîjan aliyê cîhanê, di kîjan demê de hatibin nivîsandin jî, ev yek naguhere. Dilê min, xwe li nav gulên wan ên bi keser dibîne, hîs dike ku ew gol, bi rondikên ziv-masiyên çîrokên jinewer çêbûne. Ango ez xwe li mal, “li hêlînê” hîs dikim di berhemên jinan de. Dizanim ku li pişt her deriyekî cinawirek nîn e, gur û rovî diranan tûj nakin. Dizanim ku ne bê star û bê mal im, ne xerîb, koçber û bê kes im. Li mala xwe me; ne jiyan xewnereşk e, ne xewn mirin. Dizanim ku dê neyê me vecinîqandin, dê dilê min neyê lihevexistin. Dizanim ku dê çîrok ne dijminên hev bin, rû jî ne bi rûpoş bin. Dizanim ku li mala xwe me, wek çivîkeke bextewar li hêlîna xwe. Dilê min heta dikare difire, tevli asîmanan dibe, tevli xewnên biharê.

Ez ê çend mînakên ji rêzehelbestên Şahmaranê (*Weşanên Avestayê*), ku ez gelek bextewar û şanaz kirim, bidim.

Min qehwa xwe ya tehl

Bi şekirê axaftinên wî vexwar

Min qehwa xwe ya reş

Bi rengê çavên wî yên kal firand

Min qehwa xwe ya germ

Bi hênikiya gîrnîjîna wî re bidawî kir

(...)

Wextê ji xweşî bimrim

jî ber ku bi tenê

Min qehweyek vexwar di gel wî

Ma ku ne jin û ne xoşewist Kejal be kî dikare van

risteyan binivise? Ma qehwe kîngê dikare wiha ezîz û watedar bibe?

“Li kê pîroz bikin vê kalêsalê / li Şengalê yan li çiyayê Qendîlê (Selma gulî Şev Şahîd e)

Ev pêncî sal e / Ez zaroktiya xwe / Di bin balgîfa xwe de vedîşêrim / Belkî... Rojê leşker jî kolanên me dûr bikevin / Da dayika min bibêje tu jî here bileyze” (Diya Ciwan, Bendêr)

“De bila jî şeytan / Dest pê bikim / Belkî şeytan / Elîfbaya vê tobeyê min be / Secde dikim li pêş agirê semaya xwe û şeytan” (Nahîd Huseynî - Şevêk bi Şeytan re)

“Bêtirî mîrekî / Bêtirî jinekê / Me li hev guhdar dikir” (Axîn Welat-Bayê Bakur)

“Ji yekê/ê ku wek bebîkek mirî di nav fanosek cam de hepiskirî mabe re dinya bi xwe xewneke ne bixêr e” (Slvya Plath jî tekane romana wê, Bell jar, fanosa cam) ku hema piştî nivîsandina wê xwe kuştîye û jî Vîrgînya Woolf a ku teknik û rêbaza “herikîna zanînê” diyarî deryaya wêjeyê kiriye; “Ya ku mirov diwestîne nivîsandin nîn e, avasaziya wê ye. Ku ez vê paragrafê binivîsîm dê ya li pey wê were, paşê jî ya din...”

*Sibehên ku ne bi sikûnetê ne jî bo hêminiyê derbas dibin. Dojeh û hez tevli hev dibin.

*Havîneke pir xerîb, pir balkêş: hestên nû, dîl-nizmî: şahîyeke bê nasname: jî hêla wêjeyî ve jî bêhêvîti. ”A Witer’s Diary)

Zîmanê nivîskarên jin, wek pelên avê ne; bê dawî û temenkurt in; hêdî û lezgîn, zelal û bi gîremol, bê deng û bi deng, nerm û serhildêr. Şikestiyar û dilşikên (risteyek min a wiha heye; “bersivên dilşikên dişikên”) perî û şeytan, xwedawend û nebûn, hebûn û berzebûn, li gel hev in.

Ev jî heye; “gihayê hewşê tehl e.” Ango jî bo jinan du caran tehl e. Cîhan jixwe bavîksalar e, bi tevî cîhana xwe ya wêjeyî ve jî... Bes jin bi xwe jî hê li berhem û nivîskariya hev xwedî dernakevin, teva ku ev yek gelekî girîng e jî. Lê çî qas zanîn û azadbûn bi pêş bikeve dê ev kêşe jî çareser bibin.

Lewre azadbûna jinê çawa ku dê cîhanê azadtir û delaltir, xweştir bike, dê wêjeyê jî welê bike. Jixwe baş tê dîtîn ku wêjeya bê jin nîvî ye û ew nîvîbûn valahiyeke wisa diafirîne ku dibe hûtekî nêr (ku hût tev nêr bin jî ew nêrtir e) û zengilên her tewre tecawîzkariyê lêdixe! Ji ber vê yekê xwendekarên rastîn û nivîskarên rastîn dizanin ku wêjeyê - nivîs- kelamê bê nivê cîhanê nabe. Kulek e. Kor, lal, ker û nîvî ye. Mixabin jî ber rastiyên me yên civakî carinan meriv dibîne ku jî qewlê pêşîyan ve; “Qazî û her kes jî xwe razî” ye rewş...

Dixwazim vê bersivê bi vê helbesta xwe bi dawî bikim:

Jana Ezîz

Wek janê ezîz be / Ne wek avê / Hespên rewan bi-bezîne ji risteyan / Wek janê ezîz be

Jana min be / Were / Bila xirab bibe mala me

✓ **Di dîwanê de peyv û têgiha "derbas be" ("û derbas be ji cîhanê, derbas be" ji helbesta "derbas be", "derbas be, bextewarî nîn e", "ev şeva heyva derewîn e, derbas be", boxçikên vala cinên newala jî nîn in êdî, derbas be", ji helbesta heyva şikestî, "ey bajarê bayê! me li kolanên xwe yên nederbas veşêre", ji helbesta bajarê bayî, "şêrîniya xwe hişt li devê me, derbas bû heyat", ji helbesta şanoyek e heyat, "derbas bûn hesp, çûn" û "Metîna! Derbas bû ji min cîhan" û "em derbas bûn ji navtenga gustîlan, derbas bûm ji te Metîna û giriya", "razê Metîna, derbas be ji vê hişyarîyê", ji helbesta Metîna) mîna têbîniyekê her carê xwe li ser ava hişê mirov dixê û xwe noqî avê dike ango ev peyv û têgih pir "derbas" dibe. Ev mînakên ku min dane di 40 rûpelên pêşîn de "derbas" dibin û mînakên piştî rûpela 40'î jî hene. Gelo "derbasbûn" qonaxa di navbera "şikestin" û "bişkivîn"ê ye yan jî tişteki din e?**

Derbasbûn, rast e, pir "derbas" dibe di dîwana de, min jî hingê, dema dîwan di ber çavan re "derbas" kir, tê derxist, lê ez "derbas" nebûm! Ji ber ku jî dilê min refên qulingan, ji aqilê min keştiyên biçûk û şîn "derbas" dibûn. An jî ew dîwan bûbû karwanek ji bibîrxistînan û keserê û di ber min re "derbas" dibû.

Her wiha "derbas"bûn, li ba min; rewşeke neborî û bûnewerî ye, ango em timî "derbas" dibin, an jî tişt timî ji me "derbas" dibin ku, "derbas" bûn, tewreyek herikîne ye jî. Niha ev heft pirsên te yên Lorani jî ji min "derbas" dibin. Ez jî ji wan... Tewreyek ji reqsa mirin û jiyanê ye. Jê "derbas"bûn. Min di helbesteke xwe de gotiye; "Akasya, dara derbasya/ kulîlka nînederya akasya" Ma; "derbas"ya çi ye, ji ku hat? Ez nizanîm lê di tevger û hilavêtina rojena bûneweriyê de, xwe anî ser zimanê min. Belkî "derbas"bûn, tewreyekî dagerîne ye jî. Dema ku gerdûn jî her wiha em jî li dora xwe dadigerin, bêhnok "derbas" jî dibin. Dîsa pêwendîya di navbeyna me û tiştan de jî li gor "derbas"bûnê teşeyê digire. Mînak; Dema em ji çemekî "derbas" dibin ew jî ji me "derbas" dibe û ev jihev "derbas"bûn, şopeke bêdawî dihêle di navbeyna me de. Ku wiha ne-bûya me yê nekarîbûya çemê ku em ji wan "derbas" bûne, wiha li bîra xwe bihişt û xwe jî li bîra wan! Ji ber ku li gor fîzîka kuantûmê; av û çem jî deng û şopê vedîşêrin, ango bê xatir û bîranîn "derbas" nabin. Her

wiha dema ku em ji tişteki "derbas" dibin, ne di ferqê de bin jî; parçeyekî ji me, bi xwe re dibin. Parçeyekî xwe jî lê dihêlin. Hesta "derbas"bûnê ji min re wek vê helbesta min jî tê:

Lêvên wê ji hubra sor bûn

Gava dikeniya

Tîpan gul vedida

Ewr derbas dibûn ji navbera me

Ji nişka ve

Baranê destên xwe diavêt ser milên me

Ew tu bûyî?

Ev riste jî li ser "derbas"bûnê ne! Dema ku em ji çîrokekê "derbas"î çîrokeke din dibin baran dibare, şil dibin por û gore...

Wek ku min got, "derbas"bûn, rewşeke herdemî ye. Dema ku bedena me "derbas"î tişteki nebe jî naqede. Lewre hingê jî raman, hest, bîranîn, bibîrxist û hêvî "derbas" dibin ji hişê me. Ku di kêliyê de mirov bisekîniya û ev "derbas"bûnên di giyanê xwe de vegota dê çi qas balkêş bûya? Lê ev heye; dê peyvên têra vegotina van "derbas"bûnan bikira gelo? Na! Ji ber ku wate jî timî "derbas" dibin, xwe nû dikin li hebûna me ya giyanî, lê peyv wek qaşil hişk û wetar li cihê xwe dimînin. Ka ez helbesteke xwe ya din a bi "derbas"bûnê mînakekê bidim:

Hubîr dînuqute ji dilê min

Rengê wê jan...

Lêvên xwe dipertînin dîsa

Dinya xan...

Însan dewran e!

(...)

Belkî ez bayekî dîn im

Belkî jî qîzeke şeyda...

Lê bi xwîna xwe dinivîsim

Her çi dinivîsim...

NEXWÎNIN û derbas bin ji min

Xuya ye ku dê serboriya min û "derbas"bûnê heta mirinê bidome ku mirin jî tewreyeke "derbas"bûnê ye; tu ji jiyanê "derbas"î mirinê dibî. Pirsê te jî bala min kişand. Belkî jî pêwendîya şikestin, bişkivîn û "derbas"bûnê bi hev re heye. Lê dema ku cêrek li ser pirekê dişikê, êdî nema dikare "derbas" bibe ji wê pirê. Dema ku şûşa dilê mirov jî li dem û derekê dişikê nema dikare wek berê "derbas" bibe. Lewre şikestî ye. Lê dîsa jî ji bo ku mirov ne cêr in û ji îskaneke şikestî ye dikare "derbas" bibe. Digel şikestinê jî "derbas" dibe ku ev "derbas"bûneke bi bişkivîna gulê ye û ew gul ne "gula ne gengaz" e! "Derbas"bûn carinan jî dişibe heyfstandinê. Em ji dem û dewrên ku ne li gorê dilê me ne "derbas" dibin ne wisa? Ji kes û bûyerên ku bo me ne hêja ne jî... Ango vê carê "derbas"bûn, nabe tevlihevbûn û parçeyê bi hev ve hiştin,

dibe jibîrkin û redkirin.

Ez ê bi helbesteke xwe ya pêrêr a ku hesta “derbas”bûnê dide min “derbas” bibim ji vê pirsê:

Min tu ji birîna li bin çengê te nas kir

Xwe veneşêre!

Her kes bi birîndarî

Vedigere zaroktiya xwe

Gomleg û kiras qetiyayî

Tilî şikestî

Lêv xwînûyî...

Her kes bi birîndarî

Vedigere zaroktiya xwe

Bi çavên şikestî

Dilê westiyayî

Lêvên xwînûyî...

Her kes bi zimezima xatiratan

Vedigere zaroktiya xwe

Bi helkehelk û poşmanî

Teva ku xwestibû bilez mezin bibe jî...

Her kes bi çavên şikestî

Vedigere zaroktiya xwe

Lew vegeer birîn e

Neveger mirin...

✓ Mizgîn, piştî çiyayan girtîgeh û helbest çi ne?

Baba Tahir dibêje:

“Te bi xwe gotibû ku ez keştivan im

Keştivanê keştiya ava çavan im

Pir ditirsim ku keştiya min xerq be û

Di vê deryaya bê dawî de bimînim”

Girtîgeh, xerqûn û noqbûna tevî keştiyan e.

Dojeh e, mirîna çivikên çiyaza ye. Paradoks jî ev e ku; hilkişîna çiyayan an jî ramanên çiyayî te dixin girtîgehê ango tu çi qas çiyayî bi ew qas dîl dibî. Dema ku min xwest tevî refên azadiyê bibim, hevalê me şehîd Aram got: “Te baş biryara xwe daye. Ev rê gelek zor e, an şahadet an jî girtîgeh e dawîya me...” Min bi lez got: “Erê, ez dizanim!” Le ya rastî îhtimala ku min dizanî an jî hîs dikir tenê kuştin, şahadet bû. Girtîgeh ne di nav îhtimalên min de bû. Mixabin bû rastiya herî dem-dirêj. Min di romana xwe ya binavê Ronya de (niha li ser dixebitim) hinek behsa zindanê / girtîgehê kiriye, lê tu carî ne bes e. Ma DOJEH dikare vere vegotin an jî şayesandin? Di serdema navîn de serdestên dêrê xwestinê ku şayesandina DOJEHê û helbet a şeytan wisa pêk bînin ku mirov ji xof û tirsê bilerizin û gunehkarî û serhildêriyê li hember dêrê tu carî neynin bîra xwe! Lê dikin û nakin “tiştên ku dixwazin” nayê dîtin, di dawiyê de ji Pan û Satyrên Mitosa Yewnanan “Şeytanek”î çêdikin, ji devê tîmseh û hûtên Misrî û Mediyayî jî devê DOJEHê! Gelo digihîjin armanca xwe? Belê, nî-

venîv be jî, mirov ji “wan xuyangan” ditirsin. Lê em ên niha bihêle tirsê kenên xwe jî bi wan xuyangan naynin. Helbet derdê min ne ew e ku ez şayesandineke wisa pêk bînim ji bo girtîgehê, lê ev heye; vegotina der û demên man û nemanê zor e, heta ne gengaz e. Lê dîsa jî zindan di çîroka her kurdî/ê de hebûye. Mînak; dema ez zarokeke biçûk bûm jî zindan di jiyana min de hebû; ji ber ku bavê min, xal û apê min di zindanê de bûn û dapîra min bi min dia dida kirin ji bo wan, lewre diayên zarokan qebûl dibe! Lê balkêş e, teva ku ew dia, ji bo tevî girtiyan û li hemberî tevî zindanan bû jî; zindan hê hene, bi deh salan e ku bi kurd tê de girtî ne, ez jî di nav de... Kî çi dizane belkî ew Mizgîna biçûkî hê jî ji bo girtiyan dia dike. Lê bawer im ku bi kevîr û kuşan êrîşî zindanan jî dike...

Jixwe navekî zindanê jî “mirîna bi saxî” ye ku “mirîna bi saxî” ya diwartirîn e. Ji ber ku tu hem heyî, hem jî tune yî, hem sax î, hem jî mirî! Ji ber vê rastiye jî hem jiyan hem jî mirin xwe di kesbûna girtî de li dûvelan wer dike, dikuje. Ew xwekustîna mirin û jiyanê, bi salan didome ku, li gor min helbest tewreyekî xwekustîna ye, lê xwekustîna herî delal û romantîk! Her helbestê, bi xwîna dilê xwe, giyanewerên li bîra xwe (ji ber ku bîra me bi qeydkirînen wan kesan û tiştan jî bê mirin dike) û bi bîrxistinên ku dinivîsim ji ber ku helbestê bê mekan e, di helbestên xwe de bewartir dibim... Helbestên min di hebûna me de ‘bêmaltir’ dibin. (Peyva bêmaltir bibîrxistinek pêk anî û niha Eyşe Şan bi dengê xwe yê xweş “lê lê bê mal”ê dibêje, silavekê li “Bêmal” didim) An jî wiha bêjim; ji bo ku “zeman û mekan” xwedî sê biwaran e; em sê caran bê dem û dewran dibin; paşê jî nişka ve dengê baskên çivikeke derengmayî tê me; em vedicinîqîn, bi vecinîqîna me sê sed pel diweşin ji darepayîza helbestê. Du risteyên min belasebeb wiha nabêjin: “Xwezî em ewr bûna / xwezî em ewr bûna!”

Ez dixwazim vêya jî bêjim; wêjeya zindanan, bi navê din berhemên girtîgehan jî derdikevin pêşberê tîrêjên çavên xwîneran. Helbet jî ber rastiya girtîgehê ya spesîfîk hin nebesî hene û jixwe em dikin mijara gengeşiyê jî. Lê ev nebesî, mafê înkarkirin, biçûkdîtin û jî-nedîtîvehatinê nade tu kesî/ê. Mixabin, çawa ku di warê polîtîk de hin derdor dibêjin “Şoresger jî bo kuştin û zindanê ne û têra xwe ev tişt kirin, mîsyona xwe bi dawî kirin. Bila êdî vekîşin!” Di warê wêjeyê de jî nê-zîkatîyeke bi vî awayî heye. Mînak; Carekê hevalekî bi nav û deng ku ez keda wî girîng jî dibînim gotibû; “Divê mirov an Mehsûm Korkmaz be, an jî Yannis Ristos”. Xêr e? Çima em neçar in ku mehkûmî navbera du mînakên bibin? Çima şoresger jî hunerê / wêjeyê tê dîrxistin, çima em nikarin hem bibin şoresger hem jî wêjewan ku gelek mînakên vê yekê jî welatên din jî

hene, ji me jî hene. Mînak Che Guevera, Xelîl Uysal û hwd. Dîsa Aragon, helbestên xwe yên herî xweş, dema li Îspanyayê partîzan û şoreşger bûye nivîsandîye, em ê çawa dubendî û durengiyê li hev ferz bikin? Ma ev jî ne nêzikatiyeke desthilatdar e; hem jî tevî ku xwe wek “rewşenbîrên li dijî tevî desthilatdariyan” dibînin? Bi kurtasî huner, wêje, helbest; otorîte û îteatê napejirîne. Lê, carinan em dibînin ku nêzikatiyên otorîteyên ku dibêjin ji hêla kesên em derotorîteyan e, derdikevin. Dive em nekevin çewtiya ku “reel sosyalîst” ketinê û gotin “ku desthilatî (dewlet) di destê me de be baş e. Lê ku di destê yên din de be zordest e.

Lewre em pîr û pak in!” Ji bilî vêya ger em azadîxwaz û demokrat bin, divê di her warê jiyanê de vê yekê bidin jiyîn. Ango çawa ku di warê takekesî û civakî de demokratîzasyon pêwîst e, di warê wêjeyî de jî pêwîst e. Lewma jî ihtiyaca me bi pisporên qadên cur bi cur heye lê, bi Big Brother’an, bi “paşa û generalên” ku sînoran datînin, reş an jî spî li me ferz dikin nîn e. Jixwe otorîteryenî jî mijareke hesas e, bêvîna kes û civakan jî tê hîmatê. Belkî ev nêrîn jî bo wêjeya me hinekî zû jî were dîtin. Lê ji bo ku awêneya me sibê, derengmayîne nîşan nedin, divê em ji niha ve pirsnişanên xwe bêjin.

Li gel vana dixwazim ji bo “nîfşên Rewşenê” jî çend tiştan bêjim. Bi rastî jî Rewşen û navên ku timî pê re derbas dibin xwedî risteke dîrokî ne, dê timî werin vegotin jî. Lê carinan bi nîrxandinên hin hevalan, ev pîrs bi mirov re çêdibe: Gelo nîfşên Rewşenê hema ji asîmanan daket nav dem û dewrana me? Ku keda Apê Mûsa û ya bi hezaran cangoriyên Kurdistanê û serhildanên Cizîra Botan, Hezex, Licê û Şîrnexê nebûna, me yê îro karibûya behsa “nîfşê Rewşenê” bikira? Vê gotina pêşiyar hat bîra min; “Kaniya ku te jê av vexwar kevir neavêje!” Ez nabêjim ku “kevir diavêjinê” lê spas jî nakin.

Helbet nîrxên me jî kani jî ne muhtacê spasdariyê ne. Lê spasdarî jî meziyeteke pêwîst û esaleta wefadariyê ye.

Li aliyê din; bi rastî jî bişkivîna wêjeya şoreşê hêj pêk nehatiye û mixabin di vê pêknehatinê de yên herî berpirsyar, an jî “tewanbar” em şoreşger bi xwe ne. Lewre bi hezaran mînak, “sehne”, hest xuyang, sekin û sebat û têrwateriyên erjeng hene, heta bêhempa ne jî. Lê hê ne pênûsa me dikare wan zindî bike û vejîne ne jî sînemaya me. Em wan lehengiyên bêhempa di bexçên dilê xwe yên nazenîn de vedîşêrin; carinan li ser wan digirîn û dinalin.

Ku ev heyam jî zû de derbas bûye û divêtiya “wan” bi vê yekê nîn e. Carinan jî nikarin êdî veşêrin. Di her hilavêtina dilê me de li tevahiya hebûna me diherikin û vê carê em dest diavêjin revê ku ev bi xwe jî sendromeke giran e. Lê wê rojek were dil û hîsên me yê take-

kesî û civakî, derî û şibakeyên xwe veke û gerdûnên diyar û nediyar bihejîkîne. Bi kurtasî vêya lê zêde bikim; serhildan û serhildêrî baskên huner û wêjeyê yên din in. Herdu bask bêyî hev nabin.

Mînak: Niha li Tûnûs û Misirê serhildanên gel hene; ev serhildan mîzgîniyên serhildan û afirandkariyên hunerî ne jî ku vebûna takekesî û civakî jî didin xuyandin. Dixwazim mînakek ji me, ku niha hat bîra min bînim ziman. Tê zanîn ku helbestek Zahir Kayan a bê hempa heye: Rehşanê! (jixwe bûye straneke gelek xweş jî) ku hevala Rehşan wê çalakiya Newrozîn pêk neanibûya, dê ev helbest jî nebûya. Ango çalakiya Rehşana delal û şoreşger, bi çalakiya rêzdar Kayan a helbestê hatiye temamkirin. Her du çalakiyan gelekî xweş û kûrwate hev abadîn kirine.

Mixabin, ev mînak jî hêla me piraniya “ehlên hubrê” ve hinek tenê hatiye hiştin. Her wiha me Helepçe jî veneguharandiye abadîniya hunerî. Dema tê bîra me em axîn û fixanan bilind dikin, lê ev ne bes e. Tiştê ku min gotibû “deyndarî” jî ev e.

Em deyndarên hemû lehengî, trajedî û birînên xwe ne. Û êdî mafê me nîn e ku em wan bikin mijara ax û ofan, deşarzasyon û heta bazirganiyan! (Di mînaka Helepçeyê de bazirganî derdikevê pêş) Jixwe ev rewş gelekî xeternak e. Ji lewre dîrok şanî me dide; tevî civak û kesên ku janên xwe veneguherandine huner û wêjeyê, maneviyatê, xwe tune kirine. Ji ber ku ger mirov janên xwe veneguherîne, ew mirov “vediguherînin” û ew veguhertin û veguherin jî, ji ya Kafka xirabtir e; êdî kêzîkbûn jî bi destê mirov nakeve! Bîrkorî, nankorî, bêwefatî, bêkokîtî, biyanîbûn û bêwateî; bi kurtasî ji mirovbûnê, ji afirandkarî û hunerê dûrketin çêdibe. Lewre, ev rastî heye; tiştê ku em teşe nedin wan, ew teşe didin me, anga me “bêteşe” dikin.

Terzî

Meqesa te tiliyên min birî, ey terzî!

Nikarim bineuşan berhev bikim êdî

Meqesa te ey terzî!

Porê min birî

Xeyîdîn bisk û kezî

Meqesa te ey terzî,

Serê dilê min birî

Nema karim hez bikim êdî!

Helbet vana mijarên berfireh û hêjayî gengeşiyên dûr û dirêj in. Bawer im dê di demên li pêş me de bi pîrrengî û pirdengiyê ev yek jî werin zelalkirin. Wek xala dawîn jî vê dubare dikim. Jan û birîn encax bi wêjandin û hunerandinê baş dibin. Divê em vê jî bîr nekin gerçî du risteyên min ên wiha jî hene: “Tu car baş nabin / birînên nebaş” lê jixwe birînên me jî yên baş in, dê baş bibin.

Ji bo serbestiyê biqîre

Asya GENIM

Gava ku mijar li ser mafê jinê be, bi awayekî normal mirov daqûlî fikrên femînîst dibe; ji ber ku di xurtkirina tevgera jinê de ji destpêkê û heta îro kedeke pir mezin dan femînîstan. Li gel vê rastiye ji divê ku hilberîna mêmî bi giştî di çarçoveya femînîzmê de neyê nîrxandin.

Rojevûna pîrsgirêka jinê, di sedsala bîstemîn de bi tevgerên femînîst li Rojava dest pê dike. Dînamîkên Ewrûpayê yên civakî ji bo hişîneke mêmî nehatibû dawerivandin, hişmendîya ku dinyayê bi rê ve dibir ji kevneşopîyeke bavkanî dihat. Heta destpêka sedsala bîstemîn di hîlbijartina rêvebirîya devletê de mafê jinê yê ku hîlbijartinê tune bû. Li Ewrûpayê heta demeke dirêj lédana jinê bi awayekî zagonî weke mafê zilêm dihat dîtin. Jin di avakirina jiyana civakî de tu hebûn rênedabû, jixwe şert û mercên heyî ji bo hebûneke mêmî bi tu awayî derfet nedida. A girîng û ya bi problem ev e ku jin ji wê rastiya civakê ku weke rastiya jiyana didît, bi tu awayî guman nedikir û jinê bi destê xwe statuko diparast. Jinên ku peywirên civakî diqelişandin, di hundirê civakê de dihatin ricimandin. Hişyariya jinê piştî destpêka sedsala bîstemîn dest pê dike. Berî sedsalê bê guman di asta entelektuelî de hin navên mêmî yên girîng derketîye lê bi awayekî aktîf piştî sedsala bîstemîn dengê mêmî serî hildide. Li Îngilîstanê di 1914'an de ji bo mafê jinê yê dengdanê û ji bo pêşenga tevgera suffragetteyê* Emily Pankhursê (Pankhurs di girtîgehê de ye û ji bo bi desistina mafê jinê yê dengdanê dikeve greva birçîbûnê) Mary Richardson bi bivireke biçûk dikeve Muzeya Neteweyî ya Îngilîstanê. Bi bivirê xwe cama tabloya Diego Velazquez'î ya bi navê Venusê dişkîne û dawiyê li ser wêneyê çend qeliştekan vedike. Çalakiya Richardsonê di medyaya neteweyî ya Îngilîstanê de cihekî girîng ji xwe re dibîne. Di armanca xwe de bi ser dikeve ji ber ku bi çalakiya xwe dixwest mafê jinê bike rojeva Îngilîstanê. Bi heman şewazê çalakî li welatên din ên Ewrûpayê jî pêk hatin. Li Almanyayê di sala 1918'an de jin mafê dengdanê bi dest dixwe, di sala 1919'an de jinên siyasetmedar dikevin parlementoyê. Hunermenda daîst Hannah Hoch bi karê xwe yê Dada Panoramayê bûyerê pîroz dike. Dëshilatdariya nêr

ji bo jinê xetereyeke hebûnê dihat dîtin. Tevgera mêmî ya ku bi demê re weke femînîzmê hate binavkirin bi vê xetereyê hisiya. Di rastiya xwe de jinên femînîst û tevgerên jinan, dixwestin ku tégihîna jinê ya di civakê de bê guherîn û girtîgehên ku ji jinê re hatibûn avakirin yek bi yek bèn xerakirin, yanî di jiyana de hebûna jinê bi hişîneke jinî bi mane bibe. Li gorî femînîstan zilêm bi awayekî îlegal li ser jinê hukumdariyeke hişk avakiribû. Ev pêl di sedsala bîstemîn de xurt dibe. Jin dixwaze bi zilêm re li ser hukukeke wekhevîyê bijî. Femînîzmê di hundirê xwe de gelek şax berda. Hin perspektîfên cuda xwe çekir li ser bingeha femînîzmê. Femîzma lîberal, femînîzma cihêxwaz, femînîzma sosyalîst... Femînîstên lîberal di civakê de wekhevîya zayendî diparast, divê jin weke zilêm ji her mafên civakî sîdê werbigire, lê femînîstên cihêxwaz ev dan û stendin bê wate didît û guherîna zilêm pêkan nedidît, li gorî cihêxwaziya li hemberî dëshilatdariya nêr jin ji bo dëshilatdariya xwe divê tégîkoşe, femînîstên sosyalîst ji bo azadiya jinê girîngî didan karê siyasetê lê siyaseteke ji perspektîfa civakparêziyê. Di her hal û karî de tevgera femînîzmê dixwest ku di civakê de şertên jinê bèn normalîzekirin.

Li Fransayê hin femînîst bi ramanên girîng derketin ser dika ramangeriyê. Weke Simon de Beauvoir, Julia Kristeva... Beauvoir dibêje "Jin ewil weke jin nayê dinyayê dûre dibe jin" li ser vê bingehe, zayenda biyolojîk û zayenda civakî weke du kategoriyan ji hev cuda dinirxîne. Zayenda civakî di sînoren rewşa civakî û dîrokî de ji aliyê civakê ve hatiye çekirin. Beauvori ji bo serbestiya jinê û tégbirina qedera zayenda civakî tégşîneke rexistinî pêşniyar dike. Kristeva jî li hemberî redkirina detyê derdikeve û ji bo detyê dîskureke nû pêwîst dibîne. Li gorî wê fêrqên zayendî ji bo hebûna jinê girîng e divê ji nuh ve bê nîrxandin. Di parastina fêrqên zayendî de bi femînîstên din re dikeve dijberiyê. Ji ber ku dîskura detyê bi feraseta nêr bi form bûye ji ber vê yekê di zimên de girîngiyê dide dîskuren nuh. Hin femînîst ziman û çandê weke alavên bavkanî dinirxînin û terkkirina van qadan pêwîst dibînin lê Kristeva li hemberî van fikran derdikeve, ziman û çand ji bo wê du kirûyên girîng

in ji ber ku jin berî dêtiyê “kirdeyeke ku diaxife” ye. Feraseta her heyamê li ser çand û zimên xwe diteyisîne dîrokê. Ku mirov rewşa heyî bermeqlûp bike û jinê di civakê de serdest bike wê bê dîtî ku çand û ziman bi rengekî mê form bûye. Problem ev e ku têgeh û têgihiştinên heyî bi giştî bi nêzîkdayîneke nêr hatiye avakirin. Jin bi lêpîrsîneke hişînî jiyanê divê ji perspektîfa xwe ya mêtîyê şîrove bike. Her têgeh wateya xwe li gorî kesa/ê ku şîrove dike distîne. Kristeva li ser ferqên zayendê disekine û hewl dide di navbera têgehên “nasname” û “ferqiyet” ê de tekiliyekê ava bike. Qebûlkirina nasnameyê bi xwe re terkirina ferqan ferz nake. Bi her du têgehên dikare hebûnek bê derxistin. Jin divê li gorî feraseta ferqiyetê nêzîkî zayendê bibe û ferqên xwe dermale bike. Ferqên zayendî li gorî civakan dikare biguhere. Ji ber ku her jin bi ziman û çandê din dide û distîne ku ew yek di navbera jinan bi xwe de jî ferqên mezin derdixe. Weke Kristeva dibêje ku

ferqên zayendî dikare pir nasnameya bûyînê jî ve-hewîne.

Li aliyê din berî tevgerên feminîst li Îngilistanê wêjevana mezin Wirginia Woolf weke jinekê li hember problema jinbûnê bédeng namîne û fikrên xwe yên li ser problema jinbûnê di pirtûka ‘Odeyeke aîdî xwe’ de vêdibêje. Woolf wiha dibêje “Xebata mîrata ku ji metika min ji min re ma, di êvara ku jinan mafê dengdanê bi dest xistin de min sitend. Ji deng û pereyan, pereyê ku ez bibûm xwediyê wê ji her tiştî girîngtir bû.” Woolf ji bo serbestiya jinê derfetên aborî pewîst didît. Ji bo hilberînê ji jinê re “Odeyeke aîdî xwe” pêşniyar dikir. Wiha digot: “Ger odeyeke aîdî wê hebe û di salêkê de xwediyê pênc sed poûndî be ev tê wateya ku hin tiştên baş diqewimin.” Ji bo Wirginia Woolf aborî kirûyeke pir girîng e ji ber ku hilberîna hunerê li gorî Woolfê bi derfetan girêdayîye. Ji bo wê ne pêkan bû ku mirovek ji çîneke feqîr be û bibe



hunermendeke/î mezin. Ji bo mirov bibe xwedî odeyekê hewceyê derfetan e. Mirov dînamîkên Îngilistanê yên wê demê gava difikire di fikrên Woolfê de gelek rastiyan dibîne. Di dema Woolfê de jin bi tenê di çend karên biçûk de dikaribûn bixebitiyana. Ev karana jî ji bo jinê di warê aborî de tu derfet pêk nedianîn. Woolf bi xwe jî di gelek karên ku derfetên wan xerab de şixuliye. Mîrata ku ji metika we jê re ma deriyê serbestiyê lê vekiribû. Derfet hilberînê tîne, hilberîn hişîna serbestiyê xwedî dike. Ji bo dema xwe fikrên wê derbasdar in lê ji bo dema îro gava mirov difikire serbestiya aborî di jina îro de hilberîneke xurt dernexistiye holê, hîn jî dinya bi destê zilêm û hêmayên zilêm û bi pêşnûmayên zilêm bi wate dibe. Problem bê guman ne ku dinayê di yek zayendî de pêşnûma kirine. Divê mesele li gel hebûna dengê zilêm dengê jinê jî xurt kirin be, lê jin hîn jî xîreteke mezin rê nade. Weke Beauvori jî destnîşan dike, jin ji bo serbestiya xwe berxwedaneke mezin rê nade. Jin ji jiyana heyî zêde aciziyan nake ji ber ku karên sendîkalîst, karên hunerî û karên ramanî bi kedeke mezin derdikeve û jinê rexne dike; ji ber ku jin di jiyana malê de ji rîskan û ji teşqeleyan dûr e û ev yek hinekî li hesabê jinê jî tê. Jiyana ji derveyî malê zîlam bi rê ve dibe û jin li malê bi rihetîya xwarin û vexwarinê re jiyanêke bê serêşî tercîh dike. Divê bê zanîn ku mirov bi qasî daxwaza xwe ya serbestiyê nêzîkî serbestiyê dibe. Jin, divê bê guman şertên li hemberî xwe û feraseta ku wê ji serbestiyê dûr dixê, rexne bike, xwe jî rexne bike û daxwaza xwe ya serbestiyê jî nû ve bipêve.

Anarşîsta “kej” Emma Goldman ji bo têkoşîna jinê têgeha serbestiyê çalak dike û weha dibêje; “Bi serbestiyê, angaşt û çalakiyên ku jin ji dil daxwaz dike wê wateya xwe bibîne; wê hemû sînoren çêkirî birûxe, rêya serbestiyê wê ji koletî û radestîya sed salan paqij bibe.” Serbestiya Goldman daxwaz dike ji bo her kesî/ê ye. Li dijî şerê zayendan derdikeve, ji bo jiyanêke azad serbestiya her du zayendan pêwîst dibîne. Sînoren zayendî weke sînoren çêkirî dinirxîne, ji ber ku avagirên sînoran civaka kevneperest e. Divê mirov serbestiyê hîs bike, li gorî bawerîya Goldman, tevgerên jina ku ji serbestiyê fahm nekirine û bi qasî li çavê serbestiyê binihêrin ne wêrek in. Divê jin xwe ji fikra azadkirinê xelas bike ji ber ku daxwaza azadiyê kesê/a ku ne azad e daxwaz dike û bi dest dixê. Di têkoşîna jinê de nirxên kevneşop, pêşdaraziyên civakî weke asteng dibîne. Li gorî Goldman serbestî, bi têkbirina nirxên civaka kevneperest dest pê dike. Zewaca kevn weke berdewamiya feraseta civaka bavkanî dinirxîne, li

gorî Goldmanê, zewac xwezaya jinê difetisîne, zewacê di bin hukmê sinc û nirxên civaka kevneşop de dibîne, yanî jin bi rêya zewacê deshilatdariya zilêm erê dike û serbestiya xwe tune dike. Azadiya jinê di ruhê jinê de dest pê dike. Jin divê bi guherîneke hundirîn xwe ji hemû pêşdarazî û adaten civakî paqij bike.

Di hunerê de israra “jinên hunermend”

Di 1960'an de li Rojava bi tevgerên femînîst li ser hebûna jinê di gelek çarçoveyên cuda de nîqaş hatin kirin. Ji perspektîfa femînîzmê di gelek qadan de cihe jinê jî nuh ve hate lekolînkirin û nirxandin. Di disîplênên cuda de rexneya femînîzmê hate pêşxistin. Qrîterên ecibîn û nirxandinê hate lêpirsîn. Jinan edî dixwestin ku di her qadên jiyânê de zimanekî mê derkeve. Ziman, huner, siyaset û karê ramanî dikaribû bibûya karekî jinê. Ew rol û statuyên ku ji bo jinê jî aliyê feraseta bavkanî hatibûn qebûlkirin bi rastî muhalefeteke xurt a jinê hatin. Hêza desthilatdariya bavkanî, ji bo jinê di civakê de qadên herî girtî tercîh kiribûn. Femînîstan li hember desthilatdariya mêran ala xwe ya bidesxistina desthilatdariyê rakirin. Bi awayekî aktîf piştî salên 1960'î jinan di qadên girîng ên civakê de dest bi xebatên entelektuelî kirin. Bi taybetî di hunerê de bi dengê hêl, hin tevgerên jinan û femînîstan bi xebat û bi berhemên xwe pîrsgireka jinê xistin rojava civakê. Li ser dîroka hunerê bi têgihîştîneke femînen hin nivîs hatin weşandin. Bi van nivîsan dihat xwestin ku dîroka hunerê jî nû ve ji perspektîfa jinê bê analîzkirin. Li ser vê bingehe gelek gotar û biyografi hat amadekirin.

Daqûlhatina pîrsgirêka jinê û mafê jinê ji bo serbestiya jinê destpêkeke baş bû. Lê bi demê re tevgerên femînîst bi pîrsên bê mane ketin dan û stendinê. Çima hunermendên jin tune ne? Çima siyaseteke jin tune ye? û her weha... Di neqeba vê ramanê de gelek pratîk hatin kirin.

Li Los Angelesê Linda Nochlin û Ann Sutherlandê bi navê Women Artist (jinên wênesaz) pêşangehek organîze kirin û ji bo pêşangehê katalogek derxistin, naveroka pêşangehê li ser “jinên wênesaz” ên di navbera 1550-1950'an de jiyabûn. Gelek monografiyên jinên hunermend hatin weşandin. Armanca wan bi monografiyayê navên jinên hunermendên ku bi feraseta nêr a dîroka hunerî ew tune hesibandibûn, bidîna nasîn. Li ser jinên wênesaz weke Artemisia Gentileschi, Rosa Bonheur, Lavinia Fontana, Berthe Morisot, Mary Cassatt.. gelek gotar û nivîs hatin weşandin. Charlotte Streifer Rubensteinê li ser jinên hunermendên Amerîkî ber-

hemek derxist bi navê American Women Artists (Jinên Wênesaz yên Amerîkî). Gelek berhemên di vê eyarê de derketin. Di dîroka hunerê de derketina keşfê xebateke bi nirx e lê bi tenê di çarçoveya zayendî de kirina vî karî berê mirovî tenê dide kategoriyan. Reşîkekî di kar û barên entelektuelî û hunerî de cidiyeteke mezin derxista, Fransiyan ji bo wî reşîkî weha digotin “helbestkarê reşîk”, “hunermendê reşîk ê ku zanîngeh qedandiye”. Li gorî Frantz Fanon, Fransiyan bi helwesta xwe dixwestin (ji ber ku kesên xwedî hêz ew bûn, reşîk bindest bûn) statuya reşîkan a bindestiyê bi wan bidin hîskirin. Ger hunermend reşîk be an jin be ev yek bi tu awayî nayê nîqaşkirin, lê teşhîrkirina vê yekê bi-çûkxistinê armanc dike. Kategorîzekirin ancax bi-karibe sînoren jinê yê afirîneriyê teng bike û jinê di perspektîfeke teng de bifetîşîne. Weke Judith Butler dibêje, kategorîzasyon ji aliyê kê bê kirin ferq nake meyla enstrumanîya rejîmên sazger dike. Li ser hişmendiya kategorîzasyonê karê ku bê kirin cidiyeta kirina wî karî û bi xwe bawerbûna wê kesê yan jî wî kesî dixê bin gumanê. Hunermendên jin, hunermendên reşîk, hunermendên kurd, helbestkarê katalon, wênesazê îrlandî û her weha... Divê mesele ji pirsên “kî ji kîjan kategoriye ye” “kî çi qasî mezin e?” “kî çi qasî hêzdar e?” wêdetir bûya, ji ber ku ev rêbaz xebateke stewr bû. Bi standartên heyî, bi çîrokên heyî daqûlhatina meseleyê bi tenê aktorên statukoyê di zayendê de diguherî lê di bingeha ferasetê de tu guherîn pêk nedianî. Stereotîpên ku hewl didan jinê timî bi heman tîpolojîyê bidin “jin bêhiş in, jin bingeha xerabiyê ye...” ku bi vê yekê dixwestin jinê di warê baweriyê de têk bibe, heman şewaz bi zimanê jinê jî hate pêşxistin “zîlam giş despot in, zîlam giş xerab in ...”.

Tevgerên jinan di pîrkirina berhemên mê de berpirsariyê girîng hilgirt. Lê afirînerî û hilberîn di hundirê têgeha jînbûnê de diçû dihat. Huner ji bo hin kesan tenê qadeke derbirînê ye û ji ber vê yekê hemû kerba xwe di serê hunerê de derdixin. Di berhemdariya jinê de piranî tecrubeyên jinê serdestî berhemê ye ango jin li dora xwe dihere û tê. Gelo jinê dixwest bi hêza hunerê xwe derxe qadeke bilind an dixwest tenê jînbûna xwe bike taybetmendiyeke berhema xwe. Gelek berhem li ser vê hişmendiye ava bûye û gelek jinan berhemên xwe li ser vê xemê pêş xistine yanî ji hundirê berhemê têgeha jinê bê kişandin wê tu taybetiyeke berhemê nemîne. Karê Judy Chicagoyê bi navê “vexwendina xwarinê” bi awayekî kolektîf encax di pênc salan de derket. Di vî karî de gelek kes xebitîn, kedeke mezin dan. Bi projeyê dihat xwestin ku ji bo jinê û

hunera jinê di civakê de cihekî bi nirx çêbibe. Di enstelasyonê de, gelek karên bi destan ku di navbera jinan de têkiliyê xurt çêkiriye lê bi demê re hatine jibîrkirin cî stend. Karên seramîkê, karên sîxikan, karên tenteneyan, karê kenewîçan û her weha... Enstelasyon hingî mezin bû di pêşandanê de astengî derdixist, ji ber vê yekê li pir deran nehat pêşandan. Ji projeyê keda jinan a pênc salan û hasasiyeta jinê bê derxistin wê bi tu awayî ji berhemê neyê hezkirin. Berhem bi mezinbûna xwe dixwest bandoreke mezin derxe lê bi ser neket. Pêşangeh ji bo hin jinên femînîst projeyêke pir mezin bû û bi awayekî erênî hat nirxandin lê miqabilî rexneyên erênî gelek rexneyên neyînî jî hatin kirin. Hin femînîstan têgeha hunerê pir şaş dinirxandin ji ber ku mesele bi tenê bi çîrokan û bi hestiyariya jinê nediqediya. Mijara hunerê karekî zehmet bû ku ev pêvajoyê bi zimanekî serbixwe, bi perwerdehiyêke cidî û bi ceribandîna şexsî yên bi demê re çêdibe. Huner û krîterên hunerî kirûyên gerdûnî ne, ku ev krîter li gorî zayendê nayê guhertin. Di meseleyê de ya girîng nayê fêmkirin, her mirov divê rastîya xwe bibîne û bikaribe li xwe mukir bê û di xwe de disîplineke rexneyê pêş bixe. Divê jin di her hal û karî de girîngiyê bide rexneyê û rewşa ku li dijî xwe ji xwe re neke mortal.

Di pêvajoyêke çarsed, pêncsed salî de pir girîng e çima bi hezaran navê jinên hunermend derneketiye, bê guman gelek sedemên civakî hene ku ev sedeman di gelek waran de ji jinê re astengî derxistiye. Di civaka Ewropayê de heta demeke dirêj ji bo jinê weke kar, karê hunerê tercîhkirin biryardayîneke xurt hewce dikir. Huner karekî taybet û cidî bû. Di nezera civakê de jin ji bo karekî cidî ne xwedî hebûneke xurt bû. Biryardayîna ji bo karê hunerê bê guman teşqeleyên nexweşîk derdixist. Bi giştî jinan biryarên civakê dipejirandin. Gelek jinan, jinên ku karên hunerî dikir rexne dikirin. Wirgina Woolf qala duşeseke ku di sedsala hevdemîn de helbest dinîvîsand dike helbestkarê Margaret Cavendishê ji aliyê hemcînsê xwe weke jineke dîn hatiye dîtin. Her heyam baş an jî xerab li gorî bîrdoziya xwe civak bi rê ve biriye û statuyên her kesî li ser esasê bîrdoziya xwe diyar kiriye. Canon Dural di pexşaneke xwe de li ser wêjeya Fransayê ya sedsala 18'emîn de mijara bextewariya jinê û bextewariya zewacê dinirxîne. Dural popule-rîteya van mijaran di parametreya civakî, aborî û çandî de dinirxîne. Li gorî Duralê birjuwazî êdî di huner û wejeyê de xuya dikir û dixwest di rêxistina dewleta xwe de bi riya hunerê rolên jinê bifetîşîne. Birjuwaziyê sînoren bextewariya jinê dixwest diyar

bike. Jina ku tenê bi bextewariyê bê qayil bibe wê dest û lingên xwe ji jiyana civakî bikişîne. Li gel vê rewşê hin jinên hunermend derketiye, lê weke Linda Nochlin destnîşan dike bi giştî ev jinên hunermend ji malbatên hunermendan e û dibêje yên ku bav ne hunermend be jî ji bavên xwe piştgiyê baş stendiye. Jin heta heyameke dirêj di biryarên xwe yên takekesî de ne xwedî vîndariyekê ye. Di civakeke weke Ewropayê de bi sedan salan huner weke têgeheke girîng hate dîtin lê ji bo jinê dan û stendina hunerê dibe sedema aloziyan. Bê guman ev rewş li dijî hilberîna jinê di civakên feodal de gava bê nîrxandin wê bê dîtin ku êşa hilberîna jinê tevlihevtir dibe. Li welatên feodal, berdêla karên takekesî girantir e. Di civakên feodal de takekesbûn weke xetereyekê tê dîtin. Ji ber ku mirov gava pêvajoya xwe ya takekesbûnê temam dike ji refê xwe dûr dikeve, ferqên xwe dermale dike, her ku bi ferqên xwe dadikeve ew qasî noqî kûrahiya xwe dibe. Li Kurdistanê li gel problemên civakî em dikarin behsa hunereke bi tenê di wêjeyê de bi form bûye bikin. Ji ber faktorên feodalî û olî, bîndestî û her wiha em dibînin ku hunera kurd modelên xwe yên ewil ji wêjeya mela û şêxan daye. Dîroka hunera kurdan di warê wêjeyî de hebûnek derxistiye. Dêstpêk di forma helbestê de xurt bûye. Di civakên bîndest de celebê herî çalak helbest e. Weke Rênas Jiyani dibêje; "Helbest di qada civakeke bîndest de digihîje performansê xwe ya herî baş û bilind." Rezervên êşê vê performansê bilind dike. Daxwaza serbestiyê encax di dengê helbestê de biqîre. Di îro de em dibînin ku di celebên nûjen ku bi kurdî tê nivîsîn celeba herî serdest cardin helbest e. Hunera kurdî ji dengê zilêm olan dide. Hunereke mê ya ku mirov bikaribe di hundirê çarçoveyê dîrokî de bi cih bike tune ye. Ji bo hunereke mê divê Kurdistan benda tevgerê xwedî bi hiş bûya. Ev hiş bi tevgerên siyasî xwe çêdike û bi demê re hişîneke mê diwelide. Jina kurd di hunerê de hêlîna hebûna xwe li ser muzîk û wêjeyê ava kir. Berhemên ku ji pêûsên jin û ji dengê jinê welidîn wê çiqasî karibe êşa serbetiyê bicebirîne. Li hember celadê xwe wê karibe bi qodên kurdbûnê, xwe wek hebûneke serbilind bihesibîne. Di jina ku ji neteweke bîndest de be hestên bîndestiyê qelewtir e. Serdest li ser jinên bîndest projeyên xwe yên tune kirinê pratîze dikin. Weke Kristevayê digoy jin berî detyê "kirdeyê ku diaxife" ye. Ku mirov ji bo qedera neteweyekê têgeha zimên di qada hebûnê de bi cih bike "kirdeya ku diaxife" di berpirsariyê hebûnê de dibe xwedî rol. Yek ji metodolojiyên tune kirinê ya girîng serjêkirina zimên e. Serdestên kurdan ango kemalîzm di tune kirina Kurdan de bi

awayekî çalak di têgeha zimên de pêşnûmayên tune kirinê pêşxistin. Komara kemalîstan hemû saziyên xwe li ser bilindkirina kemalîzmê ava kir. Medya, huner û wêjeya kemalîst peywira ku kemalîzmê li wan ferz kiribû pir baş bi cih anîn. Jin û modernîte û qonaxên wê ji riya tirkbûnê re derbas dibe ji aliyê enstrumanên dewletê baş hatin pompe kirin. Ji bo civakeke modern ji bilî tirkan her netewe divê bê bişaftin, ji ber ku modernîte bi tirkbûnê re tê. Li Kurdistanê jin bi taybetî rastî bişaftineke sistematîk hat. Rolên ku li jina kurd hate fesilandin (divê her jina kurd hînî tirkbûnê bibe û malbata xwe li gorî hebûna tirkbûnê perwerde bike) hê jî li ser Kurdistanê bandorên xwe rê dide. Rewşa herî balkêş jinên femînîst ên tirk li hemberî siyaseta bişaftinê tu helwest rêndan û bi ser de jî rêbaz û feraseta dewletê erê kirin, piştgirî danê. Ne normal e ku jin li ser mafê jinê têbikoşe û li aliyê din li hemberî jinên neteweyê din bi awayekî sovenîst tevbigere. Her çend jin ji çandeke cuda, ji çîneke cuda û bi zimanekî cuda dinyayê îdraq bike jî pergalên li dijî hebûna jinê, hewcedariya têkoşîneke kolektîf a jinê derdixe holê. Tevgerên jinan li ser bê adaletiya zayendî xwe çekiribûn, armanc di lehê jinê de pêkanîna reformasyoneke civakî bû. Mirov bi qasî problem û hasasiyetên xwe yên hevpar bi awayekî psişik angajebûneke komî çêdike. Lê di bingeha hevpariyê de armanc ne tune kirin be û nexweşibandina zayendeke din an serdestê xwe be, hin fikrên femînîst ji bo çareseriyê tune kirina ferqên jinbûnê dipejirîne û ji bo wekhevîya zayendî weha dibêjin; "ferqên me yên ji zilêm tê wateya berdewamiya neheqiyê û tundiyê." Ev yek paradokseke mezin e ji ber ku ew hêza ku serbestiya jinê basko dike jin di wê hêzê de xelasiya xwe dibîne. Jin divê bi tenê ji bo hebûneke azad bixebite. Têgeha hunerê ji bo jinê bibe hebûneke bedewiyê ji bo dinyayê bibe ramanê serbestiyê. Hêmayên serbest, têgehên serbixwe û afirîneriyê bi sistem dikare hunereke bi kesayet derxe. Jin divê xwe ji nasnameya çanda serdestiyê rizgar bike û her weha bikaribe ji bo her mirovê/a bîndest biqîre. Pevçûna bi hêza zilêm re divê ne li ser esasê tune kirina zilêm be, ji bo jiyanê wekhev be.

Jin ya wê bi hêrsa bîdestxistina desthilatdariya zilêm maka hebûna xwe biterikîne û wê dev ji hemû hêmanên xwe yên ontolojîk berde û wê metiyê daliqîne an jî bide dû şopa serbestiyê û wê bêtir daqûlî xwe û hebûna xwe bibe. Huner divê bibe enstrumaneke serbestiyê ji bo her giyanî.

Suffragette: Di destpêka sed sala XX mîn de li Îngilîstanê û li Amerîkayê jinên mafê jinê yê dengdanê diparêzin.

Wêje û jin

Nesrîn NAVDAR

Li ser rûyê cîhanê hin hêman hene ku bi winda-bûna wan netewebûn di-keve xetereyê. Heta em dikarin bibêjin ku ji holê radibe. Ji vana yek jî wêjeya wê neteweyê ye. Ya ku ziman jî bi pêş dixê û li piyan dihêle wêje ye. Wêje hiş û bîr e, hest û mantiq e, hem tehl e hem şîrîn e, heta em dikarin bibêjin ku netewe, ziman bi xwe ye. Wekî tê zanîn diroka wêjeya kurdî ji destpêkê heta sedsala 20'an bêhtir bi helbestê rengê xwe daye xuyakirin. Wêjeya nivîskî ku herî kêr hezar sal berê dest pê dike ji Baba Tahirê Hemedanî bigire heta Cegerxwîn di vê dewra klasîk de deng dae. Helbet di vê dewrê de kêr be jî rengê jinê jî hebûye. Helbestkarên wek Mestûre Xanim (Mah Şeref Erdelanî, 1800-1847), Sîre Xanima Amedî (1814-1865), Mîhrîbana Berwarî (1814-1865) jî di wê demê de rengê xwe li wêjeya kurdî zêde kirine.

Îro dema em binihêrin li hember hebûna ewqas çavkaniyên giranbiha yên klasîk ên weke dubeytiyên Baba Tahir, helbestên Elî Herîrî û F.Teyran dîwana M.Cizîrî, Mem û Zîna E.Xanî heta em bibêjin romana Erebe Şemo û helbest û çîrokên Qedîrî Can dîsa jî di wêjeya kurdî de geşedanek pêk nehat. Tê zanîn ku 300 sal berê Ehmedê Xanî ji destana Memê Alan berhemê giranbiha ya bi navê Mem û Zînê afirandiye.

Dibe ku mirov bifikire gelo çima wêjekareke/î heta îro nikaribûye li ser wê şopê biçe ku berhemeke ji wê bihêztir biafirîne ku belkî bi wê berhemê wêjeya kurd bikaribûna di nav berhemên sereke yên cîhanê de cih bigirta. Dibe ku em bibêjin sedema bîcîhnehatina vê rewşê qedexekirina sistematîk a pergale ya li ser vî zimanî ye. Tê zanîn ku ji bo zimanekî xetereya herî mezin jî qutkirina wê ya ji perwerdehiyê ye. Wekî em dizanin berhemên kurdî yên sereke ji medreseyan derketine. Piştî ku medrese jî hatin qedexekirin (1924)



wêjeya kurdî bêhtir bi xetereyan re rû bi rû ma. Helbet rewşenbîr û wêjenasên kurd jî vala nesekinîn, çend pêngav li gorî hêza xwe avêtin, ji vana yek jî weşandina Hawarê ye (1932). Em dikarin bibêjin ku di kovara Hawarê de bingeha wêjeya nûjen jî hatiye avêtin û rêyek li pêşiya wêjeya kurdî hatiye vekirin.

Wêjeya kurdî piştî salên 90'î vir de kete merheleyeke nû. Li vir êdî rengê romanûs û çîroknûsan ber bi çavan dikevin, lê mixabin ev jî heta îro bi pênûsa mêran meşiyaye. Jin tenê di helbestê de asê mane. Helbet ev yek tenê ji bona wêjekarên jin ên kurd derbas nabe, ev rewş jî bo tevahî wêjeya cîhanê derbasdar e.

Hemberî ku heta niha yekemîn nivîskara dirokê jin (Enheduanna B.Z 2300) tê zanîn jî mixabin îro kêmasî û paşvemayîneke berbiçav heye. Dema em li sedemên kêmbûyîna jinê di wêjeyê de bigerin, em dê gelek sedeman bibînin. Em dikarin bibêjin nexwendina dibistanê, xwedîkirina zarokan, ji azadiya aboriyê bêparbûn, dûrmayîna wê ya ji jiyana civakî û herî pir jî ji hêla mêran ve astengdayînen cur bi cur jixwebawernekirinek di hestên wê de hatiye çêkirin. An jî ger em sedema di helbestê de asêbûna wê bigerin, ev dibe ku ji nazikiya rihê wê be. Weke tê zanîn di wêjeyê de ya ku herî bi estetîk û nazîk e helbest e. Jin xwe di helbestê de dibîne. Tiştên ku rihê wê diêşînin yan jî şa dike jî ber xwe vediguhere helbestê.

Helbesta wê hestiyariyê, jiyanê, xwezayê û evînê destnîşan dike. Jixwe di rihê her jinekê de helbestvanî heye, ji bo her gaveke jiyanê straneke wê heye ku bibêje. Bi lorîkên ku li ser bedewiya wan afirandine, zarokên xwe bi xew ve dike. Em dikarin bibêjin ku helbest di xwezaya jinê de heye. Di wêjeya kurdî de romanûs û çîroknûsên jin hema bibêjin tune ne. Roman

û çîroka kurdî heta niha bi destê mêran hatiye çêkirin. Di wê roman û çîrokê de figura jinê her gav bi awayekî tenê dikeve ber çav ango tenê bi zayendî. Hestên jinê yên jiyanî hemû di nav bêjeyên wek por, lêv, sîng, çîp û hwd. de tên windakirin. Em li vir dibînin ku jin tenê bireser e, weke din tu roleke wê tune. Mixabin ku romanûsên me navê bikaranîna wê awayê ji bi nûjenbûnê bilêv dikin lê li gorî min ev xweveşartina li pey maskeya nûjenbûnê ye. Dema bergeha mêrî ya li jinê wiha be û jin bi vî awayî wisa bi bêdengiya xwe bipejirîne, jixwe ew dibe xwekuştina wê bixwe di wêjeyê de. Ji ber vî awayî divê jin bêdeng nemîne, hewl bide ku rengê xwe li wêjeya kurdî zêde bike. Dema jin dest bi romanûsiyê bike, beriya her tiştî dikare xwe ji bireseriyê derxîne, dikare wêjeya kurdî bigihîne qonaxê ku bibe neynika pirhêliya jiyanê. Dikare bêhna hestên jinê jê bifûrîne ku çawa êşa zayînê û hestiyariya zarokmijandinê di nav hev de tê ecinandin û ji wê hezkirina dayikîyê dertê. Dikare ji çaviya şoreşa ku tê jiyanî şoreşê wêjeyî dagire û bi hestên xwe yên kubar wê bixemilîne û bigihîne wêjeya cihanê. Wekî tê dîtîn di roja îro de em nikarin di wêjeya kurdî de qala wêjeyê fehmînen bikin lê divê jin vê rewşê biguherîne.

Ji bo ku jin bêtir beşdarî qonaxa wêjeyê bibe, divê pêşîn ji wêjeya klasîk dest pê bike heta a nûjen wêjeya kurdî baş bixwîne û li ser hûr bibe. Wêjeya cihanê divê bixwîne û nas bike. Divê xwe ji hemû tirsên malbatî, civakî û desthilatîyan rizgar bike, êdî nebe bireser, êdî ew bibe helbestkar, romanûs û çîroknûsa xwe û civaka xwe. Divê êdî tîrsa têkçûnê ji ser xwe biavêje, nebêje ez dê bi ser nekevim. Ew hemû tirsên çêkirî (sûnî) ne ku ji hêla civakê ve bi taybetî ji ji hêla mêran ve di bin hişê wê de hatiye bicihkirin.

Wekî tê zanîn ferqa zimanê avakirî yê jinan û yê mêran ji hev cuda ye. Ev ji ber rêbaza xwedîkirina wan a ji hêla dê û bavên wan e. Di civaka me de ji zarokên keç re tê gotin ku bi terbiye bin, dengê xwe bilind nekin, bi karê malê re mijûl bin, karê destan hîn bibin (nexş, tentene), kubar û nazik bin, bi yekê re pevneçin, parveker bin (tiştên xwe bi xwişk û birayên xwe re par ve bikin). Ji kuran re jî tê gotin ku jêhatî bin, hêzdar bin, wêrek bin, negirîn, li xwişkên xwe miqate bin. Bi vî awayî di rihê jinê de cîhaneke parveker û zimanekî hestiyar, di a mêran de jî cîhaneke hêzdar û zimanekî parêzger lê tê ferzkirin.

Di jiyanê de nifir û çêr ji ciyekî xwe hene. Nifir bi giştî ji hêla jinan ve tên kirin, çêr jî ji hêla mêran ve tên kirin. Ev rewş vebeyna xwe dide wêjeyê jî. Wekî tê zanîn nifir jî çêr jî nîşana bêhêzmayîne ne. Nifir qebûlkirina wê bêhêzbûnê ye. Jin bi nifiran diyar dike ku tiştê ku ew bikaribe bike nemaye, ji ber wî awayî bi nifirên xwe wê/wî kesê/i hewaleyê Xwedê dike. Lê mêr ji

ber ku naxwazin li xwe mikur werin ku têk çûne, bi çêran dixwazin rewşa têkçûyîna xwe veşêrin.

Dibe ku pêwîst were dîtîn ku di qada wêjeyê de navekî li jinê were dayîn. Tiştê ku ji bo mêrî pêwîst nayê dîtîn ango bikaranîna “nivîskara jin” an jî “jina nivîskar”. Li gorî min ne bikaranîna “nivîskara jin” ne jî “jina nivîskar” di cih de ye. “Nivîskara jin” dema were bikaranîn zayendiya wê dikeve pêş, ev jî fikreke wisa di mejiyê mirov de çêdike ku nivîskari qada mêran e. Ji ber vî awayî dema ji derveyê wî kesek (jin) bikeve vê qadê divê nasnameya xwe ji bide zanîn. Ev cudakariya zayendê tîne bîra mirov. Çawa ku pêwîst nayê dîtîn ku “nivîskarê mêr” were bikaranîn divê ji bo jinê jî pêwîstî neyê dîtîn. Çêkerê wêjeyê mirov e, jin be an mêr be ferq nake dawiyê de mirov e.

Li ser kîjan beşa wêjeyê mijûl dibe bila bibe. Ev dibe nivîskari be, helbestkari be, heta wêjeya devkî, dengbêjî yan jî wênesazî be. Gelo em pêwîst dibînin ku ji bijîşkek re bibêjin “bijîşka jin” an “bijîşkê mêr”, an jî “parêzera jin”, “parêzerê mêr”? Çawa ku ji bo pîşe û hunerên din pêwîst nayê dîtîn ku were bikaranîn û çawa ku ji bo mêrî nayê bikaranîn divê ji bo jinê jî heman rewş derbasdar be.

Tengasiyêke din a li ser jinê jî lêferzkirina sansurê ye. Ev sansura civakî ya li ser jinê ku di piraniya civakên cihanê de tê meşandin bandora xwe li ser wêjekariya wê jî dike. Jin nikare bi awayekî vekirî di helbestê de hestên xwe vebêje. Dibe ku di helbestê de ji hêla avakirina hevoksaziyê de ew rewş bibe avantajê ku berhema xwe bi sînge, hêma û wêneyan bixemilîne û dewlemendtir bike lê di nivîsên din ê wêjeyê de jî dibe sedema xitimandinekê. Ev jî bando-reke ne xweş li ser wê çêdike.

Di wêjeyê de rexnegirî mekanîzmeyeke girîng e. Ger em dixwazin wêjeyê me ya bi hêz û serkeftî çêbibe divê em ji rexneyê nerevin. Divê ku em bikaribin behsa koma rexnegirîya xwe bikin. Helbet ev rexnegirî divê béalîtî were meşandin. Dema berhemek hat rexnekirin divê li gorî kesayetî yan jî zayendiya xwediyê wê berhemê rexne neyê kirin. Divê berhemên jinê jî bi awayekî bê alî werin rexnekirin, qelsî û kêmasiyên wê werin vegotin. Rexnekirin bi-hêzkirina wêjekaran e. Divê berhemên jinê jî vê mekanîzmayê dûr neyên hiştin.

Wekî em dizanin rewşa wêjeya kurdî bi çend hevok an jî paragrafan nayê ravekirin. Dawiyê de ez dikarim vê bibêjim ku wêjekarên me dikarin li ser şopa berhemên me yên heyî û ji vî şerê sî salan şoreşê wêjeyê pêk bînin, tenê bila bikaribin xwe ji zihniyeta zayendî, zihniyeta herêmtî û takekesîtiyê rizgar bikin.

Jin û wêjeya kurd

Zeyneb YAŞ

Bi çavên nivîskarên jin wêjeya kurdî çawa dixuye? Ez bawer im ku her kesek dikare bi navê xwe bersiva vê pirsê bide, ez jî hew li gor dîtina xwe dikarim bersiva vê pirsê rave bikim. Ji ber ku nivîs, realîzmek e, bi çavê nivîskarên jin an mêr rastî naguehere. Rasteqîniya hebûna wêjeya kurdî li gor berhemên heta vê gavê bi zimanê kurdî hatî afirandin, tê hesibandin. Yên ku wêjeya kurdî heta roja îro anîne bi berhemên xwe zilam in. Bêguman ku wê naverok jî li gor hizir û bîr, rewş û tîtal, desthilat û daxwaziye mîranî bin. Mixabin e ku rengê jiyanê bi hezarên salan e bi yekalî hatiye xemilandin. Yanî jinek dikare di helbesteke Elî Herîrî de beriya hezar salan hest û ramanên zilamekî kurd bibîne lê, zilamek nikare pê bizanibe bê ku jinek di wê serdemê de, berî û piştî wê serdemê jî çi hest dikir, têgihîştin, hizir û bîra jineke kurd li çerxê çawa digeriya, nikare bibîne. Ne ku ew jin tune bûye, hebûye. Ne ku dê her kesek bibûya Elî Herîrî, Baba Tahir jî, lê ne mumkin e ku jina ku ew qas di nav jiyanê de, ew qas bi tîr û tijebûniya serpêhatî, hêma, hizir û bîrê dijî, nikaribe berhemeke sîdmend bigihîne heta roja îro. Lê nî e û ev yek jî rastî ye.

Bi kurtî heke em bêjin, heke ramanek her çendî xurt be jî, nehatibe nivîsandin ew îro jî bo me ne ketiye ser qeydê û em nikarin behsa wê ramanê bikin. Wêje, bi hebûna xwe rasteqîniyeke dem û rewşê ye. Heke tecrûbe bi awayekî rast û durist, zanistî û şarezayî neyên parzûnkirin nabin berhem, nabin wêje. Ji bo raman, hest, tecrûbe û hizir bibe wêje pêwîst e bê nivîsandin. Berhemên ku heta îro hatine û bûne parçeyek ji wêjeya kurdî bi giştî ji ber destê zilamî derketine. Bêguman e û rastî ye ku ev berhem bi giştî derçûyê jiyanê mîranî be jî.

Jixwe gava tu li dîroka nivîsîna cîhanî û wêjeya kurdî jî dinîhêrî destpêkirina nivîsandinê her bi helbestê bûye. Gava di serê serî de yek nivîsekê jî dinivîse gelek hizir di mejiyê yekî de kom dibin û dixwaze zûtîrîn wextê de wan hiziran bi sûret bike, sûretê pêşîn ji rengê wişeyan gelek tîr e û navê wê helbest e ji bo yê dinivîse. Ez bawer im ku her nivîskarê xwe li nivîsê ceribandibe pêşî helbest lê xuya dibe û bere bere bi zelalkirina wan hizir û bîrên tîr re sûretê wê helbestê dibe çîrok, novel, pexşan, roman û nivîsên din. Ji bo vê yekê zêde ferqa jin an zilamî tune, lê ji ber zilamî, li

gorî jinê zûdetir e dest avêtiye vî karî, bi ser rê û rêbazê wê ve bûye, bûye xwedî kultureke rabirdûyê û bûye xwedî cesaret ku pê cureyê dîtirê nivîsînê binivîse. Her weha ev jî neyê jibîrkirin ku wêjekarên kurd ên ku em îro şanaziyê bi wan û berhemên wan dikin, wan merama xwe, wêjeya xwe bi rêka cureyê helbestê, çi klasîk û çi nûjen, gihandine û ew berhemên hêja afirandine.

Çima, çîroknûs, an jî romanûsê jin kêma in? Bi serê xwe girêdayî rastiya sazûmanîya sîstemê ye. Kengê sazûmana civakî di warê xwendin û nivîsandinê de, di warê pêşdexistina jiyanê de bi jinê re hevparî kirine û jinê xwe tê de dîtîye wê çaxê kesayetiya jinê çêbûye. Jinê karibûye, bixwîne, binivîse û biafirîne. Ji ber hindê jî gava mirov berê xwe dide welatên cîhanê yê pêşketî jinan jî ciyê xwe di nav warê wêjeyê de girtiye, çi çîrok, çi roman û çi cureyên din ên wêjeyî bin. Lê kêma in. Ev kêma bûn ne ji kêmbûniya afirêndêriya jinê ye, ji tepeseriya sîstem û desthilatdariyê ye.

Heger wekî nimûne em behsa wêjeya kurdî bikin jixwe wê çaxê gelek eger û encam derdikevin. Heger em behsa jina kurd bikin bê di warê wêjeyê de bi taybetî jina kurd heta sedsala bîstan dijîn, kurd çiqas miletek xwedî xwendin û nivîsandin in heta ku mirov bêje ku çima jin nanivîsin. Dîroka xwendin û nivîsandina zilamê kurd berî hezar salan e û belkî jî zêdetir, lê ya jina kurd? Gava mirovek bi xwendin û nivîsandinê nizanibe ma wê çawa bikaribe tekstekê binivîse, nexasim teksteke wêjeyî binivîse? Jixwe dîroka nivîsandina tekstên serbest bi nivîskî, di nav kurdan de ji sed salî ne zêdetir e.

Perwerdehiya malbatî, civakî û olî ya ku jina kurd tê re derbas bûye tu carî guncav nebûye ku wekî kesayetiya xwe bigihîne, perwerde bike, fêrî xwendin û nivîsandinê bibe, bikaribe wextê xwe ji hizir û bîra xwe ya kesayetiya re terxan bike û pê berheman biafirîne. Çîrok û roman bi hizir û bîrên serhevdîyê dikarin bikemilîn, jina kurd her mijûl bûye û hatiye mijûlkirin bi mal, mîr, zaro û zêç, ol, dab û nerî, rewş û tîtalê ve. Ê ez pê bawer im ku çîrok, roman û an jî her çi cureya nivîsê heye bi qasî anîn û mezinkirina zarokekê ne xwedî huner û afirêndêrî ye, karibûye bi qasî ku romanekê biafirîne bijî, lê nikaribûye binivîse.

Gava mirov li tekstê, stran, klam, destanên kurdî yê ku jinê afirandine dinîhêre, ku nimûne-

yên wan gelek in, mirov wê çaxê dikare bibîne ku jin beşdariya nivîsîna kurdî bike dê karibe wêje-yeke çendî xurt biafirîne.

Helbet gava berhem hebin û naveroka wan bi hes-tên femînenî hatibe honandin, ku tekst hesta zayendî li xwe bigire, dê wêje-yeke femînenî jî baştir bide der.

Nivîskara jin; jina ku bi nivîsê ciyê xwe di gorepana nivîsê de dibîne, wekî bernavkek pişeyî xwe pê îfade dike û xwe lê digire re mirov dikare bi lêv bike.

Jina nivîskar; ev termînolojiyeke ku xapandinek pê heye, ji du aliyên ve. Ya yekê: “Jina nivîskar”; bi tîgi-hîştina terma navsaziyê; Jina, ku mîrê wê nivîskar e. Ji ber ku gotina “nivîskar” di kurdî de zîlamî destnîşan dike û heta ev gotin neyê tewandin yanî nebe; “Nivîs-kara” an “Nivîskarê”, gotin bixwe maskülen e. Bi wateya dî jî ew e ku, jina ku bi tenê jiyanê wê nivîskarî ye.

Nivîskara jin, yanî jina ku kar û barê nivîskariyê dike. Helbet heger wekî bernavk ev kariyer bê bi-lêvkirin ez ê terma “Nivîs-kara jin” tercîh bikim.

Gava sansur hebe gelo wê avantaj çî be, wê çaxê bi tenê ruhê mirovî tê anarşîze kirin. Ez dikarim bibêjim ku sansur li ser zîlamî jî heye, ji ber ku dinivîse û desthilat bi qasî jinê nebe jî li hember xweîfadekirina zîlamî jî disekine tevî ku zîlam bi sedan salan e dinivîse jî lê hêştî zehmet e ku mirov bikaribe bêje zîlam xwe dinivîse.

Di nav sansurê de jin, li hember jiyanê bê ar, bi hêz, xweragirtî dikare der-keve pêş û tepeserkirinê veguherîne rewşeke avan-tajê. Lê ji aliyê din ve jixwe wêje nikare desthilatdariyê bike, huner e, raman û kelama xwe dikemilîne, diavêje binê bîrê.

Di warê xweîfadekirina jinê de, ji ber ku şeweyê ni-vîsîna jinê hêştî bi eşkereyî û sûreteki zelal derneke-tiye pêş, avantajek e ku jin karibe rengê xwe baş biresimîne. Belavbûn û navdarbûna navê jinekê di nav qada wêjeyê de gelek caran nayê wateya ku wê jinê berhemên hêja afirandine û civat pûteyê bi wan dide û fikr û raman û ji hunera wan a wêjeyî sîdê werdigire. Ramana hatî afirandin heger bi hêz be û ciyê xwe hebe bi çî awayî be wê xwe eşkere bike û nayê sansurkirin.

Bêguman e ku rewşenbîr û nivîskar rola pêşengiyê

di nav civakê de dide ser milê xwe û ji bo bikaribe bigi-hêje armanca xwe gelek caran mecbûr dimîne ji rave-kirina merama xwe re rê û rêbazan bibîne, ev yek di nivîsê de sîmge, sembol û hêma ne. Ku ev materyal jî zêdetir ji bo kesê asta wan pêşketî tîk bikaranîn, ne ji bo hemû tebeqeyên civakî. Yanî gava yek li şûna xakê, niştîman û welatî sembola “Gul”ê bi kar tîne, vê ne ji bo gel, ji bo desthilatdar bi nepen dibêje ku xwe li ber bixîne, heke rasterast nebêjim jî ez ê merama xwe bigi-hînim. Ev sembol, hêma û sîmge carna avantaj e ku gelek wateyan di xwe de vedihewîne û carê jî dezavan-taj e ku ji mebest û merama xwe dûr dikeve nivîskar.

Nifir ji bo neheqiyê ne, çêr ji bo hilorkirina şerî ye. Yên mexdûr ku nikarin bi hêza xwe meselê çare-ser bikin, nifiran dikin û

zêdetir ji wan dispêrin Xwedê. Ji ber wê nifir û jin bûne yek.

Ma gelo wê çima jinek jî rexnegiriyê neke. Ma gelo çiyê asta jineke afî-rênder jî yê mîrekî kêm-tir e? Rexnegirê ku berhemê girê bide bi zayenda nivîs-karê wê/wî dê çawa karibe rexnegiriyê bike?

Berî her tiştî jina ku tê-keve nav kar û barê nivî-sîn û bi taybetî wêjeyê, divê damaxê wê yê afirên-dêriyê hebe û pê re jî îm-kanên wê yên xwendin û nivîsandinê hebin. Barê berpîrsiyariya civakî yên wekî; keça malê, bûka malê, jina malê, diya malê û hwd... hinekî jê bîn

vekirin, him di warê wext de û him jî di warê aborî de xwedî azadî be. Gava kêma zêde ev şert û merc di jiyanê jinê de bîn duristkirin, jin di nav civatê de bibe xwedî maf û gotin helbet wê zêdetir karibe bibe xwedî kesayetî û bikaribe biafirîne û beşdariyê di wêje û di her warê jiyanê de bike.

Lê ji hemû şert û mercî zêdetir jin divê xwedî azadiyeke aborî be, her wiha zîlam jî wekî jinê ye di vî warî de.

Rexneya ku heta roja îro jin di warê wêjeyê de kêma beşdarî kiriye, bê guman ewil li jinê ye ku çima bindest e. Ya dî jî hevrêyê wê zîlam e bê ku pahra wî di vî mehrûmiyetê de heye. Lê heke bi giştî mirov bêje sebebê serê meseleyê desthilatdariya mîranî ye ku jin jî beşek in ji vî zihniyeta mîranî.





Fatma SAVCI

Em gelek caran bi van pirsan re rû bi rû dimînin: çima jin bêtir dixwazin helbestê binivîsin, ji bo çi çîroknûs û romanûsên jin hindik in? Gelo jina kurd a wêjevan ji ber kîjan sedeman xwe ew qasî bi dawa helbestê digire û xwe ji beşên din ên wêjeyê diçîne? Gelek sedemên ku jin xwe li helbestê digire hene, çendek ji wan jî ev in:

Em dizanin ku li vê gerdûnê, di nav hemû zindiyên heyî de mirov xwedî raman û hestên kûr in. Yan jî em bibêjin ku me mirovan ev yek wisa pejirandine. Di nava mirovan de jî, bi giştî jin kesên nazik û xwediyê hestên tîr in. (Ev nayê wateya ku em dibêjin mîr bê hest in û ew ne hebûneke hestiyar in.) Wekî gelek tiştên vê cîhanê xwezaya wan bi vî hawî afiriye û bi vî rengî hebûna xwe domandine. Helbet jiyana civakî, qonax bi qonax bandora xwe li ser giyan û hestên jinan kirine û ew li gorî çaxan guhertine. Lê ji hêla gelek zanbaran ve tê qebûl kirin ku ji destpêka mirovahiyê ve hebûneke jinan ji ya mîran cudatir heye. Dîroka mirovahiyê ya nivîskî bi mînakên li ser vê cudahiye tiştî ne. Lewra ew dê ye, di wê hêza dayîne de ye. Xwediyê qudreta zayîne ye. Di hemû kêlî û kirînen xwe de bi xwezayê re ye. Hîna jî di vê çaxa ku kendalek dikeve navbera mirov û xwezayê de, jin ew qasî xwezayê qut nebûye. Rih û hestên wê bi kokên xwezayê re li hev herbiliye. Çavkaniya hestiyariya jinan û dewlemendiya giyana wan a tiştî nepenî jî, ev yekbûna wan û xwezayê ye. Sedemên qolincên wê yên giyanî, xem û janên wê yên kûr, pêlên hêrsên wê yên ku gelek caran ew bixwe jî nikarin têbigihên û şîrove bikin jî ev bihevrebûna wan û xwezayê ye. Hebûna jinan bi qasî hebûna xwezayê bi nepenîyan tiştî ye. Cîhana jinan, volkanên giyana wan bi qasî yên gerdûnê mezin û bi tevger in. Kaniya ku hest û ramana jinan jê dertê ev hebûna nepenî ya gerdûnî ye.

Carinan difikirin ku di rastiye de, dilê jinan nezeke gerdûnê ye. Lewra jin bi hest û giyana xwe bertekên ku dişibin bertekên xwezayê didin. Jinên ku karîne xwezaya xwe biparêzin û xwe bi vê bireweriyê dipêçin neynikeke zelal ya vê gerdûnê ne. Lewra her

Helbest zimanê dil û derbirîna giyana xwezayê ye

hesteke wan a xweşik, her hezkirina wan wek bihareke gerdûnê ye. Her xemeke wan, bûyereke di giyana wan de bi qasî bapûkekê û her hêrseke wan bi qasî erdhejekê dijwar e. Jin loma çemekî girî ne û dikarin ji bo hemî êşên cîhanê janê bikêşin. Ji loma bi hêrs in û dikarin nifirên welatekî li pey hev rêz bikin. Jin tiştî hezkirin in û dikarin hezar bextewariyên gulîstanî di yek dilî de bipişkivînin. Û jin loma tije kîn û nefret in dikarin neteweyekî di ava kevçiyekî de bixeniqîn in. Guherînen cuda ku di her wextî de di giyana jinan de çêdibin, ji medcezirên ne kêm û balkêştir in. Lehiyên hestan ku di her serê mehê de di rihê wê de pêl didin ne biçûk in. Her ku ducanî dibe çar demsalên nebînayî di jî û giyana wê bi hemî nepeniyên xwezayê dubare tiştî dibe. Bi her bûyereke ku li nav mirovan dibe re, bi her qewimîneke cîhanê re, ji xem û tirs û hestên cuda hebûna wê heft kirasan diguherîne. Bi şevê jî bîr û giyana wan nahedine, her xeweke wan hezar xewnên nebînayî hildigire. Di jiyana rojane de, bûyera herî biçûk heya qewimîna herî mezin, hemî şûna gul û birînekê li ser giyana jinan dihêlin. Jin loma pêdiviya vegotin û derbirîneke dûr û kûr dibîne.

Helbest pêdiviya vegotina bûyer û bireweriyên cîhana jinan e

Ji derveyî xwezaya jinê ku bi hestiyarî û nepeniyê bar kiriye, tevî vê rastiya xwe ew bindest e. Jina herî nezan û ku hay ji gelek tiştan tune ye jî êşa vê di hemî şaneyên xwe de di jî û pêdiviya derbirîna vê jan û vê rewşê dibîne. Geh bi lorîkên xwe, bi qîjîn û hewarên xwe, bi sixêf û nifirên xwe, geh bi stran û dilokên xwe ev rewşa xwe vegotîye. Bê şik kesên aram ku pîrsgirêkên wan tune ne û giyana wan vehesiyayîye, pêdiviya derbirîneke kur û tîr nabînin. Lê jinên ku bi ser pênûs û sêhra peyvê ve bûne tola bindestî û bédengiya xwe ya dûr û dirêj bi riya helbestê derdibirînin. Lewra helbest, di nav tarî û bédengiya wan de, qîrîneke pirdengî ye. Carinan serhildanek e, di serê her gotinekê de alek çikandîye, carinan neqîşkirina hestên nazenîn e, evînekê li serê her hevokê diçîne, carinan xwekuştînek e, rûpelê kaxiza sipî di nav xwînê de dihêle, hewareke xemrî ye carinan doza hêvî û azadiyên bi bask dike, carinan vegotina nepenîyeke gerdûna xwe ye, carinan giriyekî hûrik hûrik e wek çemekî di nava hêmayan de diherike. Carinan helbet baskek e, carinan şûrekî kalan, carinan çiyayekî ku wek eşqiyayekî xwe lêdigirê ye. Herî pir jî welatekî ji evîne ye, jin li wî welatê helbestî gerdûna xwe ji nû ve ava dike.

Belê helbest tiştêkî wek mecbûriyetê ye ji bo jinan. Helbest birîna herî kûr, bêrîkirina herî tîr, xema herî giran bi hêmayên nepenî dikare vebêje. Helbest dikare bibe ziman ji wê êtûna di giyan û nava jinê de.

Ew dikarin xewn û xeyalên xwe yên pêjerojê li gergefa helbestê birêsin û qadeke jiyînê, li vê cîhana ku her tiştî ji wan re giran dike vebikin. Lewra helbest di nava beşên wêjeyê de, qada herî rast e ku mirov dikare hespê xwe yê ji hestan lê bibe zîne ye. Jina ku ji hestan rapêçayiye û ji hestan zayiye, çima li wî hespên ji hestan afirî siwar nebe û dilê xwe ber bi rojîna helbestê ve vala neke?

Divê qada romanê ji jinan re vebe

Roman jî şaxekî wêjeya nivîskî ya herî xurt û berfireh e. Jin dikarin hemû hebûna xwe, giyan û dilê xwe bi riya mijarên romanê vebêjin. Dikarin xewn û utopiyayên xwe, projeyên xwe yên civakî bi riya lehengên xwe yên romanê derbibirînin. Lewra roman pêşnûmayeke ku kesên nasên jiyanê pê dadikevin e. Jin jî nasên jiyanê ne û gelek hêlên ku ew dikare dakeve kûrahiyê hene. Li gel ku roman rexne, parkirina azmûnê, verêstina paşerojê û pêşnûmaye jiyanekê nû ya pêşerojê ye çima jin bi ser romanê ve nebin? Lê li gor raya min, qada romanê têra xwe ji jinan re ne vekirî ye.

Eger roman bi pêşnûmayekê dikare were nivîsîn, eger projeyekê bi rêk û pêk be ji bo were nivîsîn, ma gelo jin xwediyê vê derfetê ne? Dibe ku yek sedema ku jin xwe bi nivîsîna romanê nakin û bi vê qadê danakevin jiyanê wan a bê pergal be? Lewra di civakê de jiyanekê rûniştî ya jinan tune ye. Ne xwediyên derfetên aborî û azadiya civakî ne. Kêm jinên kurd hene ku bi awayekî bi disiplîn dikarin li ser karê xwe rawestin. Bi taybet çend jinên wêjevan hene ku ji hêla civakê û malbatê û derdora xwe ve tên teşwîqkirin ji bo nivîsandîneke bi pergal? Çend jinên nivîskar hene ku li malên xwe ji dê û bav, ji zaro û mêrên xwe piştigiriyê digirin? Ma gelo dikarin bi awayekî domdar têkevin odeyên xwe û li ser romana xwe bipojînin û kûr bibin? (Ma gelo, çend jinan wêjevan xwediyê odeyê xebatê ne?) Heta ku cesareta nivîsa romanê bi xwe re bibînin? Lewra bi nivîsîna romanê re pêdiviya ku mirov ji jiyana rojane dûr bikeve û carinan berpirsiyariya malê biavêje aliyekî çêdibe. Jina wêjevan divê ji van hêlan ve xwedî piştigiriya derdorê û maliyan be. Divê derdor xwedî hişmendiyeke ku qedirê bidin projeyên wilo bin.

Jin ne li navendê li

qeraxa wêjeye rawestiyane

Hîna jina kurd xwe ji sehwa û metirsiya nivîsê rizgar nekiriye. Lewra jin di bin çewisandîneke civakî de dijîn, giyan û cîhana wan a hestan di bin desthilatdariyê civakî de tê ecîqandin. Ew hîna jî bin nîrê sansura

ku civak li ser giyana wan datîne xelas nebûne. Li gor raya min xaleke din ku jinan ditirsîne û ji qada romanê dur dixe jî ev e. Ma gelo kî ji me dizane ku çend jinên wêjevan, ji bo helbestên xwe yên ku ne li gor hişmendî û nîrxên civaka heya ne, rastî rexne û heta afarozên bêdeng hatine, çend jin ji bo naverokên çîrok, gotar û hevpeyvînên xwe bi şexsiyeteke ne etîk hatine tawanbarkirin, çend jinên wêjevan tenê ji bo hin wêneyên wan ên ku di kovar û rojnameyan de derketine rastî gotinên herî nexweş hatine û bi xirabiyê hatine mehkûmkirin? Kesayetîya jinan dikare ji ber naveroka berhemên wan were darizandin û were bînpêkirin. Ev metirsiyê gelekî mezin e ji bo jinan û loma nikarin bê hesab û cesûr bi ser gelek xalan ve bimeşin.

Ez dikarim bibêjim hebûna jinan a di nava wêjeya kurdî de ne temam e, ne bi tevahî ye. Jinên kurd di wêjeyê de, ne li navenda wêjeyê, di qeraxê wê de rawestiyane. Ji ber van astengî û metirsiyan xwe bera navderyaya wêjeyê û qada wê ya berfireh nadin. Ji bo vê yekê bikin divê gelek bedelan bidin, dive gelekî bi tenê bîmînin û kesekî li gel xwe nebînin.

Belê hîna jî jin ditirse, lewra ew hîna ne azad û bi serê xwe ye. Ew keça bavekî, xwişka birayekî, jina mêrekî û parçeyekî malbatê ye. Gotîneke ku hate ser kesayetîya wê jinê, tê ser hemû malbatê û derdora wê. Gelek jinên wêjevan loma nikarin azad tevbigerin, nikarin xwediyê gotina xwe bin û heta neheqiyên ku li hember wan bixwe dibin nikarin bibersivînin. Heya vê qonaxê jî, jinên nivîskar hay ji naveroka berhemê û gotinên xwe hene. Û xwe mecbûrî otosansurekê dibînin. Roman qadeke azad e û sansurê napejirîne. Giyan û dile mirovan li ber çavên xwendevanan, kite bi kite radixîne. Ji bo ku jin bi dilêrî û aram milên xwe ji bo romanê biçîkîne, divê ev qad ji desthilatdariyê were şûstin.

Helbet ev gotinên me yên jor nayên wê wateya ku jin li benda pakbûna civakê raweste. Berejavî her romana ku jin binivîse wê bibe têkoşîneke baş ji bo afirîna hişmendiyeke nûjen û riya azadiyê ji jinan re bêtir vebe. Divê jinên nivîskar xwe ji bo bedelên bi vî hawî jî amade bikin.

Lewra encex hebûna xwe dikarin bi afirîna biparêzin û ji astengiyên bi vî hawî rizgar bibin. Jixwe di her çaxan de jî, ne bi bédengiyê, bi çalakiyên hatine kirin, bi berhemên hatine afirandin rê li ber mirovan vebûye. Jinên kurd ku di gelek qadên jiyanê de têkoşîneke bê hempa dane û minakên neditî nîşanî cîhane dane û di gelek qonaxan cuda re derbas bûne dê vê astengiyê jî ji holê rabikin. Jinen kurd jî tevî hemû zehmetiyan dê bikaribin romanên pir baş, berhemên watedar binivîsin. Jinên nivîskar ên ku bedelên giyanekê azad dane di her çaxê de hebûne û dê jinên kurd jî bi hebûna xwe ya azad romanên baş binivîsin û cîhana mirovan xal bi xal derbirînin.

Rewşa wêjeya heyî û hebûna jinan

Dîlan AYDIN

Wêje ji aliyê raman, bîrdozî, hestiyarî, têgihîştin û zanîna civak û neteweyan ve pir girîng û pêwîst e. Li cihê edebiyat hebe; li wê derê berhemdarî û mayîndebûyîn heye. Ger ku me kurdan li hember ew qas dagirkerî, talan û komkujiyan jî karîbûye hebûna xwe biparêzin; ev yek bi xêra bingeha me ya wêjeyî ye. Lê çi heyf, em di vê mijarê de zêde xwedî agahiyan nîn in. Bi qasî pêwîst e xwedî li vê bingeha xwe ya giyanî dernakevin. Bê guman, sedemên vê yekê dagirkeriya li ser axa me ye. Lê dîsa jî bi têkoşîna bi salan e tê meşandin diviyabû di vî warî de jî pêşketin û xwedîderketin bihatina bidestxistin. Lê mixabin, ev rewş jî ber bê sazîbûyîna bi besbûnî pêk nehat. Ger ku saziyên têkildarî mijarê ehlê vî karî bûna dê encam îro ne wiha bûya.

Mijareke din jî ew e ku wêjeya rojhilat ji aliyê rojavayîyan ve tê vegotin. Ne tenê rojavayî, nivîskarên rojhilatî bi xwe jî; bi zimanê rojavayîyan dinivîsin. Çi ye zimanê wan, dixwazin çi vebêjin, jixwe ne diyar e. Wek wêneyekî surreal e mijarên pirtûkên wan. Bi vê yekê ve girêdayî, çi hewce dike ku Ehmedê Xanî bi Şekspîr re were muqayesekirin! Ev yek jî aliyê yekî kurd ve tê kirin. Dîsa Amîn Maalofê Lubnanî dema behsa helbestvanê îranî Omer Xeyam dike bi temamî zimanekî rojavayî bikar tîne. Dema tu dixwînî, tu dibêji qey, pirtûkeke rojava ya sedsala 20'an e. Ev yek rastiya wan û wêjeya wan bi tu awayî venabêje.

Dema em li rewşa wêjeya Rojhilata Navîn mêze dikin; dagirkeriya wêjeyî jî tê dîtîn. Çawa ku erdnîgariya Rojhilata Navîn ji aliyê rojavayîyan ve hatiye dagirkirin, wisa jî wêjeya wê ketiye bin dagirkeriyê.

Mijara me ne ev e wekî jî sernivîsê jî tê famkirin. Lê min xwest hinek bi giştî li ser rewşa wêjeya erdnîgariya me, yanî Rojhilata Navîn nêrînên xwe vebêjim. Di rewşa heyî de ne tenê hebûna jinan di wêjeyê de qels e, rewşa mêran hîn qelstir û bêwate e. Bêguman sedema vê yekê dûrbûna ji rastiya wêjeyê ye. Çawa ku gotinek heye "ji bêdeban edebiyat dernayê" rewşa îro ya heyî sedî nod ji 'edebê' dûr e. Jixwe wateya edebiyatê jî edebê tê. Wê demê divê were zanîn ku edebiyat bi xwe divê bi vegotinek bi edeb û estetîkî be. Ka em mêze bikin; di berhemên îroyîn de çiqas edeb heye? Rastiya pergala kapitalîst wek cinawirekî di qada wêjeyê de jî li pêş e. Ger piştî sedsalan jî hê Xanî, Cizîrî, Feqî, Yunus Emre Mewlana û bi dehan wêjevanên bi nav û deng dijîn; ev jî ber edebiyata wan a rastîn e. Lewre, wan bi manewiyatê, bi yekîtiya giyan, raman,

hest û baweriya xwe berhem afirandin. Wek nivîskarên vê demê gotinên sar, bêwate û şikîner jî bo hev negotin. Lewre nexweşiya mezinbûnê ya ku ji biçûkatiya kesayetiyê çêdibe; bi wan re tune bû.

Niha em jin divê pir bi baldarî li ser wêjeya heyî rastwestin. Her çiqas di nava cîhana nivîs û nivîskariyê de em zêde nebin jî; di rastiya de yên nêzî wêjeyê em in. Çima? Ji ber ku em zêdetir dişibin siruştê. Ger em bipirsin; çi eleqeya siruştê bi vê mijarê re heye? Bersiv ev e; çawa tune ye. Wêjeya ku behsa asîman û bayê, dar û beran, çiya û newalan, ax û daristanan neke; wêjeya ku rengîniya her çar demsalan venabêje; dê çawa ji xwe re bêje wêje? Dê çiqas xweşîkbûnên ku bingeha hebûna hemû giyaneweran in nîşanî me bide û me bigihîne cewherên me?

Ger ku wêje deriyê wate û manewiyatê li me venêke, çi xêra wê ji me re heye?

Sedema gotina em jin nêzî wêjeyê ne ev e:

Jin bi gelek aliyên xwe dişibin siruştê. Ji aliyê fizîkî û manewî ve em nêzî axê ne. Bêguman jinên wêjevan gelek in. Ger lêkolîn werin kirin dê ev rastî derkeve holê. Ji bo jinên kurd jî, bi taybetî li Rojhilatê Kurdistanê gelek jinên wêjevan hene. Lê nayên zanîn. Dîsa li Başûrê Mezin û Başûrê Biçûk jî niha gelek jinên wêjevan hene. Lê li Bakur ev hejmar kême e. Bawer im ev yek ji ber dûrbûna ji zimanê dayîkê ye. Ji ber ku li Bakur, zimanê dayîkê qedexa bûye, heta tu bibêji qels maye û dev ji wêjeyê berde axaftin bi xwe jî ne bes e.

Niha merc guherîna û bawer im bi vegera li rastî û zimanê xwe dê bikaribe gav biavêje jiyanê nivîsê û ew ê bi xwe behsa xwe bike. Ew ê nehêle ku bi hevokên tecawuzkar behsa hebûn û xweşîkbûna wê were kirin. Dibe ku rewşa wêjeyê ya tehl û nexweş, ji ber tunebûna jinê ya di wêjeyê de be. Tunebûn yan jî kêmbûna jinê ya vê qadê, hîn zêdetir pêşî li zimanê tecawuzkariyê û fantaziyan vedike. Tunebûna jinê ya di nivîsê de, ji bo bi hezaran jinên kurd ên şoreşger û şehîd neheqî ye. Ew kesayetiyên hêja di heman demê de wêjevan in jî. Mizgîn, Bêrîtan, Nûcan û bi dehan lehengên em navên wan nizanin... Wêje hebûn e, têgihîştin e, zanîn û xweşîkbûna jiyanê ye. Stran û helbestek, pexşan û nivîseke xweş û watedar dikare me li herêm û welatan bigerîne û kêfxweşiyê û xemgîniyê di nava ahengekê de bi hev re bi me bide jiyîn. Jixwe stran jî, helbest jî û gelek cureyên nivîsê beşên wêjeyê ne. Ger ku em wateya wêjeyê bizanibin, em ê bikaribin bi riya wê cewherê xwe biparêzin.

Weje û jin

Mizgîn RONA K

Wek xwendevaneke ku dixwaze têra xwe bibe xwî-nereke baş; ya ku lê digirim wêjeya rastîn e. Dema dibînim jî ji min re bes tê, ango li nasnameya zayendî mêze nakim. Jixwe afirandkarî, wêje, mijareke ku ji ser zayendê gav dike ye; derveyî sînoren zayendî ye ango. Ev rastî di gelek berhemana de jî tê dîtin. Lê belê, ji ber rewşa ku jin tê de ne, wêje jî neçar e bibe mijara gengeşî û afirandkariyê. Lewre ku nivê baxçe di bin talan, hovîtî û dagirkeriyê de be, her roj bê şewitandin û perçixandin; nivê baxçeyên din jî baxçebûna xwe winda dike, êdî ne baxçe ye, yan jî baxçeyêke wisa ye ku li ser talankirina nivê baxçeyekî din xwe didomîne! Ma ev yek dadwer e, an jî rast û durust e? Erê mînakên ku em ji wan hêzê bigrin; Hypatya, Safo, Austen, Woolf û Feruhzadeyên me hene, lê tenê mane, lewre xelekên zincîrê hev temam nekirine. Tarîtiyên mezin ketine navbeyna van çirayan, şevên me bûne yeldatirîn şevên gerdûnê. Li destên me kulîlkên hişkbûyî. Ango em jin, dema dinivîsin; jî baxçeyekî wêran û dagirkirî dinivîsin. Ji mûmên vemirî, malên kavilkirî; jî sibeh û êvarên dîlgirtî, jî xezal û şerejinên kedîkirî dinivîsin. Lewre pêûs di destên zilaman de ne, pirtûk bi simbêl in. Ya herî girîng jî, pirtûk tijî mîrên zordest û jinên bindest in. Di tevî peyv û û paragrafan de jin: “dara şikestî” kevaniya malên tijî newekhevî û tecawiz, wek meymûnên boyaxkirî li kêleka mêran in. Ji tevî pirtûkan, jinên bê vîn û hêz, bê kesayetî û rêz dirijin nav jiyana me, jî sînemayan jî. Lewre afirendkar/nivîskar mîr in û mêraniya xwe bi bêvînî û xistina jinê xurt dikin. Di vê xalê de tenê mînakek jî bes e; Romanên Ahmet Altan. Bi awayekî eşkere yan veşartî, timî wiha tê gotin: “jin wek pişkan in, nikarin xwe îfade bikin, timî dixwazin di bin baskên me mêran de bin. Dema ku dibêjin ‘hewa sar e’ dixwazin ku hûn pardesûyên xwe biavêjin ser wan. Dema dibêjin ‘ez qelew bûme’ dixwazin ku hûn bibêjin ‘na, tu pir nazenî’ û hwd.”

Mixabin ev mînak di wêjeya “çepgir” de derbasdar e. Bi vana ve girêdayî, wêjeyêke sosret heye, ya pornografîk! Jin tenê ji bo tecawizê û

fanteziyên zilam pêlistokek e. Tew îcar ev di bin navê azadiya jinê û erotîzmê de tê kirin. Lê jinê dixin dilqekî wisa ku dilê kosiyan jî jê li hev dikeve. Heta carinan jinên nezan jî pê “cezb” dibin û piçek vîna ku maye jî winda dikin. Lewre çeka zilam a herî mezin, di wêjeyê de jî hêza wî ya zayendî ye û jixwe femînîst dibêjin ku pêûs û penîs heman tiştî bi kar tînin li hemberî jinê.

Ji ber van rastiyan dema piraniya pirtûkan bi xwendina jinani (min du-sê sal berê di der barê de jî ramanên xwe nivîsandibû, her wiha ji bo Kovara Wyê jî, “Di wêjeya gotik û herelekcin de jin” bû sernivîsa lêkolîna min) dixwazim, were dîtin ku ew tewrê wêjeyê jî êrîş e li hemberî me. Ji ber vê yekê jî hemû film û pirtûk hesta “dejavû”yê bi mirov re çêdikin, dişibin hev û me wan tevan, berê jî xwendiyê, dîtîye.

*Xwe bi bayê dijwar kedî kirin
Bi tirêjên çavên xwe, xezalan
Gotin bi qey xezîneyê dîtin
Lê kûpên ku hatin dîtin
Tijî birîn û girîn bûn...
Li mexzenan dîn dibû kurdît...*



Van risteyên min wiha dibêjin, lê ez ê vê jî bi ser van zêde bikim:

*li mexzenan dihele, tarî dibe, qelstir dibe jînîti,
hem jî li mexzenên wêjeyê
Dî çavgirtina xwe de
Winda ye her kes
Haydê! Çavgirtinê dest pê kir
Çavên xwe bigire û min nebîne
Haydê! demsala windakirinê dest pêkir
Çavên xwe hişk bigre
Min winda bike...*

Ya jandar ew e ku em jin di tevî çavgirtinên wêjeyî de jî winda ne. Heta ne tenê di çavgirtinan de, di tevî listikan de. Lewre yên ku kirde-bûn û vîndariya jiyanî winda kiribûn, ya wêjeyî jî winda dikan. Ji ber vê yekê dema niha wiha van rêzan didim pey hev, hesta "Gazinc û rexne bes in êdî, lez bike dereng e" bi min re çêdibe. Ma jixwe çawa "dara xweziyan şîn nabe" ya gazinc û rexneyan jî şîn nabe, ne wisa? Lewre her xeyal, her peyv û jiyînê divê. An na, wek çeng-gek berfa li ber tavê dihele her tişt.

Me qedera xwe anî xwarê
Ji ser eniyên bi keder
Ew li ser bedena çiyayan nivîsand
Li baskên teyran
Me qeder ji kedera çavên
Bê xewn dizî
Li baxçeyê singê jineke çiyayî danî
Niha tangoya Arjantinê dilîze qeder
Lê em dikin û nakin
Kederê jî bîr nake!

Qeder, (çarenûs) û keder, an jî jinanî. Ev her du bêje me jinan tînin bîra min. Yên ku herî pir qedera wan bi destê yê ji derveyên wan tînin nivîsandin, yê ku qedera wan dibe weris û kindir, qeyd û kelemçe jin in. Ango nivê hebûna jinê stûxwarî û qeder e. (Qeder e em çi bikin, ev gotin çiqas pir tê bikaranîn) nivê din jî şikestin û keder e. Ev yek jixwe di wêjeyê de jî derdikeve pêş;

*Hin hevok me bernadin
Em her li nava wan hepiskirî ne*

Bedenên me li wan kilîtiki...

Jina ku afirandkariya şaristaniyê kiriye, niha êş û janên tevî hepiskirinan dikşîne ku wêjeya nêr jî hepiskirineke din e ji bo wê. Divê em jî, vê hepiskirinê gavek ji gavek zûtir bişkinin û xwe bigihînin baskên xwe yê dema şoreşa neolîtîkê.

*Me wek darên aqasyayê
Xwe bi ser gorên xwe da tewand
Û çivîk çûn
Çivîk qediyar,
Koçberî qediya!*

Di vê em bigihîjin baskên xwe û "qedandina çivîkan." Di vê em vegerin, Vîrgînya

Woolf. Çi xweş dibêje: "Wek pêla ku vedigere kûrahiya bedena behrê" (like a wane which returns to the deep body of the sea) û di vê vegera me wek a wê pêla ku xwe digihîjîne kûrahiya behrê be.

*Kenîna me nikare
derdan bibire
Em ê serên xwe
Di bin balifên şevan
de veşêrin
Qehwê neynin
Nêrgizan neynin
Em ê stiriyan paqij
bikin*

*Bi dawên xwe yê dirêj
Lê ya ku me dixwest*

bikira

Ne ev bû!

Ka em biramin, me çi qas karibûye ku em dixwazin pêk binin bi cî binin? Tew qaso kapîtalîzma modernîst jinan "azad dike" yek ji "ikoncanên"

wan jî Paris Hilton e. Hûn bidin xatirê çivîkên helbestan, Parîs Hilton çiqas jin e? Jixwe serdema ku zêdetirîn jinê pakêtiyê dike, boyax dike, dixemilîne û pêşî bazarê dike jî ev serdem e. Lê jin wisa diçirsin ku (ji texsiyên ku di reklamên wan de wek forseke, kordeleyek in jî zêdetir.) Çavan diqemîşin. Lê di bin wan "ronahiyan" de jî çi tecawiz û xwefirotin hene û wêjeya jinqirêjker jî baharata van tevan e.

Bi sedsalan e ku ev hevok/ li vê derê/ eynî li vê derê nivî maye/ em jî di nava/ vê nivîmayînê de/ hepsî mane.

Ka em biramin. Çend hezar hevokên me nivî mane li roman û çîrokan, li helbest û jiyan. Tew nivîmayînên me bi hezaran sal in didomin. Îskana jiyanê jî nivî dimire, ya evînê jî, ya wate û bûneweriyê jî...



Hestên jinê yên veşartî !

Reyhan SARHAN

Jin û helbest wek dê û keç in.

Helbest jin e û jin jî helbest e.

Helbesta her jinekê heye û di her helbesteke de jî rihê jineke veşartiye. Ji ber gelek sedeman ew hest bi civakê re nehatine parvekirin û vegotin. Ji bo ku di civakan de û di serî de di civaka kurd de helbesta jinê bi awayekî bê kiras hê nehatiye nivîsandin û hêja di helbesta kurdî de helbestên me bi kiras in.

Ji bo şermiyên civakê her yek ji me li gorî xwe jî hestên xwe re fistanekî difesilîne bê xwesteka dilê xwe. Mirov dikare bîne ziman ku helbest û jin hev temam dikan...

Jin tenê di siyaseta de derdikeve pêş. Di van salên dawîn de siyaseta bêtir reklam û pere dike ji bo wê jin li dora partî û rêxistinên siyasî de cih digrin û li dora wan kom dibin. Ev yek bê guman ne şaş e. Em ne li dijî wê yekê ne lê belê jina kurd di warê wêje û beşên din ên çandê de jî dikare serkêşiyê bike.

Di beşa helbest û wêjeyê de jin pir kêr in û yên heyî jî bi tena serê xwe dimînin û di qurçika xwe de roj bi roj qels û xemsar dibin.

Dibe ku jî vêya be jin û helbest ew qas nêzî hev in û li hev dipirsin.

Çima jin ewqas xwe di rihê helbestê de dibînin û xwe dispêrin bextê helbestê ji ber ku helbest di giyan û rihê jinê de heye û xwe diparêze carna jî xwe vedişêre

Carna jin ji bo rastiyên civakê hestên xwe di hundirê helbestê de veşartî dihêle û ji xwe û ji civakê vedişêre.

Bala xwe bidinê dema ku mêrek ji bo keçikeke xweşik û lihevhatî helbesteke dinivîse û vedibêje ew bi bextewarî dixwîne. Lê dema ku jinek ji bo yar û dostê xwe yan jî hevaleyê xwe dinivîse ji hêla wêjenas û zanyarên me ve jî bi awayekî rûkenî û henekî li wan tê nihêrtin û an jî bi tenê tîstîstî wek ku sûc û gunehkarî kirine.

Jina kurd di hemû qadên jiyan û civakê de di-

karin xwe bidin pêş û di her alîyan de cih bigirin. Ji ber ku hez û hesta li cem jinê wek çeman diherikin û wek çiyayên welatê me şîr û bilind in.

Jin di wêje û hunerê de jî dikarin pêşengiya xwe bidin diyarkirin û jinên me yên ku hene jî bi tecrubeyên xwe dikarin riya nîfşên ku bîst vîst û di nava tîkiliyê de bin. Ji mêran behtir. Çima? Ji ber ku gelek jin û keçên ciwan hene ku ew hestên wan ên veşartî lazîm e derkevin ser rûyê cîhanê xwe û zelal, dikarin cîhana wêje û helbestê ava bikin.



Hevpeyvîn bi Gulgeş Deryaspî re

Hevpeyvîn: Reyhan SARHAN

✓ *Gulgeş Deryaspî kî ye? Tu dikarî hinekî behsa kurtejiyana xwe ji me re bikî?*

Min û jiyanê di sala 1978'an de li gundê Bedlîsê Xumêçurde me hev nas kir. Dê û bavên min kurdên xwenas bûn. Em heft xwişk û bira ne. Dibistana pêşin min li gundê xwe qedand. Lê ji ber ku mala me li gund bû bavê min nikaribû me bide xwendin. Di sala 1994'an de me mal bar kir û em hatin Tetwanê. Di sala 1996'an de ez zewicîm. Niha jî li Tetwanê dijîm û sê zarokên min hene. Ez li ser ziman û wêjeya kurdî xebatên xwe berdewam dikim.

✓ *Çi bu sedem ku tu bi kurdî binivîsî û cara yekemîn te û nivîsa kurdî, we hev çawa nas kirin?*

Ji bona ku ez bi kurdî binivîsîm sedema mezin ew e ku ez kurd im. Yên ku kurd in û nivîskar in û bi kurdî nenivîsîn wê kî bi kurdî binivîse? Piştî ku ez zewicîm hevserê min Nîhat kirmanc bû û bi zara-vayê kurmançî nizanibû. Min jî kirmancî nedizani. Heta wê demê ez bi zimanê dayîka xwe her tim diaxivîm. Lê ji ber ku wî bi kurmançî û min jî bi kirmancî nizanibû tekiliya me bi tirkî dewam kir. Nêzî deh salan em bi tirkî axivîn heta ku ez bi kirmancî û ew jî bi kurmançî hîn bû. Lê em dereng mabûn lewre ez bi kirmancî ew bi kurdî hîn bûbûn jî têkiliya me xwe li ser tirkî danîbû. Piştî ku min dest bi nivîsa romanê bi kurdî kir ez pê hesiyam ku kurdî cewherekî mezin e lê qîmeta wê nehatiye zanîn. Piştî ku roman qediya û min şand çapxaneyê, Kurdî-Der li Tetwanê ava bû. Dawiyê min li ser rêzimana kurdî perwerdehî dît û xebatên bi kurdî kir.

✓ *Çima gelo li ser pirtûkê kurtejiyana te nehatiye nivîsandin? Te ev yek bi zanebûn hîl-bijart an jî pîrsgirêkeke teknîkî ye?*

Bi rastî daxwaziya min bû. Ji ber ku min naveroka romanê ji kurtejiyana xwe girîngtir didît. Min xwest ku ez bala xwendevanan zêdetir bikişînim ser naveroka romanê.

✓ *Çima romanêke bi kurdî? Te ji bo xwe hîlbijart? Tu dikarî ji me re qala vê yekê bikî Gulgeş xanim?*

Pirseke ku bersiva we dirêj be te pirsî. Bi rastî min di 2003'an de dest bi nivîsê kir. Jiyanê çîroka min kurdî bû lê min bi tirkî nivîsand. Dema romana min qediya û min xwend, hêvî û baweriya ku ez bikaribim roman binivîsîm terka min kiribûn û çûbûn. Romanêke bê rih derketibû holê. Min tu qîmet nedayê, Piştî demeke dirêj mêvanên me yên zimanzan hatibûn û hevserê min xwestibû ku ew jî li romana min a refê binihêrin. Yanî em dikarin bibêjin ku roman û ziman hev negirti-bûn, wek bedena însanekî de çawa sewalek hebe an jî bê ruh be. Ez sedema windakirina bixwebaweriyê hîn bûbûm û min romana bê rih danî quncikeke hundir û bin ax kir. Cara min dest pê kir, çîroka xwe ji nû ve min bi kurdî nivîsand. Dibe ku kêmasiyên wê gelek bin, lê beden û ruhê wê temam bû.

✓ *Weke jineke kurd a ciwan û dayîka sê zarokan, di dema nivîsandina vê romanê de çi zehmetî derketin pêşya te?*

Bi rastî zarok qeteke jiyanê ne. Bê wan jiyan nabe. Lê ew bi xwe bi serê xwe berhem in. Ked ji wan re divê, wext ji wan re divê. Di wê demê de şîrîna min a biçûk hîna 5 mehî bû. Bi şev bi roj eleqeyê mezin dixwest. Gulên min ên mezin jî biçûk bûn, diçûn dibistanê, spartekên xwe bê min çenedikirin. Welhasil bi roj di demên vala de min pirtûk dixwend, bi şev jî piştî bixewweçûna zarokan, nivîsên min bang li min dikirin. Lehengê romanê Hesên dixwest ku ez zûtir biçim û wî jî jiyanê biyanî rizgar bikim.

✓ *Li gorî te jina kurd di warê nivîsa kurdî de di asteke çawa de ye?*

Bi rastî di demên borî de gelekî astengî hebûn. Ji hêla feodaliyê ve bi aliyê pîrsgirêkên malbatî ve.



Wekî mînak em dikarin bibêjin ku ji bo romanê an nivîsên din re ceribandineke kûr lazim e. Jinên kurd dema dibûn xwediyê ceribandinê, nêzî deh zaroyên wan çêdibûn û barê mala wan zaroyên wan tev li ser piştê wan bû. Dema me ev pîrsgirek ji holê rakirin, pîrsgirêka herî mezin ji pişt pozikan ve xwe dida nişan. Zilm û zordariya dewletê. Jinekê bixwesta jî bi kurdî binivîse wê bi alfabeya kurdî çawa binivîsanda? Wê çawa çap bikira? Herî girîngtir bi zimanekî qedexê wê çawa binivîsiya? Ji bona ku binivîsin, divê îşkence girtîgeh û di dawiyê de jî mirin li ber çavan bigirtina. Çaxa ku jinek bihata girtin, îşkence bidîta û jî îşkenceyê bifilitiya yanê nemirîya, wê demê laqê sistema feodalî dihat û sizayê jina ku diket ber destê leşker û polêsan mirin bû. Lê îro ev pîrsgirêkên feodalî û malbatî bi têkoşîna kurd re gelekî kêmtir bûne. Lê astengiya dewlet û sistemê bandoreke psikolojîk jî bi xwe jî cihê xwe tev nedaye.

✓ **Mijara romanê xeyalî ye yan jî bi rastî bûyereke ku hatiye jiyîn e ?**

Yanê di rastiya xwe de jiyaneke ku hatiye jiyîn min hilgirt. Lê em nikarin bibêjin ku sedî sed jiyan kesekî ye. Belê Hesên û tifaqên Hesên hema gişt em dikarin bibêjin ku rast in. Mînak cot nasname, revîna Stenbolê, parêzvanî, revîn û leşkeriya Îranê, êsîrî, îşkence, girtin û mirina Hesên, tevahî rast in. Lê zaroyên Hesên, evîna Hesên, Zibeyro û mirina Riho xeyalî ye û tifaqên din rastî xeyalî tevlîhev in.

✓ **Çima te navên lêhengên xwe Hesên hilbijart û lêhengên romanê yên mên, navê tevan Hesên in? Tu li ser vê yekê çi dibêji?**

Ditirsim ku lehengên romana duyemîn jî Hesên bin. Bi rastî roman tişteki wisa kûr e ku ew te dinivîse an tu wê dinivîsê, nayê zanîn. Yanê şerekî giran bi nivîsê ve dest pê dike. Em bêjin leheng ew nav eciband û wisa xwest.

✓ **Ez ne şaş bim ev cara yekemîn e ku jineke kurd a ciwan roman nivîsiye. Ev hesteke çawa ye ?**

Wisa dibêjin. Lê ez bawer im ku jinên kurd her tim bi jiyânê re mane tenê. Di vê tenêbûyînê de dibe ku nivîsîna lê ji xeynî wan pêştir kes hay ji wan nemaye û kesî dengên wan nebihîstîye an jî dengê wan birîne. Dema ku ez wiha difikirim nava min tel dibe. Ji ber wê dibêjim belkî jî yê zêdetir hevala wan tenê tenêbûyîna wan bû, kesî dengê wan nebihîst, qîrîna nava xwe li çiyayan, li ser keviran nivîsîn, yên yekemîn ew bûn.

✓ **Di dema amedekariya vê berhemê de te ji tu kesî alîkarî stend an jî zehmetiyên ku te kişand çi bûn?**

Zehmetiya herî mezin ew bû ku min bi rêzimana kurdî nedizani. Ji bo ku ez alfebeya kurdî fêr bibim tu derfetên min tune bûn. Kurdî-Der li çend ciyan hê nû vebûbû lê wê kîngê ya Tetwanê vebûya nediyar bû. Di aliyê rastnivîsê de Aysel Çetîn kedeke mezin da.

✓ **Ji bilî romanê, tu beşên wejeyê yên din jî diceribînî gelo? An tu tenê romanên dinivîsî?**

Niha xebatên min tenê li ser romanê hene lê di pêşerojê de wê çi bikeve nav eleqeya min ne diyar e.

✓ **Tu ji bo xwe kîjan nivîskarê/a kurd an jî yên navdar mînak digirî?**

Niha bi rastî jî ji aliyê romanê ve wêjeya kurdî gelekî li paş maye. Yanî derfeta me ya bijartinê zehf tune. Pewîst e gelo ku ez navê romanivîsê mezin Mehmed Uzun bibêjim. Ji xeynî nivîskarê kurd, romanivîsê herî mezin ku romanên wî wekî loqumên şîrîn, tehma wî dimîne di devan de, ronakbîrê mezin Yaşar Kemal û romanivîsê ku zêde nayê naskirin lê nivîsên wî kûrahiya rihê insanan nişan dide, romanivîsê mezin Franz Kafka, bi nivîsên xwe jî bona min ronakbîrên pêşîn in.

✓ **Ji bilî nivîsê, tu bi karekî din re jî mijûl î gelo?**

Belê, ji xeynî romanê sê berhemên min ê ku tu carî dawî lê nayê, heta hetayê di baxçeyê jiyanê min de karekî fireh û bê dawî girtiye henê. Berfin, Diyar Bariş û Hêzil Tamara.

✓ **Ji bilî kurdî tu bi tirkî an jî bi zimanekî din dinivîsî gelo?**

Di warê romanê de tenê bi kurdî dinivîsim lê di malperekê de qunciknivîsên min hene ew jî bi tirkî ne.

✓ **Di dawiyê de tu dixwazî çi bibêji û di demên pêş de xebat û projeyên te çi ne?**

Xebatên min li ser nivîsê dom dîkin. Lê ez bawer im ku gelek jinên kurd jî xwedî li zimanên xwe derkevin û vê asimilasyona li ser kurdî pûç bikin. Lewre ziman zimanê dayikan e lê di Kurdistanê de ziman tune ye. Çima ku dewlet zimanê dayikan perçiqandîye û ziman bûye zimanê dewletê. Ez dibêjim qey ez ê sibê bimirim, hemû projeyên di mêjiyê xwe de dinivîsim komputurê. Şablona sê romanên min derxistîye. Du roman girêdayî hev in û naveroka wan gelekî kur in. Lêkolîneke kûr jî divê. Romana ku niha di destê min de ye belkî heta salekê biqede.

Jin di helbestên Cegerxwîn de -I-

Mehmûd BADILÎ

Pêşgotin

Ji zanyarekî pirsîne: tu bi çi rengî ghişî vî cihê bilind ji zanîn û pendeyariyê? Got, bi jina xwe, de ji dêvla min spasiya wê bikin, ji ber ku ew ê min ji karûbar û tiştên kufletî lêborîn kir, îcar min xwe bo kar û barên taybet vala kir û ez ghişîtim.

Yek ji hozanan dibêje: Kînge we jin perwerde kirin, êdî guh medîr perwerdekirina mêran, çare nîn e, dê jin bi xwe re wan perwerde bikin.

Napoleon Ponabert dibêje: "Jina ku dergûşê bi destê xwe yê rastê dihejîne, dikare bi destê çepê jî cihanê tevî bihejîne."

Êdî, gelek nivîskar, zanyar û helbestvanan ji bo babetê jinê û cihê wê di civakê de mijûl bûne, gelek lêkolîn, xwendin û nerîn di vî warî de li ser rewşa jinê ji hemû aliyên ve, ji hêla civakî, siyasî, rewşenbîrî, rewîştî, olî û aborî ve peyda bûne.

Hin lêkolîner li ser taybetiyên jinê bi xwe rawestiyane, ji hêla karî û hêza laşî, derûnî û hişmendiyê ve û danberhevkirina di navbera jin û mêr de ji van aliyên ve.

Li gorî şopandina me ji wan nerînan re, me dît ku gelek nerîn hevbeş in û gelek ji wana jî dûrî hev in, ew tîvel û nakokiyên ku peyda dibin, di pîleya pêşîn de li pîrsgirêkên civakî û olî vedigerin û li berfirehiya bawerî û hişyarî û hişmendiyê kesê ku lêkolînê dike û helwestên xwe li ser ava dike vedigerin. Mînak mîrê oldar ew nerîna xwe li gorî deqên Quranê û fêrkerên pêxemberî diyar dike û yê zanîndêr nerîna xwe bi rengekî zanistî bêtî ku têkeve bin bandora olî de ava dike û nerîneke dîtir heye, em dikarin bêtî di navbera herdu nerînan de "olî û zanistî" peyda dibe.

Seydayê Cegerxwîn jî di helbestên xwe de, bi nerîneke zanistî berfireh nêzikî pîrsa jinê bûye, tevî ku xwendin û perwerdeya wî olî bû jî û gelek salan feqîti kiriye, lê kêman bandora olî li helwest û nerîna wî bûye, tenê di hin tiştan de nerîna wî hevbeş bi ya olî re, bêtî tiştên girêdayî di hundirê malê de yên di navbera jin û mêr de û gelek nerîn jî tîvel in ji nerîna olî û jê dûr in, ji bilî wilo jî gelekî pêşketîne û li ser bîngê zanistî ava bûye.

Ew nerînen pêşketî û zanistî yên ku li cem helbestvanê me yê hêja Seydayê Cegerxwîn peyda bûne, bêtî guman vedigerin bîr û baweriyên wî, çimkî Seyda bi xwe mirovekî marksîst bû, û di destpêka xebata xwe

de, di rêxistina komunîsta Sûriyê de dixebitî, îcar bandora felsefeya marksîstî û serkeftinên ku li Sovyetê çêbûbûn li ser destê Lenin û Stalin pir li helbestên wî bûne û ev bandor di helbestên wî de baş diyar e.

Jin û xwendin

Seydayê Cegerxwîn helbestvanê gel bû, di nav mîletê xwe de dijiya û rewşa mîletên dîtir jî dişopand, lewre bi êş û derd û kêşeyên civaka kurdî baş dizanibû, didît bêtî çawa jin di tariya nezanî û nexwendinê de winda ye, îcar bi nalîneke kûr û di-jwar bangê dide keça kurd û wê hay dike ku ji xew şiyar bibe û berê xwe bide xwendinê, li vir xwendin û serbestiyê bi hev re girêdide, ango xwendin, serbestî û pêşveçûna jinê bi cî tine.

*Ey keçe rabe bixwîne da tu serbest her bijî
Zû ji xew tu ser hilîne bes bimîne bê mijî. (1)*

Cegerxwîn nîrxekî pir bilind daye xwendin û ev nîrxê han jî jinê re dide xuyakirin, paqijî, pakî, jîrî û jêhatîbûna mirov bi xwendinê ve girêdide, her dibîne ta ku jin bi rola xwe ya rênçberî di hundirê malê de rabe, divê ku jîr û zana û xwendewar be:

*Rencbera hundir tiwî tim rind û jîr û zane be
Bo te bêtî her divêtin xwendewarî, paqijî .
Ger bixwînî dê bidî xwendin tu ê hundir teva
Ger nexwînî kes ji bo me êş û derdan nakuji. (2)*

Mereqa Cegerxwîn bû, ku keça kurd bixwîne, ew jî wek hevalên xwe li her deverên cihanê zana û serbest be. Her mirov bi xwendinê serbilind dibe, bi xwendinê yek dikare êş û kulên xwe bikuje, ev nerîna ha bi rastî pir pêşketî ye ku Seyda xwendinê dike dermanê hemû êş û nexweşiyên û jiyana mîletê kurd û hebûn û pêşveçûna wî bi xwendinê ve girêdide:

*Wa hevalên te li her cî serbilind pêşve diçin
Rabe ser xwe ey keça kurd serbilind bimire tu jî
Wa Cegerxwîn xweş dinalî da ku jin pêşve herin
Da bibêjin her bijî kurd her bijî kurd her bijî. (3)*

Dişa, di warê xwendinê de, Cegerxwîn vê carê xwe berdide hundirê kesayetiya keça kurd û bi zimanê wê

doza xwendinê berder dike, ku keça kurd ji pêşveçûnê hez dike û daxwaza wê ku her gav serbilind û serbixwe be, her dibîne ku keça kurd li xwe şiyar bûye, dê di rêya xwendinê re, ji bin bandora sitem û sawîr û axaftinên pûç û bêwate rizgar bibe û nema di civakê de pepûk û dîl dimîne:

*Ey keça kurd nû gihome tim dixwazim pêşveçûn
Doz û daxwaza me herdem tac û ala serxwebûn
Tim divê ku em bixwênin da nemênin jar û dîl
Min nema êdî divêtin ev xeyal û qal û qîl. (4)*

Jin û kar

Di warê karê jinê de, hin nivîskaran taybetiyên karê jinê dane xuyakirin û karê wê ji karê mêr cuda kirine li gorî karîr û hêza li cem herdu rêgezan (tuxman), ev tiştê ha li cem Seydayê Cegerxwîn xweşik nediyar e, doza kar li jina kurd dike ku mîna gula bi bêhn her dem geş û şêrîn be, ango di civatê de ne bê ber û berhem be:

*Li kar be, bi kar be wekî herkesî
Gula geş be her dem, ne pel çilmişî. (5)*

Ne tenê jinê radiajo ber bi kar ve, belê jê dixwaze ku pişt bi xwe bibeste heta ku çavê xwe bernede destê bav û bira “destê mêr”, û jin û xwespartina wê di warê kar di jiyanê de pirseke pir pêwîst e, serxwebûn û serbestiya wê bi cî tîne, di bin destê mêr de nema dîl û stûxwar dimîne, îcar mirovên xwedî berhem bi nirx û rûmet in li cem her kesî, wek mêşa hingiv bi her kesî şêrîn e çî ku hingiv dertîne:

*Tu çav bermede destê bav û bira
Li cem xwe meke wek senem tim pera
Binêre ji mêşê ku têt hingivîn
Li cem herkesî ew dibî wer şîrîn. (6)*

Belê, Cegerxwîn ji dîl û can, bîr û bawerîya xwe bi ramanên marksîstî hetanî, welatê Sovyetî dikir nimûne ji wekhevî û demokratiyê re, ji mirovatî û dadmendiyê re, di helbesta “ ax şûfêra kolxozê “ de, wek dost û hevalekê li wê keça şîfêr dinihêre, pir bi wê dilşad û kêfxweş e, ku dosta wî li ser serê kar e, amoze ye, marksîst e, her du di yek rêkê de diçin, bi raman û doz in, bi dilsozî dixebitin heta ku bi hev re toza salan ji ser ruwê doza xwe paqij bikin:

*Lêv şêrîn me daye pey Markis, pey Lênîn
Ristên min dilsozî, bixwîne dilsozê !
Toza dem pişt me xûz kirye, ey zana!
Wer da em ji ser xwe bavêjin vê tozê!
Cigerxwîn ! ka bêje kiye ev dosta te ?
Dosta min: dengbêj û şûfêra kolxozê. (7)*

Bê guman kar jinê ji gelek nexweşîyan diparêze, lewra Cegerxwîn ji jinê dixwest ku tim li kêleka mêr li kar be, her em dibînin doza hevkarîyê jî li jin û mêr dike di nav kar de, ji ber hevkarîya jin û mêran, dewlemendiyê çêdike û ji wan dixwaze ku karên xwe bi alavên nû bikin, alavên nû yên hevdemî wek terektoz û patoz û kemyonan, ev di warê çandiniyê de, ji aliyekî dî ve, ji wan dixwaze ku destê xwe têxin destê hev û li dijî axa û beg û şêx û melan şiyar bin û bixebitin, çî ku Seyda ev kesên ha lewçe û neyar û diz û girêdayî didît, yên ku hiştin kesên hejar, geda û jar û paşketî bimînin:





*Jin û mên bi hev re di nav kar de bin
Derê dewlemendî li me dê vebîn
Bi hesin biçîne welatê xwe tev
Li ser hev tu bajo bi roj û bi şev
Beg û şêx û axa nehişt herne pêş
Tevan em dimêtin wekî kêç û mêş. (8)*

Jin û xebata welatparêzî

Tevî ku rewşa jina kurd, ne li gorî dilê Seydayê Cegerxwin bû jî, lê her dem gelek hêvî li ser datanî ku karîni li cem heye heta ku têkeve warê rêxistinên siyasî û li kêleka mên bixebite, lewra her gavê qîr lê fikir ku rabe ser xwe û li hawîr xwe binihêre, perde û çarîka dîliyê biavêje û xwe bi rext û tivingê rapêçe:

*Keçê rabe serî hilde divê çaxê weha nabî
Binêr jin çûne ezmana, heta kengî di xewda bî ?
Çine ev çarîk û pêçî, di rexta da xwe rapêçî
Bi destê te kelaşînkof, bera zana û xwinda bî. (9)*

Her dem doza hişyariya keça kurd fikir, ku ew jî wek keçên cihanê bi alî xwendin û zanebûnê ve gava xwe ber bi pêş ve biavêje, li cem vê yekê nerawesta, belê doza ku xwe bi rext û tivingê rapêçe û wek mên ew jî şerê dijmin bike, bi dijmin re dijmin be, çî li gund û çî li bajar. Jê dixwest ku mîna findê be her gav ronahiyê bide yên hawîra xwe, divê diya şer û pilingan be, hevaltiya serbilindan bike, her dixwest ku keça kurd rengê kundan di hundirê malê de dîl û perîşan nemîne, belê bi ceger be, di cengê de jîr û jêhatî be, derbas be partiyên û rêka demokratîyê bigire, bi rêz û rêzanî li kêleka mên be:

*Dixwazim ko wekî min bî, bi dijmin re tu dijmin bî
Di cengê de wekî cîn bî, ne rengê bûm û kunda bî
Keça zana û jêhatî, bibe partî-Dîmuqratî
Bere dîsa tu şêrîna dilê xorta û seyda bî. (10)*

Seydayê Cegerxwîn di warê kar û xebata bo welat de, bar diavêje ser milê jinê ku, ew jî bi barê xwe rabe weke mên, her dibîne heta ku jin û mên dost û yar bin, bi hev re dilşad û dilxweş bibin, divê ku bi hev re bixebitin û welat rizgar bikin jî bin destê neyaran û rizgariya welêt di rêya ceng û şer de didît, ev jî ne jî ber ku mîletê kurd hirç û hov û şerxwaz e, belê jî ber ku mîletê kurd mirovperwer û aşîxwaz e, lê dijmin herdem ew diajot ber bi şer de, li vir dostaniya jin û mên û rizgariya wan bi rizgariya welêt ve girêdide:

*Di gel min were da bikin em xebat
Li ser min, li ser te felata welat
Wekî min tu xoş dawer û bîrewer
Dixwazin bi hev re herin ceng û şer.
Ne ko şer dixwazin, ne jî hirç û hov
Dixwazin bijîn em wekî her mirov
Dema em jî qada xwe derxin neyar
Jin û mên jî nûve dibin dost û yar. (11)*

Ji bo bicîkirina aşî û azadiyê, ji bo piştigiriya rêbaza Nîlson û wekhevî û dadiya ku li Sovyet li ser destê Stalîn şagirtê marksîst bi pêk hatibû. Seydayê Cegerxwîn bang dike keç û xortên demokrat ku dengê xwe diji şer û cengên bê hûde hildin, diji kesên şerxwaz mîna Tiroman û Çorçil û Mak Erser, diji pirojeya Marşal û hevpeymana Etlesî, diji serperistiyê, diji çeka atomî, diji birçibûnê, her jî wan dixwaze ku bi rola xwe rabin bo pêkanîna aşî û wekhevîyê:

*Keçên demuqrat bêjin Eçîson
Atoma zerî dînya kir hêton
Ka însaniyet: mezhebê Wêlson
Ji bo koledar bûne him û lat
Xortên demuqrat, keçên demuqrat
Bêjin metirsîn va roja me hat.
Keçên demuqrat bikin qîr û deng
Em nan dixwazin naxxwazin tifeng
Haştî dixwazin em naxwazin ceng
Çêbûna millet xweşbûna welat
Xortên demuqrat, keçên demuqrat
Bêjin metirsîn va roja me hat. (12)*

Seydayê Cegerxwîn roja heştê adarê rojeke pîroz dibîne, roja mirovatî û wekhevîyê, roja serbestî û şikandina qeyd û bendên bindestiyê lê dinihêre û maf dide jinê ku kar û xebatê bike diji sitemkarî û zordestiyê:

*Heştê adarê roja me hilat
Cejna jinaye, jinên demuqrat
Qeyda lingê me wê rojê şikand*

*Ew çaroka reş me girt û çirand
Ey xuşkên hêja jinên demuqrat!
Heqqê me ye tim ev kar û xebat. (13)*

Piştî ku Leylaya pakrewan canê xwe kir qurban bo kurd û Kurdistanê, bêtir vê pakrewaniyê hêrs da Cegerxwîn ku bêje: “Şêr şêr e çi jin çi mêr e”. Êdî jin bi tiştêkî xwe ne kêmi mêre di warê ceng û şer û xebatê de, erê Leylaya pakrewan ev tiştê ha çesipand û tekûz kir, her bû nimûne û pêşrew, ne tenê bo jin û mêrên Kurdistanê, belê bo hemû jin û mêrên cîhanê:

*Şêr, şêr e, mêr e yan jin e
Nîşan bi dest, Leyla min e
Polaye dil wek asin e
Leyla kî ye ?
Leyla min e Leyla jin e....*

*Pir şerm e ey xortên ciwan!
Keç bêne kuştin pehlewên
Win jî temaşa kin li wan
Rûmet çi ye ey xwendewên ?
Leyla kî ye ?
Leyla min e
Leyla jin e... (14)*

Jin û bindestî û wekheviya wê bi mêr re:

Di warê wekheviya jinê bi mêr re, pir xîmav ji hêla hin nivîskar û helbestvanan - ji her du tuxman- xerç bûye, tev doza wekheviyê dikin, lê vê dawiyê hinek pênuşên dîtir derketin, dibînin ku wekheviya jinê bi mêr re, ne di cihê xwe de ye û dozê ne dirust e, ji ber ku fîzyolojiya jinê têvel e ji ya mêr.

Lê Seydayê Cegerxwîn ji dil û can, bîr û baweriya xwe bi wekheviya jinê bi mêr re aniye, têveliyê naxe navbera wan, her ew dibîne ku jin û mêr ji hev çêbûne, ji hev hatine ser ruwê jîyanê, îcar divê ku wek hev bin, her wê bi pingavê jinê û nexşê evînî ya ku her dem pertav û ronahiyê dide destnîşan dike:

*Ez û tu ji hev hatine wek hev in
Li pey hev diçin em, çi roj û şev in
Tu pingavê jinê gelek kêr û dûr
Tu nexşê evîn î bi pertav û nûr. (15)*

Di vî warî de jin li cem Cegerxwîn, xuşk, dayik, heval, yar û kevanî ye, ta radeyekê ku wê Xwedê û xwedî dibîne, ji wê dixwaze ku li hawîr xwe binêre bê çawa çerxa jîyanê digere û wê diarihîne ku di rêya xwendinê re, xwe ji bindestiya mêr rizgar bike, xwendin darê dest e, eger jin bixwîne nema hejar û belengaz li bin destê mêr dimîne:

*Tu “xo” û tu “dê” ye Xwedê û xwedî
Meyandin, keyandin te em bêfedî
Bixwe hem bixwîne, bixwe dest xwe dar
Li bin destê mêran nemêne hejar. (16)*


Tevî ku Cegerxwîn doza wekhevî û serbestiya jinê ji bin destê mêr dike, lê carinan em dibînin di rêya gelek şîret û serperîstiyên ku li jinê dike, dikeve nakokiyê bi xwe re, nakokî di navbera doz û nêrîna wî de eşkere xuya dike, mîna ku mêr bêje çi tu bêjî erê, û ji ber wî rabe, yan çi got divê tu lê venegerînî, yan her dem divê jin li ber mêr here û were, angû li ber bigere û tim wî razî bike, her li vir serperîstiya mêr eşkere dide xuyakirin û ji jinê dixwaze ku tim bi ya wî bike, ev nerîn ji hevbeş e bi nerîna ola îslamî re, îcar dibe ku bandora ramanên ola îslamî jî li Cegerxwîn bûye, ya dîtir mirovê rojhilatî çiqasî pêşketî be, hin tişt ji rêz û rêwazên civakî û perwerdeyî û olî di hundirê wî de cî-girtî dimîne, ev tiştên ha di gelek helwest û nerînên wî de xuya dikin:

*Pera jê mexwaze, bere ew bidî
Tu caran ji wî re mebeje gidî
Li hawîr venire hela kî heye?
Çi bêjî, tu jê re bibêje weye .
Eger karibî tim li wî guh bidêr
Ku gotin ji zû bin, negotin ji zêr. (17)*

Di civaka me ya kurdî de, pendek gelêrî heye hta niha jî tê gotin ku “Jin darên şikestî ne”, Seydayê Cegerxwîn li ser zimanê cîqê reş yê ku nûneriya mêr dike ev pend derbas kiriye nav hevpeyvîna ku bi kevokê re dike ya ku nûneriya jinê dike, ku jin divê bindest bimîne û tim li pey mêr be, çi ku ew darên şikestî ne, her li vir wêneyê jinika “jinbî” berçav dike, ku bawerî pê nabe, paxirên wan tev reş in heta ku spî û zêr jî bin, bê guman, ne dûr e ku gelek mêr bi vî nerînê li jina jinbî dimeyîzin, ji ber ku bê pişt e, angû bê mêr e, îcar gelek mêr çavê xwe berdidinê û dixwazin serperîstiyê lê bikin:

*Çiq go: kevoka sipî
Evîn weynê jinên bî
Reş paxer in, sipî, zêr
Niha bûne jin û mêr
Eger qanûnek hebê;
Divê tu pey min de bê
Jin tim darê şikestî
Jê re nîne serbestî. (18)*

Dê bidome, Kovara Wyê...



İkrâm BALEKANÎ

Yekemîn helbest & yekemîn helbestvan

Li gorî agahiyên ku Roberta Binkley di sala 1998'an de ji lêkolîner û arkologên muzeya Pensîlvanyayê girtine, derdikeve holê ku yekemîn jina helbestvan akadî ye û li Mezopotamyayê jiyaye.

Li gorî belgeyan, 4300 sal berî niha yanî 2300 salî berî zayînê qralê Akadî Sargonê Mezin (ku di dîrokê de wekî sazkarê yekemîn împaratoriya cîhanê tê zanîn), keça xwe ya bi navê Enhêdûana li bajarê Urê dike sereka rahîbeyên sumerî. Sargon bi xwe akad bûye lê ji sumerîyan re qralî kiriye. Keça wî jî di avakirina împaratoriye de jê re bûye alîkar. Li piştî wî rabûye da ku Sagor çanda akadan û sumerîyan tevîhev bike û bikelişîne. Hin çavkanî dibêjin ku tenê mehekê ew bûye sereka rahîbeyan.

Enhêdûana helbest jî nivîsîne. Di hin helbestên xwe de behsa xwedawenda sumerîyan Înanayê dike û pesnê wê dide. Li gorî helbestên wê yên ku heta îro mane, tê gotin ew yekemîn jina helbestvan bûye. Heta hin kes dibêjin ku yekemîn helbestvan e.

Yekemîn belgeya dîrokî ku behsa hebûna Enhêdûanayê dike jî sala 1925'an de di dema kolana cihên dîrokî yên Mezopotamyayê de ji aliyê arkeolê Leonard Woolley ve derketiye holê.

Di sala 1995'an de ji William W. Hallo û J.A. Van Dijk ku bi xwe sumernas in, 50 tablet bi hev ve zeliqandine û helbesteke Enhêdûanayê bi dest xistine. Niha ji Enhêduannayê du mohr, dîske û hinek tablet mane ku li muzeya Pensîlvanyaya Amerîkayê tên parastin.

Nivîseke ku bi xetên mîxî hatiye nivîsin û tê qebûlîkirin ku ya bavê Enhêdûana, Sargonê akadî ye, hatiye deşîfrekirin û xwendin. Di wir de Sargon wiha behsa jiyana xwe dike: "Dayika min a pîroz ku li ser min ducanî bûye, piştî ku ez bi dizî anîme dinyayê, ez danîme nava selîkekê, bi benîştê qaçkê her derê min zeft kiriye û dora min pêçaye. Paşê ez emanet dame çem û berdame ser ava çem û rûbar. Çem ez birime mala cotkarekî bi navê Akî û wî wekî kurê xwe ez mezin kirime. Dema ez rezvan bûm û

heta niha ku 54 sal in ez qiral û serwer im, her tim xwedawenda Starê ez parastime û ji min hez kiriye."

Ew nivîs ku behsa jiyana Sargon dike her wisa keça wî Enhêdûana jî karakterîze dike.

Ew di helbestên xwe de bi xwedawenda sumerî Înana re diaxive û li ser wê helbestan dibêje. Ev yek jî helbestên Sapho tîne bîra mirov ku ji bo xwedawenda bi navê Afrodîtê helbest honandine û di helbestên xwe de bi wê re axivî ye.

Hin helbestên Enhêdûanayê ku kêfxweşiyê diyarî Înanayê dike, ji 18 beşên helbestên wê pêk tên û bi nivîsa bizmarî hatine nivîsin. Di encama lêkolînan de hatiye sabîtîkirin û selimandin ku ew helbestên wê bi xwe ne. Tê gotin ku 42 helbestên wê yên dînî hene û ji bo ku li perestgehan bîr xwendin, ew amade kirine. Lê hin helbest hene ku hê jî nehatiye îsbatîkirin ka yên wê ne yan na.

Tê texmînkirin ku Enhêdûana di navbera salên 2285 heta 2250 berî zayînê de jiyaye, hin kes helwest û nêrîna wê wekî nêrîna yekem a femînîstî ya cîhanê jî qebûl dikin.

Du berhemên wê ku ji şeş helbestan pêk tê li ser hebandina xwedawenda hîvê, Înanayê bi ser navê "Nîn, Mî, Sar, Ra" honandine û wekî şebanûya bêhemtaya xwedawendî nasandiye û dîsa bi sernavê "În, Nîn, Sagor, Ra" wekî şebanûya deryaya dil bi nav kiriye û helbestên wê ji 135 rêzik û du stûnan pêk tê. Hem ji aliyê çepê ber bi aliyê rastê û hem jî ji jorê ber jêrê tên xwendin. Yanî hem çep-rast û hem jî jor-jêr tên xwendin.

Di sala 1927'an de di encama lêkolînên arkeologî de taseke mermer hatiye dîtin ku bilindiya wê 7 û dirêjîya wê 26 santîmetre ye. Di nava tasê de wêneyek heye. Di wêne de 4 kes hene. Bi rêzê wêneyê pîremêrekî heye ku li ber wî wêneyê Enhêdûana heye. Cil û bergên dirêj li bejna wê ne. Li pişt wê jî du zilam di wêne de xuya dikin. Tê gotin ku alîkariya wê dikin.

Hin dîrokzan û nivîskar, berhema Enhêdûana nîşaneyê bihêzbûna cismanî û ruhî ya wê dinirxînin.

Enhêdûana di hin helbestên xwe de behsa xwedawenda evîn, hezkirin û bereketê dike. Ew pesnê Înanayê (Star) dide.

Enhêdûana & Înanna (Star)

“...Banûya min, tu mezin î nayê înkarkirin
Bihêle bila dilê te ji bo min lêde
Kiryarên te yên baş bêhempa ne
Perestîş û hebandina te mayînde ye
Banûya min a ciwan, bihêle ku te bihebînim
Hebandina te tamedê şîrîn û xweşikîya dilê min e.”

Di beşeke din de dibêje:

“Şehbanoya Şehbanoyan, tu li ser axa pîroz a Xwedawandan ji dayîk bûyî, li ser axa pîroz hatî dinê lê belê tu bi xwe pîroztir î. Tu zana û têngihîşt î, Keybanûya serzemînên nenas, bibêje ku tu çavkanî û avzêya bereket û jiyanê yî. Pîroziya te li bîra min e.”

An xwedawenda asîman e. Xwedawendê erşê ezîm e di mîtolojiya sumeran de. Anhedûana ji bo wî ji helbest honandine.

Enhêdûana & An

“Bi qîmeto, dilê te derya ye,
Xwezî dilê te ji bo min rihet û aram bûya
Hevjînê delal, Ano!
Şehbanûya Asoyan û ronîya bihuştê, hevjinê te ye,
Hem jî ew ya ku bi xwe, tam Xwedaya Xwedawandan e
Niha li ber te serê xwe ditewîne û axê radimûse...”

Anhedûana li ser xwe jî hin helbest nivîsîne û di beşek ji helbesteke xwe de wiha pesnê xwe dide:

“Jina ku bi rastî xwedî eql û zanîna zêde ye
Kesa ku hemû lewheyên Lacordîn xwendine
Hemû cih û mekan, erdnîgarî nas kirine
Bihuştê ronî dike, ser û binê erdê dîtine...”
Di helbesteke din de wiha dibêje:
“...Ez im Enhêdûana parêzvana mezin
Bi Enbatî re li wir bi coş û hez im
Li wir ku mirin ji min re erzan dîtîn,
Ez jî ber bi ronîya agir ve dibezim

Li wir ku agir ez şewitandim
Ez ber bi tarî û siyê ve dilezim
Hema li wir ku bahoz li min rabû
Dîsa Anhedûana her ez im...”

Berî niha jî dîsa hatibû îdiakirin ku ku di dîrokê de yekemîn helbesta evînî, li Mezopotamyayê ji aliyê jinekê ve hatiye nivîsîn.

Ji Zanîngeha Philadelphiayê, profesor Hilprecht, di navbera salên 1889-1900'an de hin lêgerîn û lêkolîn pêk anîne û berhemên dîrokî vedikole. Di encama kolandina hin cihên dîrokî yên Mezopotamyayê de rastî berhemên balkêş tê.

Bi sedan berhemên ku bi nivîsa mîxî yanî bizmarî hatibûn nivîsîn, tên dîtîn lê naveroka wan nehatibû zanîn. Wê çaxê wan berheman radestî rayedarên Osmanî dike.

Piştî 58 salan lêkolîner û sumernas Muazzez Çig û Hatice Kizilay ji nava wan berheman helbesta jinekê deşîfre dikin ku tê gotin ew yekemîn helbesta evînî ya cîhanê ye. Ew helbest di navbera salên 2500-3000'an berî zayîna Îsa de hatiye nivîsîn. Tê gotin ku helbest evîna Şehbanû û Qiralê Sumeran vedibêje ku ji aliyê keça sumerî ve hatiye nivîsîn. Lê hêjayî gotinê ye ku hin çavkanî jî dibêjin ku ev tablet û kevir li Amerîkayê ye û di sala 1889'an de li bajarê Nîppûra Iraqê hatine dîtîn ku 150 kîlometre dûrî Bexdayê ye. Ew di sala 1955'an de ji aliyê sumernasê amerîkî yê bi navê Samuel Noah Kramer ve hatiye deşîfrekirin û xwendin.

Di serpêhatiya helbestê de tê gotin ku keçikê ji qiralê sumerî re roja serê salê û di destpêka zewacê de nivîsiye.

Ew helbest pir hatiye hezkirin û di demeke kin de di nav serayê de belav bûye.

Paşê jî stranbêjên serdemê helbest kirine stran û di demeke kin de ketiye ser zar û zimanê gel.

Piştî hingê helbesta wê li ser keviran hatiye kolandin. Yekemîn helbesta dildariyê ku ji aliyê rahîbeyeke sumerî ve hatiye nivîsîn niha li muzeya Arkeolojiyê ya Pensilvanyayê (Pennsylvania) tê parastin û nîşandan. Di sala 2007'an de jî li muzeya arkeolojiyê ya Stenbolê li Tirkîyeyê jî hat nîşandan.

Lê belê li gorî hin çavkaniyan di nav sumeran de pir zewacî hebûye. Qiral jî bi gelek keçikan re ketiye têkiliyê. Lê wisa xuya dike ku xwedîya helbestê ne ji wan keçikan bûye ku qiral bo kêfê biribe xelwetgehê.

Helbest bi hestê bûkê ji bo zava hatiye honandin û bi gotina zava dest pê dike. Helbest wiha ye:

“Zava, delaliyê ber dilê min,
Xwedîyê delaliya mezin
Te ez sermest kirim
Qey tu hingiv î li ber dilê min (ev qas şîrîn)

Li hember te rawestim bi ta û lerezê

Bi kêfxweşî zavayê xwe mist bidim ez ê
Mistdana min a giranbiha ji hingiv xweştir e
Bibexşîne bo min vê mistdan û hezê
Delaliyê min, malxê û xwedanê min
Malxê mala min, sermestiya min
Bibexşîne bo min vê mistdan û hezê
Ey arambexşê dilê Enlîlê, Sosinê min”
Li gorî hin çavkaniya ji dibe ku rêzika
dawî wiha be:

“Ey arambexşê dilê Enlîl, Şûsinê min.”

Bi ihtimal û texmîneke din dibe ku wiha be jî:

“Ey arambexşê dilê Enlîl, Sosina min.” Wê çaxê
wate û helbest serûbin dibe. Wê çaxê du ihtimal
hene. Yan beşa pêşîn a helbestê ji aliyê Sosinê ve ji
bo Xwedawendê Bayê Enlîl hatiye nivîsîn û dawiya
wê ji aliyê Enîl ve ji bo Sosinê hatiye gotin. Îhti-
mala duyem jî ev e ku helbest bi giştî ji aliyê Enîl ve
hatibe nivîsîn û şaş hatibe deşîfrekirin.

Hin çavkanî jî dibêjin ku keçek ji bo qiralê su-
merî yê bi navê Şûsin tê hilbijartin û serê salê roja

ku wê keçik here odeya wî, jê re vê helbestê dibêje.
Lê ne mimkin e ku keça ku ji bo şevêkê û bê dil di-
yarî wî hatiye kirin karibe jê re hestên xwe wiha
bîne ziman. Lewre hinekî cihê gumanê ye.

Hêjayî gotinê ye ku Enlîl xwedawendekî mersa-
lar û ji xwedawendên serdest ên sumerîyan e. Ew
xwedawendê bayê ye. Li gorî efsaneyê wî jina xwe
Nînlîl xapandiye û berî ku bizewicin, dest avêtiye
wê, tecawuzî wê kiriye. Lewre ji diwana xwedawen-
dan tê avêtin û wî dişînin alema navîn.

Lê çî dibe bila bibe, kê ji bo kê nivîsîbe ne girîng
e, ya girîng ew e ku lêkolîner dibêjin ev helbest jî
aliyê jinekê ve hatiye honandin.

Çavkanî:

*Gotara Roberta Binkley 1998 ya li ser
Enhêdûanayê ku wêne bi destûra muzeya
Pensîlvanyayê weşandiye.
Mîtolojiya Sumeran, Samuel Noah Kramer
Ozgur Polîtika 11.07.2003, Ahmet Kaya*

Ji Semsûrê hinek gotinên pêşîyan

- ✓ Aqilî li hustî êqil e.
- ✓ Ardê xwe yê pêtiye, kepeka
xwe rêtiye.
- ✓ Bavê rezeq daye lawê xwe,
lêwîk cirtiyek nedaye bavê.
- ✓ Bi dînî dike, bi bîaqilî dixwe.
- ✓ Bi kerê nika diçe kuriyê.
- ✓ Bi zîkê bê xwê tirê şor dike.
- ✓ Çar çarşemiya xwe giş
dikeve hev.
- ✓ Demeka gulana e, yeka şîla-
nana e.
- ✓ Dest dêst zane.
- ✓ Destê vê ne yê çinkirinê ne.
- ✓ Dûrow nûrow.
- ✓ Gewinde tim kufteyan nax-
win.
- ✓ Her ku em gurê (xwadî
kirin) dikinî gurî dertênî.
- ✓ Her ku kûçik rewiya derkevî,
her ku ba hat berkevî.
- ✓ Hesp li şûna kerê nayê girê-
dan.
- ✓ Horsê horsa hene.
- ✓ Ji gur re şênîyê dike, ji şivên
re pêz diçêrîne.

- ✓ Ji mirinê wê de rê, ji dogehê
(cehenem) û wê de cih tune ye.
- ✓ Jina bêar tim keçik e, mêrê
bêar tim lawik e.
- ✓ Kaxê neke bin axê.
- ✓ Keleha ku bi gû çêbibe yê bi
mîzê jî xirabibe.
- ✓ Kerê got tirt, me şîreta
xwe girt.
- ✓ Kêrgo rabû gûyê têjî hat.
- ✓ Kevirê sivik î tim bi gû ye.
- ✓ Kirow vêsîyow, gotow westi-
yow.
- ✓ Ku aqilê meriya hebe dinya
zêr û zîv e, ku aqilê meriya
tune be gû û rêx e.
- ✓ Ku bizin bi dizî were dewar
jî yê eşkere bizê.
- ✓ Ku rûnê gewinda pir dibin li
saqê xwe didin.
- ✓ Ku tu kûçika bibirî nabin mî.
- ✓ Kurik tune bimêje, mêrik
tune bikoje.
- ✓ Kurmancî têr e, xewê pê re
xêr e.
- ✓ Mala bûkê dol û zirne, mala

- zavê halê (haydar) nîn e.
- ✓ Mala milan e, giş şûna
cilan e.
- ✓ Mala tûya bişewite, ya hêjîra
jî jê re.
- ✓ Mêr ne yê mêrkuj in,
tehn ê mêrkuj in.
- ✓ Milamet cihekî silamet.
- ✓ Nanê bi nanê ye.
- ✓ Neke kesê kesî re,
namîne pisê pisa re.
- ✓ Piştî xwe nede diwarê
ji xilik.
- ✓ Roviye geriyayî, ji gurê
ketî çêtir e.
- ✓ Şîrî kêçê yî li behrê feyde ye.
- ✓ Tekerê gir li dû yê biçûk
diçe.
- ✓ Xeta xar ê di sitûyê gayê
pîr de ye.
- ✓ Xewa miriyan tê lê ya
birçîyan nayê.
- ✓ Yan ji qocê yan ji boçê.

**Berhevkar:
Zekî AKDAG**

Ez ê rûyê te li dilê xwe bideqînîm

Xezal Meral DÊRIKÎ

Şev bi ser min de dadiwerive
 Û bi stêrka xwe dirijim,
 Nava bejahiya tenêtiya xwe.
 Di vê çolbeyarê lalûte de
 Ne bi tenê me bi tenêtiya xwe re,
 Êş, rêhevalê min ê dilsoz e.
 Ji bo êşa ku li min dixilxile bitemire,
 Ez ê rûyê te li ser dilê xwe yê wêran bideqînîm
 Û ez ê stranên temenê xwe yê windayî
 Di bêdengiya rengê şevê de bixeniqînîm
 Erê,
 Îşev jî ez neyara şevên bê te me
 Çekên min; jî helbestên qedexê mertalek
 Û jî bîranînên sêwî şûrek e
 Ez ê xwe li hemberî neyarê zordar
 Heta ku dilopeke xeyal,
 Û firek hêvî bimîne biparêzim.
 Lê dizanim, weke her şev îşev jî
 Ez ê bi ser nekevim,
 Dîsa têk biçim.
 Û dîsa
 Di tunebûna te de; bi hezar caran,
 Bê navber, bê merhamet,
 Bi hesreteke tûj û zengarî bêm kuştin.
 Bi hêsirên hêviyeke rûveqelaştî,
 Di sibehên mirî de bêm veşartin...





ar-da JANXWAR

Pirtûkxaneya gund

Tîrêj, wextê xwe piranî li ber garana çêlekan derbas dikir û pirtûkên ji her celebî ji pirtûkxaneya Ferat dianî û di nav bûyerên mijarên wan ecêb de xwe winda dikir. Helkehelk jê dihat, ji xwezayê lawirên hûr berhev dikir. Di tûrikê wî de tim û tim pirtûkên zarokan ên bi xêz, çend qijotên şewitî, pênuşa reş, çend rûpelên spî, qalik û bazikên kurm û kêzikên ji tûrikên wî kêr nedibû. Dema çêlek, golik, parone, bera nav hêşîna-hiya li dor gund dida. Wextê wî yên vala pir çêdibû. Merama wî pir li ser wênesaziyê hebû, ji xwe re tehtikekî pehn didît û ji ber xwe ewilî qalikê kêzika xalxalokî derdixist. Wênêyên xalxalokê bi qijotê ji arkotên ardûyan mabû li ser tehtikên fersînî xet pêdixist. Ji xwe re digot "Gerek ez bibim wênesazekî pir navdar. Fêhma wî ya wênêçêkirinê ji berê ve hebû, li ser heriya nedawî sûretê xeyalên xwe bi darikên serê wan ziravik xêz dikir, li ser tehtikê ripirast bi qijotê şewitî wênêyên gundê xwe daxik daxikî dikir, li ser ava çem a ku di qeraxa gund derbas dibû bi tiliyên xwe yên ziravik navên jê hest dikir di avê de diheland.

Tîrêj, xortekî çiqdargulikî, rûtûjîk û noq bi piştê zeliqî bû. Te digot qey nanê bi deyn dixwe. Dê û bavê wî vî tîfali tim birçî dihêlin. Qet tişteki nadinê. Te lê dinihêrî te digot wext e li hewa bê xwarê. Lê ne wisa bû, ji hedê xwe bêtir çîr û asê bû. Porkûlîçik û gijî bû. Qet şeh nikaribû têkeve nav tayên porê wî. Çavên wî, peqle cih ji birû û mijangên wî nehiştibû. Xwe li rûyê wî, pîja pîja kiribûn. Bi baran hevok bi çavên xwe de diesirand û di bîra xwe de dikewand. Pozê wî yê lûlikî libên heywê tevan, toz û tebar bi dijarî moxil dikir.

Komikek kêzikên soringî bi ber çavên wî ketin. Baş bala xwe dayê: deqên reş li nav deşta soringî hûr û mezin dibe. Xwe nêz kir ku bi komzika li ser hev bi lodî civiyaye ku ji paş ve xwe li ser hevdu kaş dike û bi hevdu dizeliqe. Bi ser û ber xwe li nava pelên tolîkê, xwe li mûyên ser pelên wan dadiliqand. Xwe da ber çimê maşotekî reş û qulrovî û rendelê wî di devê wî de derxist, di devê kêzikên soringî bû serpi û hêtikê nermik ên bê hestî dabehiland. Tenê çermê reş di nav pê-

çiyên wan de ma. Ew çerm ji ber bayê ji devê wan ê çetelî dipengizî mîna kona bi ser wan ew hinek di-pêçiya. Hinekî ji xwe bi dargulikên tolîkê yên li ser rûyê erdê belav bû girt. Xwe li ser pelên hîn nû ji kulilka xwe derketibû, xwe li tayên kulîlkê li ser hevdu diçerixand. Lê sê heb ji dawiyê bi hevdu zeliqîbûn. Yek a xurt herduyê lawaz bi dû xwe kaş dikir. Di nav qirş û pelên hişkolekî û kevir û bixurên ser noq, tûjîk, gêsreyî de inteinta wan bû. Tîrêj, ji cihê xwe rabû û di ber xwe de got:

-De ka bise! Ez we têxim nav rîya ripî rast. De ka were li ser pêçiya min û ez we çend kêliyan têxim vê kortika di kevir de hatiye kolandin. Him hûn ê xwe rawestînin û rihet bikin, him ez ê ji çend sûretê we li ser qaxizê şanî bikim û xêz bikim. De xwe kil neke ha.

Tîrêj, xwe dirêjî kêzika tolîkê kir û ji hundirê çehla di kevir de derxist û ew bi halê xwe ve hişt. Ji pirtûkxaneya Ferat pirtûkek anîbû. Hevalekî wî berê xwendibû, pir qala vê pirtûkê dikir. Peroşiyek pêre çêbûbû. Wexta ku pirtûk xist destê xwe ji peroşiyê, nav dilê wî dihat xwarê û diricîfî. Kêliyê berî kêliyê naxira çêlekan li mehra gund pehn kir, di ceher de, pirtûka bi neqantî derxist. Pirtûk da aliyekî, ewil cihê xwe repin kir, piştî xwe da kevirekî di talde û ser wî repin cihê xwe lê xweş kir. Axpînka xwe amade kir û tê de mexel hat. Pirtûk da li ser pêçiyê xwe û rûpela ewil zivirand. Berga pêşîn qeliband.

-Aho! Bavo ev çi ye? Xwe veşêrê! Bêhna xwe biçî-kîne! Bila bi te nehese! Bi Xwedê bi me bihese parçeyê laşê me yê mezin guhê me ye ha! Li ser tutikan rûnê. Xwe bide paş vî kevirê aliyê min. De zû! Dûxana ji devê te dihere hinekî di hundirê xwe de bigewîminî û hêdî hêdî di ber xwe de berde. Herdu destên xwe bike lûlik û bide ber sêrmiskarên devên xwe ha! Av di devê min de miçiqî. Ez ji tînan mirim.

Du kesê sercimcim, devnepox xwe ji neqebên bin erdê bera nav kevanê reştarî dan. Bi bez gavê mezin diavêt. Baçemêlken mîna qertelan bi refan ji newalên tarî û şikêran xwe li bin guhê hevdu dixistin. Çîrûskên rojê û tîngerm di qul û qewarên beştê di şikeftê de xwe di çavnûtikên baçemêlken qeretelî de taldemişt dibû. Bîbîkên çavên wan şew didan. Ji biriqandina çavên wan ên ewrahî, tirs û xofê xwe li nava mirov digirt.

-Kuro! Mehr di bin kevir de ye. Xwe tevne. Wê me gez û hepû bike. Çoka xwe di ber xwe de bikîşîne. Lê miqate be. Bila ax û hîncir ji ber pêga te nefire ha! Serê pozîkê li wî bixurî bide û hêdî ber bi binê kevir de

bibe. Kuro ez çûmmmm! Tu dibêjî çi? Xwezî tu di şîna min de bûya. Ezzzzzzzz çûm çûm ha! Haho! Kuro bi min bigire ha! Ez bê taqet mam. Çermê pêçiyên min semitî. De zû hey xenîr! Kevir ji bin piyên min çerixî û gindirî. Maşalê bê deng xwe bera binê şikeftê bide.

Kevir gindirî gindirî got pelec, li nava komzîka wawîkan ket. Wawîkek bazîkê wê qitîl qitîlî bû û bê serî xwe li bin guhê dîwêr xist. Serî lê werimî. Serên wê gêj bû, bê rih ji jor ve hat xwar. Bi terqînî li gerîneka avê ket, peşk û dilopên avê bi hewayê ket. Olan li binê şikeftê veda. Her du merivê serberoş di cî de veciniqîn. Li dû xwe nihêrîn.

- Me pê girt! Ma morîkên diya me li vir qetiyabû lo! Me da pê vana û em bi dû wan ketin. Bi me bihese tu kes jî nikare xwe bigihê me! Me bi destê xwe gû bi xwe da. Kuro ma çima deng ji te nayê. Ji tirsan ziravê min jî qetiya. Lê mirov piranî ji te ditirse. Ma te di bin xwe de berda. Kuliya zimanê te xwariye kuro tû bû mîna peykeran, ne def ne deng ji te tê? Ka te digot: ez karim qiloçê xwe li her kendalî bixim. Ev ne fen e ev çi ben e kuro.

Mûyên porên wî bûbû şûjin. Gopalê dilên wî mîna li daholê bixe, girmînî jê dihat. Dikira ji qesefa sînga wî bazbida. Peroşî û kelecana pêre gihîştibû asta herî bilind. Bibîkên çavên wî, bûbû mîna qula fireh û weke şaqûlê kevirîn mezin dibû. Şirîniya avê mîna mezbîbê ji canê wî dihat. Cihêkî ziha tê de nemabû. Bi vê oxira ne baş ve, tewê şa gurçikan di ser de hatibû. Mîzlûlên wî, ew diguvaşt. Mehdê wî, li hevdu diket. Zextên êşê hêdî hêdî ji noqê ve xwe ber bi hişê wî ve radipelikandin.

-Ev çi pelçînî ji binê vê şikeftê hat hevalo? Kes me naşopîne kuro! Hela wa kîsikên di lepê xwe de dîne. Em li dora xwe guhdar bikin. Ne tiştê e lo! Ma wê çi be ji xeynî me gelek teyr û teba, baçemêlk li vir hene. Ma telqtelqa bazîkên qertelan nayên te! Heye tune ye ji devê qertelêkî mezin wawîk pengîziye û di ava binê qewarên şikeftê ketiye. Lo nebêjee tiştê tune ye. Ka em di riya xwe de herin. Lê wer xuya ye berî me gelek kesên din jî hatine vir. Li xezîneyên zêr û zîv, elbîkên dîrokî, cêrên li ser wan wêneyên qîzan hatiye xemilandin geriyane, tev şikenandine, pir heyfa wan e, te ev kortalê kûr dîtiye. Edem kirine. Ev cihê ji gel û neteweyên kevnare mane. Çi cihêkî xweş her tişt ji piyên xwezayê hatiye afirandin. Dilopên ji keremkортên diwarê şikeftê dadiwerivî mîna şûşeya camê pê ve alîqiyaye.

-Aho gurçîk bi min ariya. Ezê çi xweliyê li serê xwe bikim. Ez nikarim xwe bigirim. Piyên min hêdî hêdî ji bin laşê min dişeqite. Ka ez çi bikim de zû bibêje. Zîkê xwe bi halê xwe neşewitîne lo! Ka destê xwe biavêje ev çemîkê kevirê li ser tenîştê destê te yê çepê. Serê xwe rake lê binere ha! Ma te ji tirsan di xwe de rît lawo! De hinekî cilhet di nava xwe de bigêrîne. Hinekî din jî.

Pîçek ma ha! Li dû xwe nenihêrê, wê serê te gêj bibe. Hi wa ye te xwe xelas kir. Ox min xwe ji vê çêhlê xelas kir. Çi xweş e azadî.

Her du hevalan xwe dan kêleka kevir û li ser qûna xwe rûniştin. Bala xwe da bin kevirê ku mehrê wan di nav kûloriya laşê xwe de, her du çavên xwe yên mîna tehewê bi melûlî li wan dinihêrî. Bîskeke xwe rihet kirin û li qulika çavên hev du nihêrîn hevalê wî yê gurçîk pê diariya, êşa gurçîkê derbas bûbû lê çi ava di laşê wî de gewimibû di bermîsk û mîzdanka wî de kom bûbû, berê xwe da li ber hîncirê ku ew ji kendalê bê binî xelas kir û pêşboriya xwe bi moxilî li ser serê kirm û kortîkên kevir da rêşandin.

-De ka em herin li çavê min nenihêre. Dawîkê çi bi te bê, nebêje belaya te ye. Te em anîn vir, ha ev biryara me her duyan e temam. Êşa gurçîk li te rabe jî tu bi paş ve venegerî. Tu kor û poşman î? A niha bibêje. Me xwe hîn negihandiye devê şikeftê. Em dikira di gerîneka binê kendalê wê de tê wer bibûna.

Her duyan xwe dawêşandin. Şopandin û pêkolya li du her du zîlamê li pêşîya wan. Bi lez û bez ber bi kûrahiya şikeftê de wenda bû. Ji ser serê wan çûbû û bi xwe biliyabû. Lê carna jî dihat bîra wan digotin: "Gelo ew her du zîlamên di pêşîya me de. Ew çi bû? Di kîsê wan de bû?" Lê hîn wisa difikirî. Gava gavên xwe avêt devê şikeftê, hew dîtina dît tûlekî har bi bezeke xurt, bi çar gavî, bi ser wan de firiya xwe avêt derveyê şikeftê. Lê gava bi ser wan de beziya çû, girêzeke bi kef, peqîk jê difiridî li ser zîroyên di bin axa şîl de cotên xwe dikir li ser wan diket. Ew li wir difiridand û sorahiyeke zingarok li dû xwe hişt. Dûxana kela li ser goşt li devê çavê her du zarokan de, xwe li birma bîra wan girt û ramane wan xumam girt.

-Aho ev çi bû! Ev tûleyê kûçîk ji me re ji ku derket. A çê hebû ku em nedît. Ku em bidîta. Wê em çênî çênî bikira. Vî mîratî çi xwariye. Pîçek girêza wî zîroyê reben yê di bin axê de pirtik pirtikî kir. Em çi bikin. Hîn me nû gotibû bismillah. Hevalo de ka em serê xwe bi dizî ber berjorî derî ve bikin, bê ev tûle çi dike.

Lê çawa serê xwe derxist. Kûçîk bi xwe û şeplepê ketibû. Li dor gihayê şîn xwe vedigevizand. Bêvila xwe xiste axê û bi nahperûşkan dikole. Lê dev ji wir jî berda. Çû li dora gihaya kîrkê kero sekinî. Bêhn kir û berê bêvila xwe ya rêşayî da ezmanan. Ji nişka ve zîlika şûrkiya ya kîrkê kero ji nav pelgehên şîn de hilqitand. Mîrçemîrç ji devê wî hat. Kef û girêz ji mûyên bêvila wî diniquftin erdê. Lê çawa xwe digihand erdê. Mîna agir bi pirêzeyan bikeve. Erd dikizirand. Kurm û kêzên di bin axê de dijiyan li ser girêza kelbê dipijiyay qijeqî jê dihat. Hêdî hêdî rakişandina rehên laşê wî sist bû. Ziman tevîzî. Belqînî ji zengolorkê hat lê bê fêde bû. Palikên çavê wî zor lê bir. Her çar pêgê wî di bin de fi-

siya. Nûrîniyek bê êş ezirî, mîna petêxê xerabûyî di cî de ket erdê. Pîjîni ji dawiyê hat. Virika wî bêhna bera-
teyan li dor belav kir. Ziman ji devan rakişiya. Gom-
zîka mêşa genî lê civiya. Lê nikaribû xwe tev de bida.
Nermikên canê wî şeqşeqî kir. Kerînekên çavên wî roj
tarî dinasiland û dadinasiland.

-De rabe em ji bêhnan fetisîn ev çî bû. Wextî kezeba
me di devê me de derkeve. Ho hela ho! Bê ka em ê çî
bibînin û çî nebînin. Min fêm nekir ev kûçik di hundirê
vê şikeftê çî digere û çî xwaribû. De ka bimeşe em
herin, bimeşe, li çêhlê miqate be. Xwe bi kevirên xaro-
maro bigire, bimeşe bimeşe li dû xwe nenihêre ha!

Her du zilaman kîsên xwe rahiştên. Amadehiyên
xwe kirin. Kehrîbaya destan da zaboqên bilind ên ji
wan berjortir. Baçemêlkên şewqa kehrîbaya destan li
ser çavên wan nûtik disekîni ji cihê xwe tev nedilivî. Lê
ne yek ne dudu bi hezaran baçemêlk li vir bûn.

-Hevalo me ji xwe re lêxistê. De zû! Şiranqeyê û
derziya şiranqeyê bîne û wan morîkên em bera nav
avê bidin. Hebikekî bilezîne hîn kesekî em nedîtiye.
Em karên xwe zû bikin ji vir derbikevin. Em ê kari-
bin rihet û bi hêsanî ev tebayê ku tên vê derê û hemû
cureyên cihê warên din bişopinî. Ku ev azmûne bice-
ribe, emê bi nav û deng bibin, ku neceribe ji bi xêra
van çîp û morîkên me, emê karibin wan bişopinî.
Der û dinê ji wê, di bin lepê me de be. Ku xerab bi-
çêre, hûhûk bi tû lawirî namîne. Hilm bi ku de here
di cî de tevnagere. De ka te dagirt şiranqeyê? Ez ê
şewaa kehrîbayê bidim ew çavên wan ên nûtikî û
rengewrî tu ji bera newqa wan bide. Jixwe av xwe li
germahiya laşê wan digire, li gorî germahiya laşê
wan ev xebat hatiye kirin. Çawa bişkok xwe li laşê
wan bigire û têkeve hindir qet tiştek bi wan nayê.
Tenê wê wextekê ji ser xwe here û wê dîsa mîna berê
bibe. Xwîna wan dê xwe li bişkokê bigire û wê di nav
xwe de vegezîzîne û bihelîne. Him em ê karibin cihê
wan fêr bibin. Him ji wê xwîna ji dê û bavên wan tê,
wê di laşê wan de bê qelibandin. Bi taybetî ya rona-
hiya çav hêdî hêdî wê bê guhertin. Yên bê guhertin
wê karibe here derve ji. Ev ji tê wê wateyê ku baçe-
mêlk wê bi hêsanî karibin bi roj ji derbikevin derve.

-Derb bi ser hev nîşanî wan girt û got, teq teq teq
de berdiyê. Li ser hev berdiyê. Min ji te re şewqa daye
çavên wan ên zingarî. Çî bû ma derbên te li hev sar
bûn mehrûmo!

-Bi Xwedê min li çil, pênciyekî xist, te dît. Way tev
weke berateyan li erdê mirar bûne ha.

Miradê dilên wan bi cî hat.

Her du zarokê biçûk bi reteqa hev ketin û xwe bera
neqebên şikeftan dan. Bala wan kişandibû û ji xwe re
digotin: Çima ev kûçik ket vî halî? Çima pirça xwe ji
êşan rewisand?

-Law te dît ev se bê ketibû çî halî. Hevalî got,
hela huş bb ev çî ronahî ye di binê kewarên şikeftê
diçûrise? Kuro ev çî bêhn e? Ez fetisîm! Bêhna genî
ji hêla ronahiyê tê. Sûra bê li ser çavê min bawêşin
dike. Ev ew her du zîlam tişteki dîkin. Ka hînekî
din em herin nêzî wan bibin. Hîn wisa difikirî refek
baçemêlkan serserî xwe li ser çavên wan xist, feleka
wan şaş bû. Ronahî di çavên wan de nehişt.

-Aho! Ez ber xwe nabînim ev çî pirik bû em ke-
tinê. Ka destê xwe bide min û em birevin. De bireve,
ker dikeve heriyê ji xwedî bezatir tune ye û li dû
xwe nenihêrê.

Hîncir ji ber piyê wan filitî û gindirî nava qûl-
têna avê bû, olên bi şid ji kevirên hesînî di şikêrên
şevtarî de belawela dibû.

-Ihe! Me xwar! Hinek li dû me ne. Ev çî deng bû
hat hela ka şewqa ronahiyê bidiyê, ji cihê deng jê
dihat. Hevalî wî gote, Ma kî dibêje me karê xwe qe-
dand. Lê dîsa ji bila kes bi me nehese, em hatine vir
de ka em herin lê binihêrin.

Bavê Tîrêj li paş lawê xwe sekînî û pelqîniyek li ku-
çika stû dada, agir ji ber çû û dest bi nifiran kir.

-Hey dewar, tu bi qurbana çêlêkên xelkê be. Ma tu
hatiye ber dewaran, yan tu hatiye pirtûkan bixwînî? Ka
dewarê tu li ber? Yê hatine malê ketineser ceh, yê
hatine bi ser golikan baniyane, yê ketine ceh û ge-
nimê xelkê. Ev Feratê gund li serê me bû kîrê kûçik.
Zarokê gund ji ber deriyê wî kêr nabe. Li malê xwe
venahewe. Tu dibêje qey me zarok ji bo şewra pirtûkên
wî anîne dinê.

Ferat, ji gund bû. Beşa ragihandinê kuta kiribû.
Bi pê wê re beşa wênesaziyê qedandibû. Nediket
azmûnan. Tenê li gundê xwe baniyabû. Pir pirtûk
dixwend. Ji her cureyî pirtûk li ba wî hebûn. Ji xwe
re pirtûkxane ava kiribû. Jixwe zarokên gund û der
dora gund giştik dihat li ba wî pirtûk dibirin û wî
odeyek ji ji bo şîrovekirina xwendina pirtûkan ava
kiribû. Yê pirtûk bixwendina ji bo bi ya din bigu-
here û rahijê yeka din ewil ya xwendibû ji hevalên
li wir re şîrove dikir. Dibistanê derdora gund ew ji
xwe re kiribû çavkanî. Mamosteyê dibistana gund ji
dema bê derfet dima ji pirtûkxaneyê Ferat mînak
dida û berê wan dida wî. Ferat ji gund dervediket.
Ferat, debara xwe bi xwedîkirina çend terş û tilû-
şan derbas dikir û qatixê jê dihat nêviyê pir dida
xwaringeha li ser rêya bazirganiyê.

-Şewitî şewitî, haho gundîno! Zarokino! Gencî-
neya pêşerojê şewitî, tehb û keda hezar salan bînpê
bû. Avê bînin.

Gundî û der û dor li dora pirtûkxaneyê civiyan
lê bê fêde bû, tenê pirtûkên nîvşewitî û qijotî di
destên wan de ma.

Pêgirî li cem Hacî Qadirê Koyî

Nîmetulah Hamid NIHÊLÎ

Edebiyat ew cîhan e ku nivîser û edîb xwe tê de azad dibînin û xwe ji hemû sansûran rizgar dikin. Lewre peyama nivîser û edîban bêtir nêzikî rastiyê dibe, çûnkî ew derbirîne ji helcûn û hez û xwestekên xwe dikin zêde barî, hêvî û armancên miletî jî dûr ji berjewendiyê ne. (Helbet hindê kesên berjewendîxwaz jî hene.) Her ji ber vê çendê ye jî ku gotara nivîskarên rast û dirust ji gotara siyasetmedar û aliyên din cuda ye. Çûnkî ew pêgirî bi çi bihayên din yê madî nabin. Belkî mebesta wan a derbirîne ji cîhaneke taybet e ku hemû hêvî û daxwaz tê de bi cih dibin. Ji bo ku babetê xwe pêtir ronî bikin dişên bi-bêjin ku pêgirî di edebiyatê de sê ramanan werdigir. Ew jî bi vî rengî ye

1- Xwedanedest (Teslîmbûn):

Ev e di wê demê de berçav dibe, dema ku edîb an nivîser xwe bi dest sansûrê ve berdide û dibe êsirê sansûrê û hemû derbirînen ew dibêje nûneriya xwestek û cihanbîniya wî nakin. Belkî ew di wê demê de dibe amûreke di dest civak û aliyên siyasî de û peyama wî jî bo ritûşkirina xirabiyên ê din e û ew dibe girtiyek ji bo gihandina peyamên din. Ev carê di wê demê de nivîser û edîb kesayetiya xwe ji dest didin û xwendevan jî jê bawer nakin, çûnkî ew di çavên xwendevanan de tên riswakirin. Lewre ev cureyê pêgiriya diçe dixana xiyaretê, nivîser û edîb di wê demê de erka xwe ya rêberiyê, arastekirinê, gi-handina rastiyê ji dest didin. Helbet me di nav edebiyata kurdî de gelek nimûneyên bi vî rengî hene. Lê ev kes zû dimirin û dîrok wan şermezar dike.

2- Bergîrîkirin (Bersivdayîn):

Ev raman e bo wan nivîser û edîban tê jiyîn û berhem, şîyan, zîrekiya xwe ji bo berevanîkirinê miletê xwe terxan dikin û hemû peyama xwe pêgirî dikin. Ji ber vê yekê di xizmeta gel û welatê wan dabe. Ango nivîser xwe pêgirî dike da ku xizmeta doz û armanceke rewa û pîroz bike. Ev cureyê pêgiriya li cem xwendevanan diçe dixana pêgiriya baş û pozetîv. Lewre her dem ev cure nivîs dibin cihê şanaziya xelkê xwe û xwendevan wê pîroz dibînin. Çûnkî ew nivîser û edîbê berhema xwe dixin xizmeta berjewendiya giştî û gelek caran riha xwe jî divê rê dikin qurban. Helbet ev cureyê nivîskaran jî

di nav edebiyata kurdî de dizûrin û ev bûne simbil di nav gelê xwe de.

3- Derbirîna ji cîhaneke taybet û pêgîrbûn di ciwankariya berhemî de:

Merem ji vê pêgiriya ev e ku nivîser û edîb hemû nivîsîn û berhemên xwe bikin awêne ji bo derbirîna cîhana xwe ya taybet an jî bixin xizmeta ciwankariya berhemê. Ango xwe bi çi aliyên din ve girênadin, belkî bi tenê pêgirî cihanbîniya xwe ya taybet û hunersaziya vehandina berhemê ne. Helbet ev kes bi du rîyan vî karê xwe dikin. Ev jî;

A- Berhema xwe pêgirî dikin da ku di xizmeta aliyê ciwankariyê de be. Anku formsaziya berhemê û teknîka berhemê li cem wan ji naveroka berhemê girîngtir e. Lewre xwe pêgirî dikin da ku xizmeta vî layenî bikin. Helbet xwendevanên van nivîskar û edîban taybet in. Bi tenê ew in ên hest bi ciwaniya berhemê dikin û xweşiyê ji hunersaziya wê û ciwankariya berhemî dibînin. Piraniya van xwendevanan pîspor in di edebiyatê de û zanyariyên pir baş li ser şewazên hemerengên vehandina berhemê hene.

B- Berhemê xwe pêgirî dikin da ku di xizmeta hîzr û dîtinên wan ên taybet de be. Anku merem ji berhema wan, derbirîna cîhana wan a taybet e. Da ku xelk ji wê cîhanê haydar be. Helbet zor caran ev cûre nivîskar wekî kesên nercis lê tê û ew xwe ji xwendevanan bilindtir dibînin û berhema xwe weku rênîşankirinê didin xelkê. Lewre xwendevanê van edîb û nivîskaran jî roj bi roj ber bi kêmbûnê ve diçin. Çûnkî xwendevan hez ji azadiyê dike û hez dike bi rengêkî wisa reftar li gel bê kirin ku ew hest bi hebûna xwe bike di berhemê de.

Helbestvan Hacî Qadirê Koyî ji van helbestvanan bûye, ew ên peyama û berhema xwe bi çend rengan pêgirî armancên neteweyî û doza rewa ya miletê xwe kirî. Û zor babet û mebestên cuda di berhemên xwe de bi kar anîne. Wekî ayîn, evîndarî, wesîfkirin anku saloxdan, stayîş anku methkirin, daşorîn anku hecorîna aliyên civakî û niştîmanî şanazîkirin.

Helbet dema mirov jiyana wî dixwîne, xuya dibe ku ew bi xwe kesekî çavnetirs û aza bû. Baweriyeke mezin bi xwe hebû. Kesekî şareza û tégîhîştî bû. Bi hîç rengêkî berhema xwe ji bo xwestek û berjewendiyên taybet bi kar neaniye. Lewre kesekî hejar û

destkurt bû di jiyana xwe de. Berhemên wî bi zimanekî rewan û sade hatine vehandin. Wî zor girîngî daye naveroka berhemê. Lewre berhemên xwe wisa divehand ku xelk hemû jê têbigihên. Helbet wî karî bi çend rîyan encam daye. Em dikarin bi vî rengî berçav bikin:

1- Helbestvan Hacı Qadir weku çaksazekî civakî:

Di vî layenê de helbestvan berhema xwe pêgir kiriye û xistiye xizmeta rizgarkirina miletê xwe, da ku kesê kurd ji hindê derdên civakî yên xerab rizgar bike. Çunkî wî bi çavê xwe didît ku miletê wî yê ji derdê hejarî, nezanî û tepeserkirina jiyane û xapandina miletî ji layê şêx û melayan ve û paşverûtiya civakî dinale.

Van alîyan hemûyan wer kiriye ku helbestvanê me hest bi berpirsiyariya xwe bike û berhema xwe di xizmeta hişyarkirina miletî de pêgir bike. Wî ev kar jî bi çend rengan kiriye. Wekî

A- Girîngîdana xwendin û rewşenbîrkirina miletî. Nexasim di wê serdemê de piraniya miletê kurd ji derdê nexwendinê dinaliya. Helbestvanî dizanî ku bi rîya xwerewşenbîrkirinê milet dişêt doza xwe nas bike û gelê xwe ji bin desthilatdariyê rizgar bike. Lewre dibêje:

Boçî fermûyetî nebe yê emîn
(Utlîbu al'îm weleu bil sîn)
Nêr û mê lem hedîse ferqî niye
Ger mela nehî fermû dînî niye

B- Behsa mizgeftê û xaneqayan kiriye ka çawa mirovên oldar xelkê dixapînin ji bo xwestekên xwe yên taybet. Nexasim di wê serdemê de osmaniyan ev cihên pîroz ji bo serdebirina xelkê bi kar dianîn. Di vî aliyê de helbestvan dibêje:

Xaneqa û tekiyekan yek ser
Pêr bilên nefîyan çîye axir

C- Her wisa helbestvan behsa rola mirovî kiriye û cudahiya çînayetiya di nav civakê de riswa kiriye. Dema dibêje:

Ehlî cennet ne şîwan û gavan in
Sahîbî fen û îlm û îrfan in

Helbet di vî nimûneyê de helbestvanî baş zani-bûye ku zanî û huner rîyên guncaw in ji bo dîn û dinyayê. Çunkî her ew in başî û xirabiyê ji hev cuda dikin û her ew in dadperwerî, rastî û azadiyê ji hev belav dikin.

D- Girîngîdana zimanê neteweyî û xizmetkirina gel û welatî, bi rîya zimanî, li dor vî çendê helbestvan dibêje:

Eger kurdek qisey babî nezanî
Muheqeq daykî hîze û babî zanî

Di vî dera helbestê de diyar e ku ew ê zimanê xwe ji bîr bike û girîngiyê bi dewlemendkirina wî nede, ew ne kurd e û wekî kurd nayê hejmartin. Çunkî nasnameya xwe ji dest daye. Helbet ev bi xwe jî hişyarkirina miletî ye da ku girîngiyê bi kultur û ferhenga xwe ya neteweyî bidin.

E- Pîroziya karkirinê ji bo mirovê kurd. Anku helbestvanî vî rastiyê nîşan dide eger kurd bikaribin ji aliyê madî û aborî ve xwe bi pêş bixin, dê bikaribin xwe ji dûvelankiya dijmin rizgar bikin û bi serfirazî bijîn. Lewre helbestvanî gotiye:

Tembelî kare hîz û bê xêr e
Destî mandû le ser zikî têr e

2- Helbestvan Hacı Qadir wekî niştimanperwerekî:

Xemxurî û niştimanperweriya helbestvanî ji bo vî ye, hindê ku wî hest û sozên dijwar hebin beramberî gel û welatê xwe. Wî hizir li destgirtina mirovê kurd dikir da ku berê wî bide xizmetkirina welatî û hesta neteweyî li cem wan bilind bike. Çunkî wî hest bi êş û janên miletê xwe kiriye û ev hest bûye jêdera îlham û vehandina gelek berhemên hêja li cem helbestvanî. Em dikarin vî babetî di çend xalan de berçav bikin.

A- Behsa dilêrî û azayetiya miletê kurd dike li hemberî dijminan. Dibêje:

Xud dezanin sulaleyî ekrad
Lêrewe bigire ta degate qubad
Be şecaet hemû weku Rustem
Be sexawet hemû weku Hatem

B- Behsê dagîrkirina Kurdistanê kiriye a ji layê osmaniyan û xiyaneta hindêk ji kurdan a beramberî gel û welatê xwe. Dibêje

Munqadî ecem mutiyî rom in
Mehkûmî xerat û hîz û dum in

C- Behsa hevnegirtina miletî û jihevqetandina kurdan dike. Vê yekê wekî êşekê di cergê miletî de destnîşan dike û amaje didiyê vî yekê ku kurd bêtî yekgirtinê nagihên çî destkeft û armancên xwe.

Ta rêk nekewn qebîlî ekrad
Her wa debine xerabe abad
Bê eger destî yektirî bigirin
Wek Îskender cîhan hemû degirin

D- Behsa rizgarkirina miletî dike bi riya çek û qe-
lemî. Anku divê kurd şareza û hêzdar bin da ku
bişên xwe rizgar bikin ji dijminan.

Beşîr û xame dewlet payedar e
E min xamem heye û şîr nadiyar e

Bi vî rengî bo me diyar bû ku helbestvan ji wan
helbestvanan bûye yê ku berhema xwe ji bo doza
miletê xwe pêgir kiriye û wî xwe pêgir didît wekî
rewşenbîrekî ku miletê xwe hişyar bike û ji derdê
gelek xirabkariyan rizgar bike.

Helbet ev karê helbestvanî bûye egerên vê yekê
ku milet her dem berhema wî bi bilindî ragirin û çî
caran ev cûre mirov di wijdana gelê xwe de berze
nabin. Çunkî ew şiyaye hest bi nexweşiyên miletê
xwe bike û bi rastgoyî derbirinê ji xwestekên
wan bike.

Refek çûk

Robîn ŞERNA

Ji bo komkujiyên li welatê min...

Refên çûkên dahfquetandî bûn em
Tê zanîn; ger ku her çûk bi refên xwe re bifirî
kulîlkên di biharê de
xwe helalkirine me dişitiland
di mişareyên berkurkên xwe de
Dengê diranê seydvaniya di guhê me de olan dida
Bi bermîlên çarçemil em bi ser mirinê de dirijîyan
Te ewr biguvaşta dê gule jê biweşiya
te ax biguvaşta dê qêrîn jê bazbida

her ku em difirîyan
bi hêzan bask dixemilî
bi şewata berfê dinixumî canê me
hinekan ji me hêkên xwe bi şemir hiştibûn
hinekan ji me hêlîn heram kiribûn
hinekan ji me jî
hê bihar bi firê nedîtibûn

Nalîna kêran di stûyên me de diricifî
Şorteşorta girêza kentaûran û mînotauran
Dibariya bi ser baskên me de

Refên çûkên tahfquetandîbûn em
Li pey evîna simirmir
Bi refekê, du bazik û dilekî
Rengo rengu
Ji pelên payîzê...

Refên me di ser welatekî
Çemên wî sor diherikî re dixericî
Sergoyên sorxeniqî
Bîrên tîrşîn difûriyan dabûn girî
DNAYên kulîlkan bi xwînê hatibûn avdan
Mutasyonên sor derbas kiribû biharê
Kulîlk sor,
Giha ji xwînê

Em rêwiyên azadiyê bûn
Lê azadiyê ji asûmanê vî welatî jî bar kiribû
Warê Xwedê bubû, wargeha kundan
Bayê kur xwe di erdê de dixişand
Dahola mirinê lêdida
Perikên me merisîn
Zikên sergoyan qelişîn
Devên bîran felişîn
Kentaur û mînotauran
gulebaran verdisîyan
Li me hatin xezebê
Wek paçikan yeko yeko em hatin xwarê
Û dawiyê kenîyan kentaûr
Halan didan mînotauran
Bi serfiraziya xwe dilşa bûbûn
Sal bi ser wan de herifîn
Bi goştên me kerifîn
Di dawîya dawîn de
Kentaur bi kenê xwe fetisîn
Mînotaur bi goştê me biecîn...



Ey dîlber

Bahadîn ROBAR

Ey dîlber xelk dibêjin tu bê war î
Li ser rûyê te danîne rengê tarî
Tu tê kuştin her sal sed carî
Ey Dîlber, tu xaka min î.

Li singê te çend gule zengarî bûn
Ji xwîna te robar sor, asîman tarî bûn
Lê diranên te dur, biskên te mirarî bûn
Ey Dîlber, tu maka min î.

Li ber bêhna te cendekên şêran
Çi li mizgeft, laliş, hawra û dêran
Koviyên har sedan sal li ser te çêran
Ey Dîlber, tu şebaka min î.

Ji şîrê te çend kerî hatin xwedîkirin bi hawî
Goştê laşê te dixwin bi xavî
Bo min nîn e ji bilî wî şîrîn navî
Ey Dîlber, tu felat û helaka min î.

Mêvanan bê destûr ji xwînê mey kelandin
Dizekan, sêwelekan mal û malxwê helandin
Li ser singê zêrîn koran dest pelandin
Ey Dîlber, tu reşçavka min î.



ser-best

Berçema M.


tu tişteki min ê ku winda bikim nîn e
niha dikarim
riya herî zehmet bineqînîm
sola xwe bişidînîm
û qedera xwe biguherînîm.

tu tişteki min ê ku winda bikim nîn e
niha dikarim
serî li ber sazûmana herî bilind hilînîm
zincîran bişikînîm
û dîrokekê binivîsim.

tişteki min ê ku winda bikim nîn e
niha dikarim
êş û êşkenceya herî giran bibînîm
dengê xwe jî nederînîm
Pêçiya xwe jî nelivînîm

tu tişteki min ê ku winda bikim nîn e
niha dikarim
pênûsê bişikînîm
lembeyê vemirînîm
û zemên biterikînîm.

tişteki min ê ku winda bikim nîn e
niha dikarim.....
.....hetka xwe bînim.



Heke hûn li vî çavî bimeyzênin çavên we dikarin kor bibin. Ji bo vê jî heke hûn jixwe ne kor bin li vî çavî nemeyzênin.

Di vî çavî de roj ji zû ve çûye ava. Ji ber vê jî li şûna ronahiya çavan niha tarîtiyeke zilûmat zal e li vî çavî.

Ma vî çavî çî dît û çî nedît!

Her çiqaşî vegotina çîroka vî çavî dijar ji be ez ê hewl bidim çîroka wî ji we re bibêjim.

Di destpêkê de divê bibêjim ku ev çav xewnan nabîne. Dest ji dîtina xewnan berdin nizane ku çav xewnan jî dibînin. Nizane ku şiyana herî mezin a çavan dîtina xewnan e. Vî çavî jî bîr kiriye ku çav xewnan dibînin. Bîra vî çavî hedimiye. Tu şop û dewş ji vî vî bîrê lê nemane. Heke hûn di guhê vî çavî de navê “xewn”ê bipistînin wê tu tişt bi bîra vî çavî neyê, wê tu tişt li ber çavê vî çavî çênebe. Loma tu beramberiya navê “xewn”ê di bîra vî çavî de nîn e. Ji bo vî çavî “xewn” tenê peyvek e, tenê dengê e; peyveke kelevajî û dengê ne xwediye tu wateyê.

Ev çav tu caran çav li xweşikahiya ezmên neke-tiye. Nebûye govanê bêserûberiya ezmên. Nedîtiye ku li ezmên stêrkên bê hejmar di govendekê de ne.

Di vî çavî de ezman çûye xwarê. Hemû stêrkên li ezmên ji vî çavî xuricîne. Ji bo vê jî di vî çavî de hûn nikarin bi qasî serê derziyê jî şîna ezmên û ronahiya stêrkan bibînin.

Ev çav tenê rengê dinase; tarîti. Ew qozeqera rengîn nizane.

Hûn dibînin? Di spîka çêv de jî spî nîn e?

Ev çav wekî du qulên tarî yên ku ber bi tunehiyê ve dirêj dibin in; du qulikên ku çî tiştên tene ber wan bi yek carê re diqurpîne.

Ev çavê tarî û bi sehwa ji ajalên re bûye lîseke bi ber.

Li vî çavî kwîtina marên pêvedanê tim li dar e û ev marên li vî çavî qîlên xwe yên wekî alan tim li ba dîkin û serî li ronahiye dihejin. Li vî çavî dûpişkên reşqetranî derzîkên xwe yên bi jehrê dagirtî sû kirine û kêliyeke din dîsa wê hemû jehra xwe va-

layî vî çavî bikin.

Ev çav sîsika gerdûna jêr; sîsika gerdûna mirinê; ya dojecha tarî ye.

Ev çav çavê kê ye? Çima wilo li vî çavî hatiye? Kê wilo li vî çavî kiriye? Ku devek devê xwe di guhê vî çavî re bike û rewşa wî jê re bibêje gelo ev çav wê dengê vî devî bibihîse û pê re jî ji xewê; ji xewa bê xewn hişyar bibe?

Ez bersivên van pirsan nizanim. Lê ku ji we re bibêjim, tê gotin ku demekê roj li vî çavî hilatibû. Ew dem kîngê ye nayê zanîn. Tê gotin ku vî çavî çav berdabû ezmên û li ezmanê vî çavî bê hejmar stêrk hebûn. Tê gotin ku wê demê li ezmanê vî çavî qozeqerek hebû û hemû reng li vî qozeqerê hebûn.

Vî çavî wan deman xewn didîtin. Piştî roj bi roj, roj ji ezmanê vî çavî çû ava û kete vî halî û bîra xwe winda kir.

Niha ji vî çavî we ye ku ew tim û tim di vî rewşê de bû. Niha ji vî çavî we ye ku ji bilî tarîtiyê tu rengên din nîn in. Jê we ye ku li gerdûnê ji bilî mar û dûpişkan tu ajalên din nîn in. Wî çivîkên ku per û baskên xwe bi nav şînahiya ezmên de berdidin ji bîr kiriye. Guhên vî çavî ji bilî kwîtina dengên marên reş tu dengê din nabihîsin.

Her ku diçe ev çav mezin û firehtir dibe. Her ku diçe qulikên tarî yên vî çavî nêziktirî tunehiyê dibin. Ev çavên tarî her ku diçe tarîtiya xwe di hemû organên xwediye xwe digerin û dike ku xwediye xwe jî biqurpîne.

Kurteyek ji jiyan û wesiyetnameya Gîw Mukiryanî (1903 - 24.07.1977)

Amadekar:
Dêrsim OREMAR

Jiyana Gîw Mukiryanî

Navê wî yê rastîn "Ebdulrehman Letîf Îsmail Ebdula Letîf" e û di sala 1903'an de li bajarê Miha-badê ji dayik bûye. Di sala 1913'an de tevî birayê xwe, Husên Huznî çûye welatê Şamê û heta sala 1925'ê li Helebê maye, xwendina xwe ya destpêkê li Helebê û di sala 1925'ê de çûye Beyrûtê û li zanîngehekê de hîni bîngehên fransî bûye. Di sala 1915'an de birayê wî mekîneyeke çapê li welatê Almanayê kiriye û li bazara Helebê daniye. Di sala 1925'an de tevî birayê xwe çûye Îraqê û demekê li bajarê Bexdayê mane, di heman salê de li ser dax-waza Seyid Taha Şemzînî (Nehrî), ku wê demê qay-meqamê bajarokê Rewandizê bûye diçin wê derê û livê çapxaneyekê li dadimezirîn. Di navbera salên 1926 û 1932'an de hevkarê Huzniyê birayê xwe û rêveberê kovara Zarî Kurmanciyê li Rewandizê bûye. Piştê di navbera salên

1935 û 1936'an de di kovara Ronakiyê de ku ji aliye Huznî û Şit Mistefa li Rewandiz û Hewlêrê derdiket kar kiriye, di heman salan de li Hewlêrê tevî karê di çapxaneyê de dest bi wênegiriyê kiriye. Piştê ji bo çapa kovara Ronakî û pirtûkên kurdî mekîneyeke mezintir ji Fazil Îsa Mehfoz li Mûsilê dikire û li Hewlêrê dadimezirîne.

Piştî wefata birayê xwe Huznî di 20.09.1947'an de Gîw dibe xwediyê mekîneya kevn a Zarî Kur-manciyê. Bi serhildana gelên Îraqê di sala 1948'an de û bi destxistina hin azadiyan Gîw ji vê derfetê mifa distîne û navê çapxaneya xwe ji Zarî Kur-mancî diguhere û dike Kurdistan.

Di sala 1963'an de navê çapxaneya wî pê didin guhertin û dike çapxaneya Hewlêrê, lê di sala 1970'an de û piştî morkirina beyana 11'ê Adarê ca-reke din navê çapxaneya xwe dike Kurdistan.

Gîw di roja 24.07.1977'an de li nexweşxaneya bajarê Mûsilê wefat dike û di êvara heman rojê de li goristana Îmam Mihemed li bajarê Hewlêrê û li tenişt birayê xwe yê nivîskar û diroknivîsê navdar Husên Huznî Mukiryanî tê veşartin.

Wesiyetnameya Gîw

Ez ku navê min Ebdulrehman, kurê Ebdulletîf e û nasnavê min "Gîw Mukiryanî" ye. Niha tendurus-tiya min baş û di cih de ye, min biryar daye hemû darayiya xwe ku ji malekê bi hejmara "208/259" li Teyravayê, tevî hemû kitêbên xwe yên çapkirî û ne-çapkirî û hemû kitêbxaneya xwe û kel û pelên çap-xaneyê û du mekîneyên çapê ku hejmara yekê "Diyamoand" e û ya din nû û "Haydilbêrg" e û me-kîneya komkirina kaxezan û du mekîneyên birîna kaxezan û hemû qer û pirtûkên ku min li Hewlêr, Kuyê, Silêmanî, Kerkûk, Bexda û Mûsilê hene, bi du mercan pêşkêşî her du kurên xwe "Azad" û "Kurd" e dikim.

Merca yekem: lazim e piştî mirina min, wan weke babekî hay ji xûşkên xwe hebe û di dema hemû tengavî, nexweşî û bûyeran de bi mal û can wan rizgar bikin.

Merca duyem: Nabe piştî min çapxaneyê têk bidin yan bifroşin, çimkî mamê wan (*Husên Huznî Mukiryanî/Wergêr*) ku di sala 1915'an de ew çap-xane damezirand û piştî wî jî min mezin û rêkûpêk-tir kir, hêvî û armanca me herduyan jî ew bû ku di xizmeta zimanê kurdî de be, nek bê firotin û bi pe-reyê wê mal an otomobîl bê kirîn, yan bidin xwarin û vexwarinan.

**Xwediyê çapxaneya Kurdistanê:
Gîw Mukiryanî
01.08.1972**

Koroya gundtewî, fitwa wê tune



Rêdûr DÎJLE

Wê rojê Rifhet, di destê wî de xencera wî û li ber devê çehlê li qelefîskan rûniştibû. Bi xencera xwe li ser tehtên dora devê çehlê xêzik çêdikirin. Û bi awayekî çavsorî li kûrahiya çehlê dinihêrî. Nizanim, bê dengê ji kûrahiya çahlê dihat jê re digot çi? Lê xuya bû ku wî di mêjiyê xwe de kirinên mayînde bi cih dikir. Û cixare li ser cixareyê dipêça. Piştî demekê devê xencera xwe bi pehnîti çend caran di kevirê dora devê çehlê da. Jixwe kevirên dora devê çehla hewşa wî, weke kevirên hestem bûn. Te çend caran devê xencerê têbida tûj dikir, dikir weke gûzanê. Hengî xencer di kevir dabû, tûj kiribû, ku te bida kevir wê kevir bikira du cihan. Piştî xencer tûj kir, rabû çû hundir. Xuya bû ku wî û dengê ji kûrahiya çehlê dihat bi hevdu re peymanek nepenî danûbûn.

Rifhet, mirovekî wisa bû ku di dilê wî de kaniya dexesiyê, dilreşiyê zabû. Pir dilxerab û kumreş bû. Ji ber vê dîlkambaxiya xwe hema bêje navbeyna wî û tu kesî tune bû. Ev tişt ji xwe re kiribû sinhet. Û ji xwe hengî wisa her tim bi xerabî diramiya, êdî bûbû weke dînan. Rojekê ji diya xwe re dibêje:

“Yadê, a niha trêni di jêra mala me re derbas bû û xwezûrê min ewa jî tê de bûn. Ma qey te ne dît?

Dê kawik e. Ma çi zane. Dibêje qey Rifhet rast dibêje.

“Wîî! Bi mezinahiya Xwedê min neditiye û dengê wê jî nehatiye min. Ma kuro hema tu bîçûyayî pêşiya trêne te ew bida sekinandin û te ew bianiyana malê. Ma çi dibû? A niha wê bibêjin em di gundê wan re derbas bûn û ba me nekirin.” gotibû dê.

Gundê ku tirambêla çartekel bi zorê tê de diçû, Rifhet trêni jî tê re derbas kiribû û diya wî jî jê bawer kiribû. Dîn jî vî tiştî nakin. Lê Rifhet kiribû. Hesûdiyê, Rifhet dabû ber pêlên xwe û ew ber bi dîniyê ve dibir.

Rifhet ji ber ku dexes bû, hevsera xwe jî kiribû dîla dexesiya xwe. Pir bi ser wê ve diçû. Dema hevsera wî biçûya tendûrê, ji bo ku nan pêveda, yan jî ji bo karekî derbiketa derve, Rifhet wê çaxê ji xwe re

hesabê bêbextiyê û plana wê dikir. Heta ku hevsera wî bihata. Dema jinik dihat, weke karsazekî teorî û planên xwe yên bêbextiyê li ser jinikê dihavêt nava qadên bizaviyê. Û ew didarizand. Nizanim, “Li ser tendûrê tu li zîlamê xelkê dinihêrî û dema tu dimeşî xwe dihejinî...” Û hema bi gotinan li rûyê wê dixist. Û dema bi hev re biçûna cihekî jî jê re digot: “Zoq li pêşiya xwe binihêre. Li derûdora xwe nenihêre...” Û filan û bilan. Her roj duroj kar û barê wî ev bû. Êdî jinika hejar û belengaz, cinûs dibarand li wê roja ku

Pê re zewicibû. Lê hemayî mabû. Êdî bûbû weke şehtan. “Gelo ez gavên xwe çawa bavêjim wê li gora wî rast bin. Ji bo ku kelkela wî ji guhê min bikeve.” Jinikê di ber xwe de digot. Ma rast be jî Rifhet dibêje rast e. Tu carî kulê li xwe nayne, ji hevsera xwe re bêje: “Ev livînên te rast in.” Ma carekê dilê wî ketibû ber çerxa xerabiyê û xerabî diheza. Bi vî tiştî jî nedima, di xewnên xwe de jî li ser hevsera xwe tiştên nebaş bidîta, nedigot xewn e û nerast e. Hema bi ser jinikê ve diçû û têra dilê xwe lê dida.

Li hundir diya wî rûniştibû û bi teşiyê, mûyê bizinên ku qusandibûn dirêsiya. Hevsera wî jî çûbû ser tenûrê. Rifhet li hemberî diya xwe rûnişt û qu-tiya xwe ji berîka saqoyê xwe derxist. Mehdê wî tirs û lêva wî ya jorê bi ser ya jêrê ve şiqitibû.

- Te xêr e kurê min? Diya wî çavên xwe ji ser teşiya di destê xwe de hilanî û li rûyê wî nihêrî. Rifhet nepeyîvî û dê dîsa got:

- Ev çi mehdê te ye?

- Hemû ji destê bûka te ye.

- Çima? Çi kiriye? Ka bibêje.

- Ma çewa çi kiriye! Her roj û duroj qûndetiyên dike.

- Ev çi ye! Heşê te li serê te ye? Tu zanî tu çi dibêjî?

- Yadê! Heşê min baş li serê min e. Û ez zanim ez çi dibêjim.

- De ka bibêje çikiriye?

- Keçê tu zîlam nemane ku wê xwe ji wan re nehejandiye.

hema çavên dê weke ji qefesa xwe bifirin

vebûn û got:

- Eger van gotinên tu dibêjî rast bin, tu fitwa wê tune ye! Ma namûsa me nebû cûmek benîşt ku tê-keve nava devê xelkê.

Dê hêrs bûbû. Weke pisîka ku di quncik de mabe. Di wê kêliyê de ku bûka wê li ber çavên wê bûya wê rapelikiya rûyê wê û bi napûçkan ramis-yana. Lê Rifhet bi vê rewşa diya xwe, weke ku bi ser ketibe kêfxweş bûbû. Ji xwe re şirîkek dîtibû.

- Yadê ma ez ê çawa derewan bikim. Ma ev tişt ên derewan in ku mirov bibêje. Ma qey ez sêlek im. Û ji xwe ev tişt, ne tiştinî wisa hêsan in. Bi sê adê Xwedê min bi van çavên seriyan dîtiye, got.

Piştî vê gotinê, dê neaxivî û bi teşîya xwe re mijûl bû. Lê mêjiyê wê, xuya bû ne li ser teşiyê, li ser gotinên Rifhet mijûl dibû. Carinan teşî çep, carinan jî rast digerand. Weke di mêjiyê xwe de ji xwe re gotinên Rifhet li çerxa gumanê bixe; gelo Rifhet çiqas rast çiqas ne rast dibêje? Na na! Ma van gotinan ên nerastbûyî ne, ku mirov ji jina xwe re bibêje. Hergiz mirov nabêje. Encamên gumanên statîstîka mêjiyê wê jî derew û kumreşiyên Rifhet, rêje ji sedî sed dida rastandin. Û serfiraziya wî, li hember gumanên neyînî dinixumand. Rifhet dît dê hew dipeyîve, ew jî sekinî, pala xwe da balgiyê û serê xwe pêl kir.

Ji xwe dê gotibû "fitwa wê tune". Êdî Rifhet jî zanibû wê çî bike. Dil û mêjiyê wî di xalekê de biryara xwe ya hevpar dabûn. Di dadgeha wî de dadmend carekê pênuş şikandibû. Hemû demar û lebatên wî di bin fermana wî de xwe amade kiribûn. Hefsar di nav lepên wî de bû. Zanibû wê bi ku de bajo. Careke din ev plan di mêjiyê xwe de derbas kir û cixareyek pêça. Û qutiya xwe bi awayekî tund girt. Dengê girtina qutiya wî û dengê vekirina deriyê hewşê bi hev re derketin. Jinik jî tendûrê dihat. Teşta nan li ser serê wê bû. Xuya bû pir betilîbû. Eniya wê bi tîna agirê tendûrê xwêdan dabû. Rûyê wê jî german sor bûbû. Û kitana wê jî dora stûyê wê şeqitîbû û bi ser singê wê ve daketibû.

Jinikê teşta nan bir metbaxê. Piştî teşta nan danî, çû ava ku serê sibehê jî çehlê kişandibû û li laçekê xistibû, ji bo ku kurm û zîro nekevin qirika wan û nava xwarina wan, silhiyek ji wê avê ji sarincê derxist û tasek jê vexwar. Di qurta dawîn de weke hatibe ser heşê xwe û hemû betilandin ji laşê wê weşiyabe rûyê wê şekil guhert. Hîn ava ku tehm dida betilandinê wê, li nav hinav û demarên wê tam belav nebûbû, ji nişka ve dengê bêsûl û tehl ketkerika guhê wê û ew veciniqand. Bi dengê nizim got: Bismîllah. Û di ber xwe de got: Bê ka wê dîsa ev belqitmayî bêje çî? Û çû jûra ku xesû û Rifhet lê bûn. Lê jinika reben nizanibû çûyîna jûrê wê çî bîne serê wê. Bi tebietê Rifhet zanibû, lê ew qas jî na. Vê

carê Rifhet dê jî hanîbû ser mezhebê xwe û pîvanên mezhebê xwe pê dabûn pejirandin. Û li dijî wê dê û law bûbûn tifaqger.

- Çi ye? Jinikê got.

Rifhet di bin çavan de, bi awirinî wisa ku gur lê binihêre wê ji ronahiya çavên xwe û bi barîneke wisa ku wê ji hisîna guhê xwe bibe, bi mehdekî tir-şûşolî li jinikê nihêrî û got:

- Keçê!!! Min hezar û pînsed carî ji te re gotibû gavên xwe rast bavêje.

- Te xê re dîsa, çî bû, te çî bihîst?

- Min çî bihîst... Ma hey qancox! Pêwîst e ku ez tişteki bibihîzim.

- Nexwe te tişteke nebihîstiye, îcar çima tu wisa qebe qebe dipeyîvî?

- Keçê min nebihîst, çavên min dîtine.

- Gelo çavên te çî dîtine û dibîne?

- Çavên min tiştên dîtine bes e!

Êdî kêr dabû hestî. Jinikê, di dilê xwe de got: Bes e! Êdî benik di kur de zirav be, bila di wir de biqete. Û bi nav de çû:

- Na... Çî dîtibe û dîtiye gerek tu bibêjî. Bes e, êdî ji destê te. Te ez kulmayî kirim. Û nebêje çavên min dîtiye. Bêje dilê min dexese û dexesiya min li hinceta digere.

- Keçê, çiqas ez ji te re bibêjim jî tu carekê li gora xwe tevdigerî. Li ba te heft û heşt yek e, hey xwelî li ser.

- Xwedê îman jê stendo, ka min çî kiriye? Ka bêje ez çawa tevgeriyame? Jixwe dilê te xerab e. Tu kumreş î. Ji ber vê jî, tu qîmeta min li cem te tune ye. Li ba te ez weke sewaleke di êxir de, li ser alif girêdayî me.

Rifhet êdî nizanibû wê çî bibêje. Tu bersiva wî tune bû. Bi gotina jinikê aliqî ma û nizanibû wê jê re çî gotinan bike. Hema bi dilekî tijî hêrs û kîn rabû ser linga û bi ser jinikê ve çû. Heta ku hêl di destê wî de hebû, sîleyeke giran li ser rûyê wê yê rastê danî. Û got:

- Ooo... tew xanimê çî çilzimanî jî bûye. Yadê de ka lê binihêre bê çî sinhetî jî dike?

Lê yadê ne hume û ne gum. Ne riheta xwe xera dîkir û ne qet. Dev ji teşîya destê xwe jî bernedida. Lê weke erêkirinê, ku bibêje kurê min tu mafdar î, çî dikî bike, serê xwe jê re hejand. Di wê weşê de, jinik li xesûya xwe ecêbmayî mabû. Di mêjiyê xwe de weke senaryoyekê "Ka ew xesûya berê? Ku navbeyna min û wê ew qas xweş bû. Û ew qas bi min bawer bû. Xuya ye, vî belqitmayî ew bi du peyvan xapandiye." Derbas kir.

- Lê binihêre, rastî ji te re tehl tê! Jinika ku bi sîleya Rifhet ketibû erdê, ji erdê rabû got. Û berê xwe da xesûya xwe û jê re got:

- Xaltîkê ka tu û Xwedê tu jî tişteki bibêje.

Xaltîkê bi awayekî tund got:
- Ma ez ê çi bibêjim. Tiştê te kiriye û dikî gawir jî li mirovan nakin.

Rifhet got

- Heee... Hey qehpik! Rastiya çi? Ne her roj û duroj tu li zilamê xelkê nanihêrî. Dema tu bi rê ve diçî hemû kulîmekên xwe nahejinî. Ji bo ku tu bala zilaman bikişînî. Û li ser tendûran awiran nadî zilamên li ber dîwêr... Ma ev nebesin! Ma qey tu dix-wazî ez û xelkê hevdu bikujin?.

Ma wê jinik çi bike û çi bibêje. Çi bike û çi bibêje jî bêfeyde ye. Carekê Rifhet bi ya dîlherabiya xwe kiriye. Û ji xwe dê jî ji kurê xwe tawîz nade û di ser de jî jê re dibe piştgir û çu gotinan nake. Lê jinik heta bi hetayê bi dilê xwe bawer e. Û dizane ku Rifhet van qebehetan dixê û xistiye stûyê wê. Û gotinên xwe yê dawîn got:

- Ev qebehet in ku hûn dixin stûyê min. Xwedê heqê min ji we re nehêle: Tu pir bi dek û dolab î. Heta qiyametê ez li te, na na li we helal nakim. Û wê roja qiyametê jî destê min di gewriya we de be.

Piştî van gotinan, hema weke ewrên reş şemitî-bin ser perdeya çavên Rifhet û zilmet jî firnikên wî bibarin. Har û dîn bû, nolî kûçikên ku qudûsî bibe. Hema ji nişka ve xwe dada gulyên porê jinikê, hişk zevt kir û xencera ku tûj kiribû jî ber qayîşa şalê xwe derxist û li ser kezêba jinikê xist. Ne carek û ne du car... Gewdeyê wê da ber xenceran. Piştî van derbên xencerê, qidûmên jinikê şikestin û ket erdê. Hundirê jûrê jî xwînê xalî nedibû. Bû mîna gola xwînê. Piştî kêliyêkê jinikê giyan da.

Li hember vê senaryoyê diya wî matmayî bûbû. Weke ku zimanê xwe daqurtandibe, ne deng jê derdiket û ne qet. Zoqmayî mabû. Teşîya wê bi destê wê ve zeliqîbû. Rifhet jî weke miya ji colê xwe qet-yayî nizanibû çi dike, li derdora xwe diçû û dihat.

Hema ji nişka ve sekinî û bang li diya xwe kir:

- Yadê! Ka tu were ji min re pê bigire.

Ji xwe yadê carekê zimanê xwe daqurtandibû. Ker û lal bûbû. Deng jê dernediket. Bûbû weke robotan. Rifhet hema çû bi çepilê wê girt û ew anî ser laşê bêgiyan. Xuya bû Rifhet hîn dilê xwe rihet nekiribû û hîn jî negihîştibû mebesta xwe.

- Yadê ma te negot "fitwa wê tune" va ye min jî ew paqij kir. Hahah...aaa...haa... Rifhet ji diya xwe re got; "de ka tu ji min re pê bigire."

Yadê jî nizanibû çi dike. Di wê kêliyê de fame-korî bûbû, bîra xwe wenda kiribû. Hema Qesap Rifhet jê re digot çi wê jî mîna şagirtekî wisa dikir. Rifhet û diya xwe bûn şîrîkên hevdu. Weke berxekê şerjê bikin, jinik kirin heftê û heft perçeyan. Û perçeyên goştê jinikê xistin xirarekî û avêtin çehlê.

Piştî heftê û heft perçeyan, koroya gundewî, ya jî dê û law pêk dihat, bi heftê û heft notayan sirûda "fitwa wê tune" afirandin û derketin pêşberî temaşevan û guhdaran û stirîn:

Fitwa wê tune...

Fitwa wê tune...

Fitwa wê tune...

Fitwa wê tu...

Fitwa wê t...

Fitwa wê...

Fitwa w...

Fitwa...

Fitw...




Fit...

Fi...

f...

...

(Jixwe kurmamê bavê min gotibû: "Em mala Bekir Axa temenê me bi ser pênciyî bikeve, em heş berdidin û dîn dibin.")



Xaçepirsa Mihemed Şêxo Amadekar: Lokman AYEBE

1-) *"Ez li ser canê te yî şêrîn dikêşim dem bi dem / Hêsiyê xwînê ji çavan têne xwar Bavê Felek / Leşkerê derd û xema îro bi êrîş têne dil / Qehremanê çerxê gerdûn payedar Bavê Felek"* Piştî mirina Mihemed Şêxo kîjan helbestvanî ev rêzîkên delal li ser wî nivîsiye û di kêliya veşartîna wî de li ser gora wî xwendîye?

- a-) Osman Sebrî b-) Cegerxwîn
c-) Seydayê Tîrêj d-) Seydayê Keleş

2-) Gotinên strana "Ay lê gulê" kê nivîsiye?

- a-) Cegerxwîn b-) Rêncber
c-) Qedrîcan d-) Bêbuhar

3-) Navê koma muzîkê ya Mihemed Şêxo, bi hûnrmendên wekî Mehmed Ezîz Şakir, Rifetê Darî, Seîd Yusîv û Remezan Necim Omerî re av kiribû, çi ye?

- a-) Koma Serkeftin b-) Koma Serfirazc-)
Koma Serxwebûn d-) Koma Sînor

4-) Navê Mihemed Şêxo, yê resen çi ye?

- a-) Mihemed Salihê Şêxmûsê Ehmed
b-) Ehmed Qamişloyî
c-) Zubêr Ehmed Botanî d-) Rifet Omerî

5-) Mihemed Şêxo di kîjan salê, li kîjan bajarê Kurdistanê de hatiye dinyayê?

- a-) 1948 - Amûd b-) 1949 - Nisêbîn
c-) 1950 - Qamişlo d-) 1948 - Qamişlo

6-) Navê albûma Mihemed Şêxo ya yekem, ku di sala 1974'an de ew li Şamê tomar kiriye, çi ye?

- a-) Gewrê b-) Nesrîn
c-) Gulîzar d-) Ey Felek

7-) *"...Mihemed Şêxo her tim ji me re digot, em nikarin welatê xwe tenê bi tivingan azad bikin û ji bo azadiya welatê me bi qasî tivingan, hewcedariya me bi kewan û daholan jî heye..."*

Kîjan derhênerê kurd di pirtûka xwe ya otobiyoğrafîk de, di der barê Mihemed Şêxo de qala vê meseleyê kiriye?

- a-) Bahman Ghobadî b-) Yilmaz Guney
c-) Hiner Saleem d-) Kazim Oz

8-) Helbesta bi navê "Dargerînk û Ay Lê Gulê" ya kîjan helbestvanî ye? (Ku helbestvan di vê helbesta xwe de hêmaya xwe ya bingeîn ji Mihemed Şêxo û ji strana wî ya "Ay lê gulê" wêdigire.)

- a-) Rênas Jiyan b-) Yeqîn h.
c-) Îrfan Amîda d-) Kawa Nemir

9-) Mihemed Şêxo di nava hezkiriyên xwe de bêtir bi kîjan şanênawî tê nasîn?

- a-) Bavê Felek b-) Bavê Brûsk
c-) Bavê Janê d-) Evîndarê Gulê

10-) *"Û gora bêdeng di pêûsê de radipere, ey Bavê Felek! / û dilê kurdekî bêwar bi hev re diqîrîn, şadî mîna xiltekî kuwîr / di taristana navdar de winda dibe"* Ev gotin ji helbesta kê hatiye wergirtin?

- a-) Arjen Arî b-) Ehmed Huseynî
c-) Rojen Barnas d-) Berken Bereh

11-) Mihemed Şêxo di sala 1987'an de berî mirina xwe bi wextekê, li Qamişloyê tomargehekê vedike. Navê vê tomargehê çi ye?

- a-) Tomargeha Qamişlo b-) Tomargeha Welat
c-) Tomargeha Nesrîn d-) Tomargeha Felek

12-) Mihemed Şêxo kîjan salê û li kîjan bajarî dihere ser dîlovaniya xwe?

- a-) 09.03.1990 – Qamişlo
b-) 09.03.1989 – Nisêbîn
c-) 09.03.1989 – Qamişlo
d-) 09.05.1988 – Dihok

13-) Mihemed Şêxo li kîjan bajarî mamostetiyê dike, li wir hevsera xwe Nesrînê nas dike û bi wê re dizewice?

- a-) Gunbedê Kawis b-) Dihok
c-) Qamişlo d-) Mahabad

14-) Mihemed Şêxo cara yekem di sala çendan de dihere Baxdatê û stranan li Radyoya Baxdayê tomar dike?

- a-) 1973 b-) 1961
c-) 1972 d-) 1962

Heger bersivên te yên rast;

Di navbera 8 û 12'an de be, nexwe kurmê Mihemed Şêxo li dilê te jî xistiye. Qet serê xwe neêşîne, ji îro û pê ve jî tu yê tim di nava deryaya wî de avjeniyê biki. Di navbera 8 û 4'an de be, tu di navbera du çeman de tî mayî û tu ne kêrî dêrê û ne jî kêrî mizgeftê tê. Nese-kine, kincên xwe ji ser xwe bişeqitîni û xwe bêtirs bera ber pêlên deryaya wî bide.

Di bin 4'an de be, heyfa wî canê te yê şêrîn ku hetanî vê rojê te jî tahma M. Şêxo bêpar kiriye. Lê hîn jî ne dereng e, xwe varneqilîne û xwe li ber dengê wî germ bike. Tu yê bibîni ku tu çawa rojekê berî rojekê ditahmîji sewta wî...

Bersivên "Xaçepirsa helbesta nûjen", 1b 2d 3a 4d 5a 6c 7d 8a 9c 10b 11a 12d 13a 14b 15c